



MUSTAFA AYDOĞAN

PÊLÊN BÊRÎKIRINÊ

NÛDEM



# PÊLÊN BÊRÎKIRINÊ

**Mustafa Aydoğan**

**Weşanên NÛDEM**

Weşanên NÛDEM: 28  
Pêlên Bêrîkirinê  
Çapa Yekem: Stockholm 1997

© Weşanên Nûdem û M. Aydoğan  
Pergala bergê û rûpelan: NÛDEM  
Wêneya bergê: Tabloya A. Strindberg, Svartsjukans natt (Şeva dilxerabiyê)  
ISBN: 91 88592-28 6

Adres: Nûdem  
Termov. 52  
176 77 Järfälla-Sweden

Bêî destûra Weşanên Nûdemê jinûveçapkirin an jî di kovar û  
rojnameyan de weşandin qedexe ye.

# PÊLÊN BÊRÎKIRINÊ

Mustafa Aydogan

Weşanên NÛDEM



Ji nişka ve rabû ser piyan û li wê tahta ku ew li ser rûniştî-  
bû, nihêrî. Li karê xwezayê ecêbmayî ma. Şopên salan û  
tesîrên derbên ji her deverî yên ku taht ji formekê xistibû ye-  
ke din, li ber çavên wî mezin bûn û mîna ku dixwazin di  
derheqa rêya ber bi şikefta ku hemû rastiya vê tahtê tê de  
veşartîye diçe de, li xwe mukur bîn, çavên wî di xwe de hefs  
kirin. Ew li hemû bûyerên ku ev taht ji halekî xistibûn hale-  
kî din fikirî. Li ser paraleliyeke muhtemel ponijî. Tu tişt ji  
hevdu dernexistin. Dîsa berê xwe da vê tahta ku çavên wê ji  
serma zivistana dirêj î dijwar û bêrehm tirsiyabûn. Tev li ha-  
tina havînê jî hîn bi ser hişê xwe de nehatibû. Tahta ku hise-  
ke mîna diricife û ji bo ku neqefile, xwe civandibû ser hev-  
du, bi mirovî re çêdikir, îcar bi ruyê xwe yê kortik kortikî û  
xiramokî li ber çavên wî biçûk ku bêhêvîtî jê diza, xuya kir.  
Çavên bi kortçûyî û murûzekî tirs, êrîşî wê piça hêviya ku  
mabû jî dikir.

Tew piştî kevza ku di qelişteken wê de ji xwe re cîh peyda  
kiribû dît, mîna ku bibêje: “Ka ew tahtên bi tavê re dikeniy-  
yan? Ka ew tahtên mirovî dikarîbû xwe lê bigirta? Ka ew  
tahtên ku hêvî jê difûriya?” li ber xwe nihêrî û serê xwe bi  
kerb kil kir. Hiseke ecêb ew girt û berneda. Li gel hiseke nîv-  
nefretî jî ji ber tunebûna şiyana xwenuhkirinê, li ber tahtê  
ket. Tev li ku di warê lêkolînên genên ku dê muhtemelen ji-  
yanê dirêj bikin de, ji bo pêşerojê xwediyê hêviyeke xurt bû  
jî xwe ji fikra ku paraleliyek di navbera vê xusûsiyetê û qe-

dera mirovatiyê de datanî, xelas nekir. Qelsî û bêçaretîya di vî warî de ew tirsand û ber bi bêhêvîtiyekê ve dahf da. Di vê dahfdanê de kalitî hate bîrê. Dikira biketa nav xeyalin kûr, lê li xwe hay bû û serê xwe hejand û di ber xwe de peyvî û pirsî:

– Gelo çi pêwendî di navbera vê tahtê û kalitîyê de heye? Ji bo çi kalitî û ne tiştêkî din?

Di ber xwe de bişîrî, lê ev bişîrandin, ne dişîbiya bişîrandinên berê. Wî ne tu mahne da pêwendîya ku di navbera tahtê û kalitîyê de hebû û ne jî xwe ji wê hisa ku kederek pê re peyda kiribû, rizgar kir. Keserek kişand. Xwest dîsa rûnê, lê gava li tahtê nihêrî dev ji rûniştinê berda. Ji bo çi? Wî jî nizanîbû. Gava li bersivekê geriya, ji nişka ve gotina “li tahtê rûniştin”ê hate bîra wî. Jê veciniqî. Taswas û heyecanekê ew da ber xwe. Ji bo ku ev gotin di hundurê wî de nebe hiseke xurt ku hertiştî têxe bin tesîra xwe, li rêyên zû jibîrkirinê geriya. Xwe bi lez ji tesîra vê gotinê xelas kir û ji ber bi bîranîyê jî mîna ku bibêje “Ma nuha wexta vê gotinê bû?” bi xwe re xeyidî. Li xiramokiya tahtê ya ku zimbara dianî bîra mirovî, nihêrî. Rehên reş, sipî û sor ên ku xwe tê de civandibûn, di çavpêketina yekem de, hiseke ku ev taht heta mirov bê bes e, bi înad e, pê re çêkir. Ev his bû sedema tirsaya ku ev taht dê serê yê li hember xwe bivê nevê bitewîne.

Wî heta nuha gellek taht dîtibûn, lê tu tahtan hiseke weha ecêb pê re çenekiribûn. Ya din jî tu tahtan bi vî awayî lê ne nihêrîbûn. Tu taht ewqas ne dûrî wî bûn. Êdî his û fikiran xwe li hevdu badabûn. Hema gava ku wî li vê tahtê dinihêrî, hisên wî hertim zora fikirên wî dibirin. Belkî fikrên wî bi xwe, ev destûr dida, lê her çi dibe, bila bibe, ev taht...

Dîsa pirsî:



– Gelo ji bo çî ev taht naşibe yê din?

Li kortikên ku tê de vebûbûn nihêrî. Çavên wî li yekê ji wan aliqî. Nema dikarîbû berê xwe jê biguherta. Kortik li ber çavan bû geliyekî kûr î bê binî. Tariyekê ev kûrahî bi carekê dagirt. Dikira têwerbûya û di kûrahiya reş û tarî de bi yekcarî wenda bûbûya.

Veciniqî.

Hiseke weha hatê ku wî bi lingên xwe hişk pê li erdê nekiriba û hebekî jî bi paş de venekişiyaba, digot qey kûrahiya vê kortê dê ew bi derbekê re daqurtanda û ew ê dîsa bi rûkala dinyaya gewrik neketibûya. Ji tirsra têwerbûnê hîn jî gurpe gurpa dilê wî bû. Îcar bi qozîya çavên xwe li tahtê nihêrî. Bi nerînê re, lerizandinekê laşê wî bi tamamî da ber xwe. Hêrsek hatê. Di hundurê çend saniyeyan de hêrsa wî gîhaşt dereceya ku tu nemabû dilê wî rawestanda. Hilma xwe bi lez stend û berda. Firnikên bêvilê fireh bûbûn. Pêvajoya hêrsbûnê hebekî dom kir.

Hiseke ku ji ber xezeba tarîtiyê, xwe avêtiye bextê geliyekî kûr î bê binî pê re çêbû. Xwêdanekê xwe di çavikên çermên wî de da der û ruyê çerm bi hemû comerdiya xwe ve av da. Bi xwêdanê re hêrsbûna wî hêdî hêdî daket.

Piştî hebekî aram bû, dîsa li tahtê nihêrî. Ev nihêrîn, ne mîna ya din bû. Lê vê carê ger ji bo demeke muwaqat be jî mirovî digot qey di şerê fikir û hisan de, nîvserdestiyeke fikiran xuya dibû. Di demên weha de, dest bi xwe re peyvîne dikir. Vê carê jî ev qaîde meşand. Bi dengêkî bi gazinî ji xwe re got:

– Ka dev ji tahta reben berde! Ma tu çî dozê lê dikî?

Wî jî nizanîbû, bê çî dozê lê dike. Mirovî digot qey, ji yekî li hember xwe, hesêb dixwaze. Bi vê gazinê re kela wî daket.

Dengê wî nermtir bû. Dilê wî pê şewitî û îcar bi dengê bi bergerînî, weha dom kir:

– Te ew jî perîşan kir û te xwe jî... Tu divê qey xwezayê xwe civandiye ser hevdu û di vê tahtê de bi cîh bûye. Xwedê jê razî, hela li dora xwe binihêre, bê ka xweza çi qas rengîn, çi qas fireh û çi qas dewlemend e! Te hema çavên xwe bera vê tahtê dane.

Dû re bi rexneya li tengfikirandina xwe re pêwîstiya îqazekê jî his kir.

– Ger tu di hemû meseleyan de cîh weha li xwe teng bikî, te mal anî sitûna navê.

Ji nişka ve li xwe hay bû û got:

– Wî, ev çi ye? Ez bi kê re dipeyivim?

Tirseke ew girt. Serê xwe bilind kir û li dora xwe nihêrî. Kes li wir tunebû. Kêfa wî hat, hebekî rehet bû.

‘ Lê dîsa bi xwe re peyivî:

– Bi ser heqê min de, dînîtî jî bi dû min biketa, min ê li bavê xwe zêde bikira. De tu bala xwe bidê, bê ji kî derê heta kî derê... Kê em li vê tahtê rast kirin? Kê em anîn li vê tahtê asê kirin?

Bi xemgînî lê fikirî.

Wek ku dengê hate guhê wî. Ji nişka ve sar sekinî. Bi bêdengî li dora xwe guhdarî kir. Lê dû re hilma xwe berda, kir niçe niç û got:

– Na lo, dengê çi, halê çi...

Wî xwest ku ew li tişteke din, hema çi dibe bila bibe, lê li tişteke din bifikire. Her çi qas dilê wî pirr dixwest jî ew di vê hewildana xwe de bi ser neket. Lê gava sirra bayekî bêhêvî-tiyê bi ser wî de hat, bi hemû konsantrasyona xwe ve di ber

xwe de da û wek hercar, vê carê jî destûr neda bêhêvîtiyê. Piştî qewirandina sirra bê, kir niçe niç û got:

– Ji xwe re lê binihêrin, lawo! Tahtekê çî anî serê min!

Tije bûbû. Hisên cûr be cûr ku hemû kulên wî tev radikirin û dibûn sedemên keserên kûr, ew bi temamî xistibû bin bandora xwe. Êdî pêlên hisên wî her ku diçûn bilindtir dibûn û di dilê wî de hilnedihatin.

Li bêrika xwe geriya, pênuşek û deftereke biçûk a bêrika derxist û ji xwe re got:

– Gellek kes dibêjin, gava mirov tije bû, divê binivîsîne. Ez ê jî helbestekê binivîsînim. Ma gelo ez ê bikaribim careke din weha tije bibim? Ev firseteke mezin e û divê ez vê firsetê ji destê xwe bernedim.

Pênûs di navbera tiliyên xwe de kil kir û bi awayekî ji xwe bawer fikirî. Rewşa wî hişt ku ew xwe bi destê hin îddîayên din de jî berde. Îddîa li ser îddîayê ew da ber xwe.

– Belkî ev bibe destpêka nivîskariya min jî. Ji xwe, welatê me bindest e û hatiye perçekirin. Ji ber vê yekê, welathezî nivîskariyê li ser me ferz dike. Divê mirov ji deverekê dest pê bike. Zimanê me zimanekî weha ye ku pêwîstiya wî bi pêşketinê heye. Belkî ev ji bo pêşdebirina zimên jî baş be.

Xwe li ber kaxizê xweş kir. Wî jî bi awayekî zelaal nizanîbû, bê wî dê çî binivîsanda.

Bîstikekê sekinî, lê dû re di bin tesîra atmosfera serdest de, wî jî xwe tevî pirraniyê kir û got:

- Hema bila bi zimanê me bê nivîsandin, çî tê nivîsandin, bila bê nivîsandin...

Ger aqil ji bo pêşlêgirtina hisên ku ew dabû ber xwe, neketibûya dewrê û ew ji nişka ve li xwe hay nebûya û mîna

ku bibêje: “Hêdî biajo, bavê min! Ma te xêr e?” kûr nefiki-riya, çî hatibûya bîrê û çî ji vê tijebûnê derketibûya, wî dê li ser kaxizê reş bikira. Û Xwedê dizane bê hîn kîjan îddîayên din dê bûbûna bela serê wî.

Ji ber îddîayên xwe yên ku li bejna wî nedihatîn, hebekî ponijî. Atmosfera ku ew bê fikir ajotibû ser pênuş û kaxizê, hêdî hêdî belav dibû. Bi guhertina atmosferê re xemgîniyekê jî rengê ruyê wî guhert. Xemgîniya wî dû re hemû şaneyên laşê wî xistin bin hukmê xwe. Bi xemgîniyê re hiseke ku Îhtiyaca muhasebeyekê dida pêş pê re çêbû.

– Ev îro çî bi min hatiye? Ez ji helbestan hez dikim û min ji bo ajîtasyona li hember girseyan jî hinek helbestên Pablo Neruda, Nazim Hikmet, Ernesto Cardenal, Federico Garcia Lorca, Ahmed Arif, Mahmûd Derwîş, Mayakovskî, Cegerxwîn, Rojen Barnas û nemaze ji bo hesreta di dil de ”Dêrika Çiyayê Mazî”ya Qedrîcan jî ji ber kirine. Lê xwendina helbestan tiştêk e û helbestvanî tiştêkî din e û ya din jî çî pêwendîya tijebûn û helbestvanîyê bi hevdu re heye? Belê rast e, kul û derd dibin sedemên ku mirov bi hisên cur be cur tije bibe. Lê tev vê jî her mirovê an mirova ku tije bibe, nikare helbestan binivîsîne. Ger weha ba, yanî her mirovê an mirova ku tije bûbûya, bikarîbûya helbest binivîsanda, nuha jî her feqîr û belengazekî an belengazekê helbestvanek derketibûya. Wê gavê dê pirraniya mirovan ji helbestvanan pêk hatibûya û dinya jî dê mîna dinyaya helbestvanan bihata hesibandin.

Serê xwe kil kir, zor da hişê xwe û tiştên li ser helbestan xwendibûn, bi bîr anîn. Piştî di bin ronahiya tiştên ku di vî warî de xwendibûn fikirî, bi kerb kenîya û dîsa dewam kir:

– Ez ê bi vî halî çawa binivîsînim? Ne helbest û ne jî tu be-

şên edebiyatê ne raste rast pijaka rastiya ku ji dervayî îrada me ye. Hunera edebiyatê ne tekrarkirina rastiye ye. Edebiyatvan rastiya ji dervayî îrada me, bi hêla ku bi pêjnan ve nayê hiskirin, yanî bi wê guloka pêwendiyên ku li paş rastiya xuya, radiweste û nakeve qada pêjnan werdigire, di bin ronahiya zanyariya edebiyat û estetîkê de, tîne ba hevdu, heyecan û hisên xwe tev li wê dike; bi hemû şiyana xwe ya hunerî distirê; bi îdealên xwe yên pêşerojê ve dihûne. Û piştî gihaştina qonaxa yekîtiya diyalektîk ya di navbera estetîk û rastiye de, yanî piştî ku ji nû ve diafirîne, pêşkêşî civakê dike. Rastî di bin ronahiya şûûra helbestvên de, bi îmajan ve, ji nû ve îfade dibe. Yanî gotin ji dervayî maneyên xwe yên rojane, hem bi serê xwe û hem jî bi pêwendiyên ku di navbera wan de heye ve, tînin sitirandin û dibin xwediyê quweteke nû, tijebûn û kûrahiyeke fikrî. Ew êdî di helbestê de, bi wî halê statîk cîh nagire. Vêca tijebûn li ku û li ser esasê xweşikbûnê, şiyana abstrakkirina rastiye li ku?

Fikira ku edebiyatê bi tenê mîna karekî ku ji terefê welathezîyê li ser me hatiye ferz kirin, dibîne, pê pirr ecêb hat. Ji ber vê nîrxandina vulger, warê edebiyatê pirr dûrî xwe his kir. Li hember ciddîyeta edebiyatê û edebiyatvanên ku dinya bi saya berhemên wan rohnîtir xuya dibe, ji xwe fedî kir. Ji ber van tîkiliyên ku ne di cîh de hatibûn danîn, li ber xwe ket.

Tew gava îddîaya wî ya di warê tîkiliya di navbera bîndestî û perçebûna welêt û nivîskariyê de hat bîra wî, hisên liberketinê ew bêtir êşand.

– Gelo em ji bo çi dinivîsîn? Gelo nivîskarên me ji bo çi dinivîsîn?

Li nivîskarên ku welatên wan azad in û nehatine perçeki-

rin, fikirî.

– Ger îddîaya min rast be, gelo ew ji bo çi dinivîsîn?

Xwe bi saxî û bi selametî ji destê rexneyên xwe xelas kiribû, lê îcar îddîaya wî ya ”pêşdebirina zimên” dev jê berne-da. Divê di vî warî de jî serê xwe zelal bikira. Her ku serê wî zelal dibû, bergiya wî rohnîtir xuya dikir. Ji ber vê yekê, muhasebeya ku bi xwe re dikir, domand. Serê xwe vir de û wê de kil kir. Di ber xwe de bi kerb bişirî û dû re bi dengê ku mîna henekê xwe bi îddîaya xwe dike, got:

–Tew pêşdebirina zimên!

Dû re xwe li ser fikira xwe ya di vî warî de hebû, konsantre kir.

– Rast e, divê herkes berê fêrî zimanê xwe bibin û di her warî de bi kar bîne. Ev nemaze ji bo yên ku di rewşa me de ne, bûyereke pirr girîng e. Di vî warî de seferberiyeyeke mezin pêwîst e. Ji gava ku ez bi xwe hisiyame û heta nuha hewildaneke min a di vî warî de heye. Ev kar bi îstiqrar û bi bawerî tê meşandin. Ez bi vê serbilind im. Tev gellek astengên di vî warî de, divê mirov li tu maneyan negere û wê şiyana di fêrbûna zimanekî biyanî de nîşan dide, di fêrbûna zimanê dayika xwe de jî nîşan bide. Lê gellek nivîsên min piştî rastkirinê dikarin bên xwendin. Ez dibêjim rastkirin, lê hûn ji nû ve nivîsandinê fahm bikin. Ez ew kesê ku di warê nivîsandinê de, hîn hêdî hêdî fêrî bikaranîna zimanê xwe dibim, ji bo çi, di warê pêşdebirina zimên de, ji nuha ve fonksiyonekê didim xwe?

Serê xwe xist nava herdu destên xwe û bi hiseke li hember xwe durust, li xwe mukur hat.

– Di vî warî de tu ferqa min û xwendevanekî dibistana destpêkî tune. Îcar ez radibim, fonksiyoneke mamostetiyê

didim xwe. Ji xwe em di wan warên ku zanebûna me têrê nakê de, hertim xwe li pisporiyê radikşîmin. Lê ez ê vê şaşiyê nekim û bila pisporên vî warî nekevin tu taswasan, ez ê pî-yasayê li ber wan neherimînîm!

Li dehsal berê fikirî, bi îro re muqayese kir. Ferqeke pirr mezin dît. Pêşketineke xurt diyar dibû. Lêbixwedîderketineke bi bawerî hêvî geş dikirin. Berê çî bihata nivîsandin raxbet didît, lê nuha rewş hatiye guhertin û sewiyeya xwendevanan ne wek ya beriya deh salan e. Xwendevan jî êdî dixwazin mafê xwe yê hîlbijartin û ecibandîne bi kar bîne. Êdî li gel vî zimanê mexdûr, qalîteya berheman jî roleke girîng dileyize. Li gor wî, perspektîva ku dibêje; "Bila bi vî zimanî bê nivîsandin, çî dibe bila bibe" wê ji îro û pê ve, li ser xwendina vî zimanî û hejmarê xwendevanên vî zimanî tesîreke negatîv bike û ev tesîr di jîyanê de, xwe hêdî hêdî eşkere dike.

Piştî munaqeseya bi xwe re, îqna bûbû. Pênûsa xwe xist bêrika xwe. Lê xulqê wî hebekî teng bûbû. Bi xwe re xeyidî û got:

– Ez ê bi vî aqilî hey rojekê, xwe li belayekê rast bikim, bê ka çî ye. Ez her carê fonksiyoneke ku qabiliyeta min têrê nakê, didim xwe. Ez ji bo çî li xwe weha dikim? Ez jî nizanim. Halbûkî ez di gellek warên din de xwedî qabiliyet im. Ez ne mecbûr im ku di her warî de xwedî qabiliyet bim û ev ne kêmaniyek e jî.

Ji tahtê hebekî bi dûr ketibû. Wî jî fahm nekir û got:

– Ez çawa hatim vira? Nayê bîra min ku ez meşiyabim.

Dû re bi awakî ecêbmayî got:

– Li gor ku tu kesî ranehiştiye min û min li vir dananiye, divê ez bi xwe meşiyabim.

Li dora xwe çû û hat.

Nema dizanîbû bê divê çî bikira. Ji ber çûyîn û hatinê gêj bû. Li cîhê xwe rawestiya. Dikira li tişteki bifikiriya. Destê xwe ber bi warê simbêlan ve bir. Lê destê wî şemitî. Devekî rût... Hisekê ew girt, guvaşt guvaşt... Wek ku tişteki xwe wendakiribe, li dora xwe nihêrî. Tew gava Oswaldê dostê Kurdan anî ber çavên xwe, guvaştin xurttir bûbû.

– Xwedê mirovî bisitrîne, ma yên wî jî simbêl bûn! Ma ew ne mêrikekî pêşketî û Ewrûpî bû? Ma simbêlên wî ji bo çî hebûn?

Dîsa destê xwe avêt cîh û warekî rût. Li xwe fikirî.

– Ev guhertinek bû, lê gelo guhertineke xwezayî bû?

Li gor wî, na! Ya wî ne guhertineke xwezayî bû. Simbêlên mirovî hebin, dê çî bibe, tunebin dê çî bibe. Ev ne tu pîvan bû. Gellek hevalên wî yên li welêt jî bê simbêl bûn, lê ji bo çî rewşa wî pê tahde dihat? Lê her çî dibê, bila bibe, wî ya xwe ne normal didît. Ji ber ku wî dizanîbû ku wî ne ji dilê xwe, lê xwedêgiravî ji bo ku xwe ji paşdemayinê xelas bike û li dû karwanê medeniyetê nemîne, weha kiribû.

Gava ku li ser simbêlan kûr fikirî, hiseke poşmaniyê ew girt, hema tu nemabû şîna simbêlan bigeranda. Lê rewşa Ahmedê Mêqerî anî ber çavên xwe, hebekî tesellî bû.

Ahmed, erê bi eslê xwe mêqerî bû, lê li bajêr bi cîh bûbû. Ew û Ahmed li welêt jî li dibistanê hertim li ba hevdu rûdiniştin. Nuha jî Ahmed yek ji wan ên ku her ji hefteyekê du caran bi telefonê lê digerin, bû. Di xortaniya xwe de pirr li hev bû. Hejmara keçên ku di dilê xwe de jê hez kiribûn û dê ji teklîfa wî re tu carî negotibûna, “na”, gellek bû. Bejna wî ya tenik î dirêj, porê wî yên firk î tenik ku gellek caran mîna



zêrî hatibû binavkirin û çavên wî yên keskê zeytûnî ku di se-  
rçavê di rengê genimî de bi kêf dibiriqandin, dihişt ku dilên  
keçikan zor bide kafesa sîngê.

Ahmed di wexta xwe de, leyiztikvanekî fûtbolê yê baş bû  
jî. Gava li hewşa dibistanê bi fûtbolê dileyizt, pîrraniya keçi-  
kên dibistanê dihatin temaşeya wî. Ahmed piştî daketina  
biniya xetê jî çend caran xwe gihandibû seha belediyeya  
Qamişlokê û bi grûpeke ku ji Suryanî û Kurdan pêk dihat re  
bi fûtbolê leyiztibû. Hemûyan jî ji bo ku ew mêvan bû, ji wî  
re gellek xatir kiribûn û ev xatir heta ku wî ji wira da rê û  
berê xwe da bakurê dinyayê jî qet kêr nebû. Piştî birin-  
dariya li sînoriya ku piştî wî bi temami xistibû ber wî, nu-  
ha ji ber wê, li belediyeyê bi meaşekî ku ji sedî nodê wî ji ali-  
yê Komîsyona Kar a Wîlayetê tête dayin, kar dike û êdî ga-  
va wextê dibîne, qîma xwe bi tenê bi temaşekirina fûtbolê  
tîne.

Seqetiya ji ber wê birindariyê ne bes bû, îcar ev sê sal in  
ku serê wî bi nîşanên kalitîyê re jî ketibû belayê. Nîşanên  
kalitîyê hem rengê simbêlan û hem jî yê por xistibû bin tesî-  
ra xwe. Ahmed mûçink di dest de û herroj li ber eyna reben  
radiweste û dest bi rakirina tayên sipî dike. Ahmed dike û  
nake, nikare pêvajoya ber bi kalitîyê veşêre. Tayên sipî yên  
ku di nav por de hebûn, îdare dibin, lê yên di nav simbêlan  
zehmet in.

Gava li vê rewşê fikirî, weha got:

– Baş bû ku min simbêlên xwe jê kiribûn, yan na, wê nu-  
ha wek Ahmed mûçink ji destên min neketa.

Ji xwe, ew ji kalitîyê pîrr ditirsiya. Gava ev gotin dibihîst,  
vediciniqî û xwe di bîreke bê binî de, bi tenê his dikir. Ji bo  
qebûlkirina her babeteke rastiyê amade bû, lê kalitî pîrr pê

zehmet dihat. Ger simbêlên wî jî hebûna, dê kalitiya wî pîrr eşkere xuya bûbûya.

Ji ber vê yekê bi heyecan û bi kerb got:

– Hema ne xwezayî be jî baş bû ku min simbêlên xwe jê kirin. Yan na, her nerîneke eynê, dê wek ku mirov xencerekê di canê min de rake, bihata hiskirin.

Gava weha fikirî, rehet bû, êdî ne hewce bû ku zêde li ber xwe biketa. Ji ber vê yekê, dev ji şîngerandina li dû simbêlan berda, lê tu dawet jî li dar nexist.

Ewran ji nişka ve rûyên xwe tirş kirin. Ew ne li benda baranekê bû. Lê girgira ewran û vedana birûskan ne elametên xêrê bûn. Nuha ji şilbûnê filitandin, ne mumkun xuya dikir.

Qutikekî Lewîs ê şîn ê ku ji ber şuştinê rengê wî ber bi sipîbûnê diçe, lê bû. Ji ber herdu bêrîkên bi qapax ên vî qutikî, wî di nava hemû qutikên xwe de, hertim ew hildibijart. Pantalônê wî yê ku bi qayışeke reş, hatibû girêdan, cinsê ku hem malê wî û hem jî rengê wî ji yê qutikî bû. Pêlaveke reş î sivik a havînî di lingan de bû. Lixwekirineke weha nîşana bêhaziriya wî ya li hember baranê bû.

Heta ku wî xwe bigîhanda îstasyona herî nêzîk, bi kêmanî deh–panzdeh deqîqe diviyabûn. Berê li ezmên nihêrî û dû re bi xwe re xeyidî û got:

– Kê ji min re got ku ji îstasyonê ew qas bi dûr keve?

Wî dû re xwest xwe tesellî bike û ji ber vê, dest bi paraztina xwe kir:

– Lê ma çi gunehê min heye? Gava ez derketim, hewa pîrr germ bû û tew hinekan jî xwe dabû ber tavê. Min digot qey, havîn dê havînbûna xwe bizanibe. Ma min ji kî derê dizanîbû, bê havîn jî li dû xapandina min e.

Şensa wî baş bû ku welatê ew lê bû, dar lê pirr bûn. Yan na, wê hîn pirrtir şil bûbûya.

Dengê tavan nehişt ew zêde bifikire. Ewrên baranê ji ez-mên li hedefê digeriyan û nuha jî barana ku jê dihat guvaştin wek teyrên ku nêçîra xwe tesbît kiribin, xwe bera xwarê dida. Baran her diçû xurttir dibû.

Heta ku wî berê xwe da îstasyonû û dest bi lezandinê kir, ava baranê li ser erdê, bi qasî ku ji xwe re cuhokan çêbike û ber bi jêr ve biherike pirr bûbû. Ew ne li tu zarokên ku digotin; "Baranê bibar bibar, çûkan genimê te xwar" rast hat û ne jî wî bi xwe li vê quncika xwezayê pêwîstiyê weha his kir. Ji berdêla wê, li hember bê edaletiya xwezaya ku li hin deveran êgir dibarîne û hin deveran jî bi hesreta piçêke tîna tavê dihêle, bi hiseke serîhildanê ve hat dagirtin.

Çare tunebû, divê xwe bigîhanda deverekê. Da ser peyarêka asfaltkirî û gava têgihîşt ku lezandin têrê nakê, îcar di bin baranê de dest bi bazdanê kir. Bi sitara daran bawer bû. Du caran xwe ji ser rê da alî û xwest guliyên daran ji xwe re bike sîper. Lê li gor hisa ku pê re çêbû, hemû daran ew bi eynî awayî nediparaztin. Hinekan bi guliyên xwe û bi pelên xwe ve, ev mêrikê biyanî ji êrîşên baranê disitrandin, lê hinek darên din jî wî digot qey ji bo şilkirina wî, bi ewran re li hevdu kiribûn. Tev hewildana hin darên ku wî piştî vê tecrubeyê, bi çavên dostanî li wan dinihêrî jî şil û pil bûbû. Li gor fikra wî, ger ne bi xêra darên çaman ku li hinek deverên welêt jê re dibêjin kaj bûya, dê hewildana pelên darberûyan a ji bo alîkariyê, bi serê xwe bi tenê têrê nekiribûya. Ger ev hewildan nebûya, ew ê hîn şiltir bûbûya. Ji ber vê yekê, di dilê wî de, li hember van daran hiseke hezkirin û dostaniyê pêl da. Dû re ji bo nîşan bide ku nan û xwêya wî ne wek hinekan li

ser çonga wî ye, soza ku ew ê jî wek herkesî di Noelê de çameke Noelê bikire û wê bi lampeyên rengîn bixemîline, da. Ji bo saxtîkirina helwesta darên xûşeyê, berê xwe da wan. Li helwesteke zelal rast nehat. Mîna ku di erê–nayê de bûn.

Ji ber vê yekê, wî di ber xwe de got:

– Mirov nizane bê hûn dixwazin alîkariyê bi kê bikin.

Ji ber vê rewşa wan a nezalal, hisên tev li hevdu ku wî jî nikarîbû ew ji hevdu veqetandana, serê xwe bilind kirin. Lê çamên zer ên bi qasî ku bikaribin taştiya Xwedê jê re bibin, dirêj bûn, alîkarî li aliyekî, tew mirovî digot qey ji bo şilbûna wî, bi baranê re bend ava kiribûn. Bi çamên zer re zirsi-pîndar jî li ber çavan reş bûn.

Gava li wan nihêrî, di hundurê xwe de got:

– Tu ji xwe re li wan binihêre, lo! Ji bejna xwe jî fedî nakin.

Di dilê wî de, li hember wan, pêleke nefretê bilind bû. Çavên xwe girt û devê xwe vekir û hem ji havîna xapînok re, hem ji ewran re û hem jî ji wan darên hevkarên êrîşkeran re xeber da. Dilê wî rehet nebûbû, awirek jî bi xeberên xwe re da wan. Bi awira wî re, baranê jî hêdî hêdî dest bi wendakirina şideta xwe kir. Lê çilapekên ku mirov zêde aciz nedikirin, her berdewam bûn. Vê jî digel tebeqeyeke tenik a mija ku di ser serê daran re xuya dikir û tava ku şewqa xwe dida darên ku di bin çilapekan de hîn jî şil dibûn, manzareyeke taybetî ku hiseke sûretkişandîndinê bi mirovî re çêdike, pêk anî. Wî dev ji bazdana xwe berda û hebekî li vê hewayaya bi baran, bi mij û bi tav bû, temaşe kir. Hilma ku ji wan diçû tenefus kir. Nîv–mest bû. Vê nîvmestbûnê êrîşî hisên ku ew li hember hin daran rakiribû ser tapanan, kir.

Piştî bîstikekê çilapek jî sekinîn. Ewrên ku hîn di pêvajoya

çilapekan de, dest bi haziriyê kiribûn, xwe yek bi yek dan alî.

Hewa vebû.

Tavê jî serê xwe tam bilind kir û di destpêkê de bi tîrêjên qels, lê her çû bi heinû comerdiya xwe ve, berê xwe da dinyayê. Mirovên beriya bîstikekê, ji ber baranê li sitarekê digeriyên, nuha xwe ji tîrejên rojê re kirine sîper. Tîrêjên rojê ewrên herî talî jî qewirandin. Êdî ji vê saetê û pê ve, hakîmiyet ya wê bû. Wê neçixwest ku ew vê îqtîdarê bi ewran re par ve bike.

Pispisa daristanê bi dengê nizmîr dom kir. Dilopên baranê yên ku bi şewqa tavê re weha dikirin ku sitiriyên çaman jî bi mirovî re bikenin, pelên darberûyan ji xwe re kiribûn hêlan û pelên wan bi xweşikbûneke bi qasî ku mirov bixwaze di dilê xwe xe, dibiriqandin. Ewqas masûm û ewqas zelal xuya dikirin ku mirovî nikarîbû çavên xwe ji ser wan dageranda.

Wî weha his kir ku çamên zer û zirsipîndaran jî mîna ku bibêjin; “Em poşman in, di me de bibuhure”, bi situxwarî lê dinihêrîn. Bi vê hisê re, ji ber pevçûna xwe ya bi van daran re, bi xwe keniya. Serê xwe rakir û li wan nihêrî. Gava li wan nihêrî û çavên xwe ji ber tîrêjên ku di nava guliyên wan re berê xwe didan wî, ji mecbûrî girtin, germahiyek di laşê xwe de his kir. Ji ber vê yekê, pêla nefreta ku ji xwe bi nîvmestbûnê qels bûbû, di bin tesîra germahiya tîrêjên ku di nava guliyên wan de hatibûn nermkirin, bi temamî wenda bû û ji berdêla wê, hiseke hezkirin û dostaniyê bi wî re peyda bû. Baran, tav û daristanê xwe li hevdu rapêçandibûn û bereket û xweşikbûn ji wan diçurisî.

Bi baranê re bêhna xwezaya rengîn xweştir bûbû. Lê ev

şilbûn, fatûra vê xweşbûnê bû. Bi destên xwe, rûyê xwe yê betilbûna bi salan tê de xuya dibû, paqij kir. Di hevdudana destên şil û rûyê şil de, tu zuhabûneke ku wî dixwest pêk nehat, lê ji vê û pê ve jî tu tişt ji destên wî nedihat. Divê qîma xwe bi vê zuhabûnê bianiya.

Pakêta xwe ya ku wê jî qismetê xwe ji şilbûnê stendibû, derxist û çixareyek jê kişand. Dû re bi hesteyê ku bavê wî par jê re diyarî şandibû, piştî çend hewildanan çixareya xwe pêxist. Hilmek baş lê xist, bi vê hilmê re dikira bifetisiya. Çixare ji devê xwe derxist, li ser hevdu sê caran kuxiya. Hilma wî hebekî hat ber wî.

Li çixareyê nihêrî û weha fikirî:

– Ne bi te dibe û ne jî bê te dibe. Nuha tu tune bûya, min ê çawa bikira? Tu sebra min î û li ber hilma min î.

Helbesta Ahmed Arifî ya ku navê wê, ”Êdî em ne bi tenê ne” bi bîr anî. Ev helbest, hem di pêvajoya hefsê de û hem jî di ya surgûnê de, qet dev ji wî bernedabû û ev dostanî heta nuha jî bi saxlemî, hatibû meşandin.

Di ber xwe de, beşekî vê helbestê xwend.

”Ma tu tûtinê nas dikî?

Kirîvan navê keziya keçikan lê kiriye,

Her cîhî naecibîne,

Dilerize

Dinaze

Dixeyide.

Perçeyeke dilê wê heye

Di nava kaxizên tenik î sipî de tê pêçan

Di rojên teng de pêdikeve

û xwe dide lêvên tî yên dostan”

Beşa dawiyê ya vê helbestê, li ser wan halên ku pêwistiya mirovî bi çixarekişandinê çêdibe, bû. Wan halên ku mirov "ji kolanên xwe, ji sahilên xwe, ji şînahiya ezmên, ji nanê xwe, ji mala xwe" bi dût ketiye û "di ser qehra hemû hesretan re û ji jehra bêçaremayînan" re, çarçav li benda çixareyê ye... Li gor helbestvanê me, di wan halan de, çixare mîna Xoceyê Xizir digihêje gaziya mirovî".

Hîn xwe ji tesîra helbestê xelas nekiribû, lê çixara wî li filîtreyê sekinîbû. Li qunika çixareyê nihêrî, cîhê kişandinê tê de nemabû. Qunika çixareyê, bê dilî xwe, avêt erdê.

Çavên wî bîstikekê li ser qûnika çixareyê ma. Hîn firseta ku çavên xwe ji ser qûnika çixareyê dagerîne nedîtibû, bi dengên ewrên ku mîna balafirên herbê di ser serê wî re çûn, veciniqî. Wî baweriya xwe bi rewşa hewayê baş anîbû, lê tavên ku dinya ji nişka ve reş û tarî kir, ew bi temamî xeyalşikestî kir. Serê xwe rakir û li ezmên nihêrî. Lê firseta ku bibêje; "Ma te îro xêr e?" jî bi dest nexist û xwe mecbûrî lezandinê dît. Li hember girgirên ewrên ku baweriya wî ya li hember hewayê ji binî de kil kir, xwe mîna ordiya ku ji xafil de hatiye girtin, his kir. Bihîstina dengên ewran, reşûtarîbûna dinyayê û barana ku mîna xezebê li wî hat reşandin, di demeke ew qas kurt de çêbûn ku yên dilê wan û hin tedbîran hebûn jî pê re negîhaştin.

Heta ew li xwe hay bû, barana ku bi lezbûna mîna ya ku dê wî ji destê xwe birevîne, çi sermayeyê wê hebû, bi hêrsa ya ku dixwaze dilê xwe li dijminê xwe rehet bike, bi ser wî de dakir. Û bi vî awayî, keda xwezayê ya ji bo kêmkirina tesîrên şilbûna ji ber barana berê, bi erdê de teqiya. Roja ku li hember êrîşên ewrên baranê yên ku ket navbera wê û mirovên ku xwe sipartibûn dilovaniya wê, dest hilneanî, ancax

piştî talûke berteref bû, xuya bû.

Ew lê fikirî ku havîn ev havîn be, dikare cara sisiyan jî wî têxe xefikê. Ji ber vê yekê, divê beriya ku bobelateke din bi-hata serê wî, xwe bigîhanda îstasyonê. Ji xwe, ji bo hevdu-dîtina wî û Serhêt jî wext nêzîk dibû.

Piştî çend deqîqeyan nêzîkî li îstasyonê kir. Beriya ku têke-ve hundur, xwest çixareyeke din pêxê. Ji ber ku li hundur çixarekişandin, qedexe bû.

Di ber xwe de bi kerb got:

– Hema tu nemaye ku çixarekişandin, li her deverê bê qedexekirin. Mirov nikare bi azadî têra xwe çixareyê bikşîne. Ma ev hal e?

Pakêta xwe, careke din derxist û çixareya xwe bi lez pêxist. Hîn ji çixareyê têr nebûbû. Dixan bi ser serê wî ket. Di çend hilman de çixara xwe qedand, lê vê carê neavêt erdê. Li dora xwe nihêrî, gellek mirov diçûn û dihatin. Li ber derî jineke pîr a ku ji her halê wê dixuya ku li benda yekî radiweste, lê bi meraqa ku bê hela ew ê vê qunika çixareyê çawa bike, ziq li wî dinihêrî. Ji ber nerînên jinika pîr ên ku mirov biçûk didîtin, pîr aciz bû. Ji ber vê yekê, qunika di destê xwe de, vemirand û avêt qutiya çopê ya ku bi taybetî ji bo qûnikên çixareyan hatibû danîn û dû re, mîna ku bibêje; “Ma dilê te rehet bû?” li jinika pîr nihêrî. Jinik ji awirên wî aciz bû û berê xwe bi devereke din vekir.

Piştî ku li gor usûlên vî welatî, ji qunika çixareyê xelas bû, berê xwe bi jorê vekir û di ber xwe de got:

– Bila pişik hebekî kêfê bikin

Hewa paqij ya vî welatî careke din tenefus kir. Berê destê xwe da ser sînga xwe û ji xwe pirsî:



– Ma gelo li tu deverên din yê dinyayê hewa weha paqij heye?

Û dû re, li benda bersivê jî nema û ber bi deriyê îstasyonê ve meşiya. Gava nêzîkî li derî kir, li dora xwe nihêrî û dît ku mirovên din sîhwaneyên xwe dadiwerivînin. Ji ber bêhazirîya xwe fedî kir.

Piştî vê, di ber xwe de got:

– Hewa vî welatî paqij e, lê tu îstiqrariya wê tune ye.

Ji xwe ji ber bê îstiqrariya hewayê û bê tedbîriya wî, ev du roj in ku ew ji ber qirika xwe, ne di tu halî de bû; nikarîbû xweziya xwe jî daqurtanda. Ew îro hebekî baştir xuya dikir, lê têra xwe baran xwar. Xuya ye, wê êşa qirikê, wî êvarî rehet nehêle.

Ji ber ku bi vî awayî dest bi rojê kiribû, bêhna wî teng bû û got:

– Ji xwe îro, hertişt ji bin serê wê tahtê derket. Ger ez neçûma ba wê tahtê, belkî roja min bi awayekî din dest pê kiribûya.

Ew taht...

Ew tahta ku wî dikir û nedikir, nikarîbû nêzîkî xwe his bikira...

Gava lê fikirî, bi wê re gellek tiştên din hatin ber çavên wî. Gera xwînê bi leztir, lêdana dil xurttir bû. Çavên wî tije bûbûn. Kelogirî bû. Bi dest nedihat girtin, himbêz nedibû, gotin têra wê nedikir, lê wî ew his dikir. Di hemû şaneyên laşê xwe de his dikir.

Gava lê weha dihat, li dûr dinihêrî; keser li keserê dikişand, dinihêrî, dinihêrî.... lê tu çare peyda nedikir. Vê carê jî weha kir. Di nav xeyalan de wenda bûbû. Di deryaya xeyalan de, xumamekê dikira pêşiya wî bigirta. Ji nişka ve şiyar

bû û destûr neda xumamê.

Bi bawerî û bi rehetiya ku bi qewirandina xumamê re peyda bûbû, di ber xwe de weha got:

– Ev hertim weha ye; berê hêdî hêdî bi xumamekê dest pê dike û dû re tarîfî konê xwe yê reş datîne. Rê li ber mirovî şaş dibe. Mirov xwe pîrr qels û belengaz his dike. Ji xwe ev êrîş jî di van rewşan de xuya dibin.

Wî ev dizanibû, xumam bi bawerî û bi israr, qewirand û bi vî awayî xefika tarîfîyê di destpêkê de xera kir û di hundurê xwe de weha got:

– Te gellek kes xapandine, lê tu çawa bikî, ez ê nexapim. Bila ev ji te re ahd be!

Lê dîsan ji xwe pirsî:

– Gelo ez ê bikaribim vê taqetê hertim di xwe de bibînim?

Ket nav taswasan, tirsek jî li dorê çû û hat. Ricifî. Li dora xwe nihêrî, xwe bi tenê his kir. Berê mîna ku li sitarekê digere, li dora xwe nihêrî û gava tu devereke xalî peyda nekir, hema bêyî ku xwe bide aliyekî, li cîhê xwe rawestiya. Dû re ji cuzdanê xwe sûretek derxist û lê nihêrî.

Çav li hemana bûn.

Bi wî sûretî re gellek tişt hatin ber çavên wî. Mirovî digot qey hemû hêjayiyên wî, di wî sûretî de hatine civandin. Tenêbûn wenda bû, wî xwe di nava dostan de û li cîh û warekî nas his kir. Qelsiya muweqet, teslîm bûbû. Wî xwe hêdî hêdî xurttir his kir, êdî baweriya wî bêtir pê dihat. Bi teslîmbûna qelsiya muweqet re, wî ew taswas û tirsî ku li dorê diçû û dihat jî da ber xwe û ji wê dorhêlê bi dûr xist. Vê carê jî xelas bûbû, heta careke din, Xwedê mezin bû.

Piştî vê serkevtinê, ji xwe re weha got:

– Heta ev mejî rast bixebite û ev dil jî bi heq lê bixe, ez ê

hertim li ser piyan bim.

Dû re li ser vê formulasyona ku wî bi xwe jî neecibandibû, weha fikirî:

– Ez dizanim ku ev formulasyona hanê, ne bi dilê min e. Hinek dikarin bibêjin ku mêrikî dîsa dest bi peyvên qelew kir û hinekî din jî dikarin îddîaya ku bêhna vulgeriyê jê tê, bikin. Lê min di vê rewşê de, ji vê baştir nedît. Ya din jî ji formulasyonê bêtir, naveroka gotinên min, girîng e û ev jî bi dilê min e.

Wî xwe tesellî kiribû, lê îqna nekiribû. Li tu sedemên din negeriya û formulasyoneke din neceriband.

Çavên wî yên qehweyî di bin biruyên reş î qalîn de, betilî xuya dikir. Qermîçokên eniyê êdî nedihatîn veşartin. Eniyeke wî ya fireh hebû. Kurd ji eniyên weha re dibêjin: "Eniya mêra". Gava ev bibîr anî, kêfa wî, xwe di ruyê wî de da der. Baweriya wî bêtir pê hat û di hundurê xwe de pesinî.

Dû re ket nav taswasekê û ji xwe re got:

– Ma mêrantî maye? Ka mêrantî? Bingehe pesinandinê jî hêdî hêdî tê guhertin. Gellek tişt pirr bi lez tîn guhertin. Mêrantî... Mêrantî çûye, lê enî maye. Ez ê çi bikim bi vê eniya bê xusûsiyet?

Lê xwe zû bi zû ji vê taswasê xelas kir û dîsa enî mîna bingehê pesinandinê nirxand. Hiseke weha hatê ku wî bi daxwazeke mezin got:

– Xwezî mirêkek li vira hebûya û min jî têra xwe ji xwe re li eniya xwe ya mêra binihêriya.

Bavê wî jî di nava zilaman de, gellek çaran behsa eniya lawê xwe kiribû û pesinîbû. Lê nuha meydana mêran di destên qermîçokên salan de, ne di tu halî de bû. Veşartina wan

jî gellek zehmet xuya dikir. Ger qermîçokên eniyê bihatina veşartin jî wê yên der û dora çavên wî, ew dîsa bida dest. Çend diranên wî, hîn di temenekî biçûk de, bi destên Ermenîyê kirîvê wî yê ku doktoriya diranan li ber destê bavê xwe fêr bûbû, hatibûn kişandin, hinek jî hatibûn dagirtin.

Çend diranên wî jî mîna fatûraya jiyana li Sûriye û Lubnanê, xatir ji piduyan xwestibûn û li dû xwe, cîh û warekî bêxwedî hiştibûn. Lê tev vê jî gellek diranên xwe, bi saxî û selametî gîhandibûn vê rojê.

Di nava birayan de yê herî kin ew bû. Her şeşbirayên wî jî ne kêmi metre û heştê santîmetreyî bûn, lê bejna wî yek û şêst û şeş santîmetre bû.

Tev li ku gellek carên din ji xwe pirsîbû, vê carê jî bi xwe nikarîbû û pîrsa xwe teqîr nekir.

– Ma gelo yek û şêst û şeş kin e?

Gava li dora xwe dinîhêrî û yên ji xwe kintir didîtin, dilê xwe bi xwe nedîşewitand. Wî carina henek bi yên ji xwe kintir dikir û digot:

– Ez dixwazim hertim bi we re bigerim, wê gavê herkes dê ferqa bejna min î dirêj bibîne.

Rûyekî wî yê nerm hebû. Serma vî welatî jî nikarîbû rûyê wî sert bikira. Devlikenbûna wî hîn jî berdewam bû. Gava dimeşîya, bi bawerî pê li erdê dikir. Nuha gavên wî sistir bûne, lê dîsan jî bi bawerî pê li erdê dike.

Hundurê îstasyonê qelabalix bû.

Makîneyên karta mehê dixwendin, li pêşîya wî, li kêleka hevdu hatibûn rêzkirin. Li ber herdu kulûbeyên biçûk ên ku pêşîya wan camkirî bû, mirovên bêkart, ji bo kîrîna kuponan ketibûn dorê. Wî karta xwe ya mehê di makîneyê re

derbas kir û berê xwe da pêlikên ku dadiketin jêr. Hemû kesên ku dadiketin, xwe dabûn aliyê rastê. Du kesan xwe dabûn aliyê çepê, lê gava li xwe hay bûn, wek ku sûcek kiribin, xwe ji nişka ve dan aliyê rastê û bi vî awayî rê dan wan kesên ku dixwestin bi lez dakevin. Kesî tu zor jî li wan nedikir, lê wan ev qaîdeya hanê bi rêk û pêk, bi cîh dianîn.

Li welêt fikirî, li wan welatên rojhilata navîn ên ku ew lê mabû, fikirî... Ji bo dora firnê, gazê û hwd gellek caran polîs dihatin û ew bi darê zorê dixistin dorê. Ew polîsên ku ew bi xwe tu carî nediketin dorê...

Destê xwe danî ser qayîşa pêlikan. Gava li pêşiya xwe nihêrî û dît ku wî bi tenê destê xwe daniye ser qayîşê, wek ku sûcek kiribe û bixwaze veşêre, destê xwe ji nişka ve ji ser qayîşê rakir û xist bêrîka xwe.

Lê gava li dû xwe nihêrî û dît ku pîrekek û zilamekî din jî destên xwe danîne ser qayîşê, ji ber hisa xwebiçûkdîtîne fedî kir. Dû re li hember vê kompleksê nefretek pê re peyda bû. Tev vê nefretê jî, wî dikir û ne dikir, nikarîbû xwe ji vê kompleksa li hember binecîhan rizgar bike. Lê ma ne ew û kompleks bi hevdu hisiya bûn û ev demek e jî ku hevdu bê minet kiribûn! Êdî heta kompleksa wî îflah bûbûya, ev ê her dom bikira.

Pêlika dawî jî qedand û berê xwe da xeta trêne. Li korîdora xeta trêne, gellek mirov xuya dibûn. Lê tev vê jî bêdengiyek hebû. Mirov dikare bibêje, hema ji dervayî muzîka ku mirov ber bi xwe ve dikşand û wan herdu xortên hevalên hevdu yê ku temenê wan ji şanzdeh salan ne zêdetir bû; yek ji wan xortekî çav şîn î porzerik î gewr î boz û yê din jî reşikekî çavreş î porxelek ê ku henek bi hevdu dikirin, tu kes bi hevdu re nedipeyivîn. Hinek rûniştibûn û ziq li pêşiya

xwe dinihêrîn. Hinekan jî li listeya wexta hatina trêne dini-hêrîn û dû re çavên wan li saeta ku li jor daliqandî bû, digeriya. Bi saya bêdengiyê, muzîk dikarîbû xweş bihata guhdarîkirin.

Di dilê xwe de got:

– Kî dizane, belkî jî ev bêdengî, nîşana hurmeta li hember muzîkê ye.

Ew hêdî hêdî ber bi muzîsyenan ve çû. Sê muzîsyenên ji Amerîkaya Latînî bi muzîka xwe ve, ew ber bi dinyaya ku pêvajoya talankirina wê, bi wê rêwîtiya ku di heyştê Îlona 1492an de, Giravên Kanaryayê li dû xwe hiştin û dû re di dîrokê de bi navê "keşfa" Christoffer Columbus ve bi cîh bû, dest pê kiriye, bir.

Li ser piyan rawestiya û li wan guhdarî kir. Wî hem muzîk û hem muzîsyen, pîrr nêzîkî xwe his kir, lê gava destmala wan î li erdê raxistî dît, nefretekê pêl bi pêl, serê xwe bilind kir. Hisên hezkirinê di bin pêlên nefretê de wenda bûn. Tev vê jî li bêrîka xwe geriya û got:

– Xwedê bela we bide we.

Û çend kronên hûr avêt ser destmala raxistî. Muzîk xweş bû, lê awayê perewergirtinê, pê ne xweş hat. Ev tişt li gor baweriya wî, mîna parsekiyeke modern" dihat xuyakirin.

Li wî kûçikê ku benê wî di destê jinikê de bû, nihêrî, lê ya rastî, ne li kûçikî, bêtir li jinikê nihêrî.

Çavên wê yên kesk î gir, hemû hêza hezkirin û xweşikahiya însên di xwe de civandibûn. Lêvên sor î rûjkirî, hiseke ricifandinê xist dilê wî. Hinarikên rûyê wê, lêvên wî lerizandin û wî ji bo ku devê xwe nexistayê, xwe bi zorê girt. Qirika wê, ji ya Fatima Salih Axa ne kêmtir bû. Porê zer î zêrînî

yê xwe bera ser laşê wê yê bertavkîbûyî dida, wek xemla di ser xemlan re xuya dikir. Sînga wê ya bilind zor dida bişko-kên qutikê wê. Serê herdu şimamokên ku di qutik de hilne-dihatin, hişê ku mabû jî ji serê wî bir. Serê kortika sîngê, mî-na destpêka geliyekî kûr xuya dikir. Mirov di labîrentên di-lekî weha de, rêya xwe bi carekê wenda dike. Çîpên wê yên ku heta bihustekê di ser çongê re, xuya dibûn, mîna du sitû-nan bûn. Nava wê ya zirav, bi saya wî qutikê pemboyî sipî ku bi qasî du tiliyan di ser navikê re bû, bi hemû comerdiya xwe ve çav ber bi seha manyetîk ve dikşand. Vê jî di navbe-ra etek û qutik de tabloyeke ku mirov ji temaşeya wê tu carî tîr nedibû, pêk tanî. Perçê qumaşekî reş ê xwedêgiravî mîna etek ku xwe li kulêmekên zepitî pêçabû, hemû xetên laşên wê nîşan didan.

Gava lê nihêrî, di hundurê xwe de weha fikirî:

– Xweşikahiyeke ku ji harmoniya xwezayê û zanebûnê pêkhatî...

Dû re serê xwe hejand û lê zêde kir:

–Ger tew ev xweza xwezaya Swêdê be!

Di bin tesîra vê kombînezonê de, bi hiseke ku kerb û hez-kirin tê de tev lî hevdu bûne, di dilê xwe de got:

– Ma gelo heqê te heye ku tu ewqas xweşik bî?

Serê wî tev lî hevdu bûbû.

– Xweşîkbûn.... Gelo xweşîkbûn çi ye?

Bi meroqeke mezin lê fikirî.

Fikrên tevlihev ku carinan hevdu temam dikirin û carinan jî elaqe wan bi hevdu re tune bû, di mejiyê wî de, li bin gu-hên hevdu diketin.

– Ma ruyê jina ku dil dixê seha manyetîk û li wira hefs di-ke bû an stêrkên ku di şeva tarî de, li ezmên diçirûsin, bû?

Belkî tabloyên, Vinci, Goya, Munch an ên Picasso bû. Kî dizane belkî tişteke e ku ji van û ji gellek tiştên ku hevdu temam dikin, pêk dihat, bû. Belkî ne yek ji van bû jî. Belkî ji bo dêya ku zaroka xwe şîr dide, xweşikbûn ji zaroka wê û pê ve ne tu tişteke din bû. Ji bo mêrekî, belkî jina ku zarok şîr dida, bû. Ji bo hinekî din, belkî herdu bi hevdu re bûn. Ji bo keçika reşik a di pirtûka ku navê wê “Çavên herî şîn” bû de, xweşikbûn tew ji du çavên şîn û pê ve ne tu tişteke din bû.

Lê ji bo wî, niqteyeke diyar hebû ku ew jî xweşikbûn tişteke e ku mirov nikarîbû li hember laqayt bima, bû.

Belkî sedema seferberiya mezin a ku di laşê mirovî de dest pê dikir, bû.

Belkî ya ku his, fikir û hafize ji nişka ve dixist hereketê û ew li gor sinyalên ku jê diçirûsin, li hevdu dicivandin, bû.

Belkî deryaya bê ser û bin bû. Belkî ezmanê şîn bû. Belkî jî cîhê ku herdu digihêjin hevdu bû.

Belkî her bihusteke axa ku bingeha hesreta wî bû.

Tişt ji hevdu dernexist. Serê wî bêtir tev lî hevdu bû. Dev ji lêgerîna di warê mahneya xweşikbûnê de hebû, geriya û vegeriya ser xweşikahiya li ber çavan. Li laşê wê yê bi awayekî comerd hatibû pêşkêşkirin, dîsa temaşe kir; nava zirav, sînga bilind, geliyê kûr ku sîng dikir du alî, kulêmekên zepitî.....

Di ber xwe de kir niçe–niç û got:

– Divê mirov havînan li vî welatî nemîne û ewqas azab nekişîne.

Halê wî dişibîya halê yekî xwedî dijmin ku devançeya wî hertim li piştê bû, lê heta nuha ew û dijminên xwe tu carî li hevdu rast nehatibûn û ji ber vê yekê jî tu carî bi hevdu de neteqandibûn. Wî jî du meh berê, pakêteke qapûtan kirrîbû



û xistibû bêrika xwe. Xwedê giravî, gava lê biqewimiya, divê destvala nehata girtin. Lê heta nuha yek jî ji pakêtê kêmbû. Nuha pîr meşgûl bû û tew pakêt nedihat bîrê jî.

Çavên wî di sehayeke magnetîk de hatibûn êsîrkirin. Nerînên wî ji çavên jinikê nereviyabûn. Du çavên ku bi daxwazên berlênayêgirtin ve hilmîştî, êrîş dibirin jinikê. Jinik li hember van nerînên bi heyran, bi serê lêvan kenîya. Wî jî ji vê, cesaret wergirt û gavek ber bi wê de avêt. Bêhneke nasîrî xwe li ruyê wî girt. Mest bû. Bêhna “Ysatis”ê atmosfera wî bi carekê dagirt. Belê, wî ev bêhn bi derbekê nas kir. Ysatis... bêhneke xweş û romantîk...

Hevala wî ya ku ew sal û nîvekê pê re jiyabû jî ev bêhn bi kar dianî. Di nava gellek diyariyên wî yên çî li balafirgehan û çî jî di keştiyan de, hatibûn kîrîn de hertim Ysatis jî hebû. Hevala wî ji vê bêhnê hez dikir û ew jî fêrî vê bêhnê kiribû.

Hevala wî...

Hevala wî ya ku piştî sal û nîvekê rojekê jê re gotibû:

– Tu, li min binihêre! Êdî qediya! Ez naxwazim vê pîrsê zêde munaqêşe jî bikim. A va derî!...

Ji bo çî hin hevalên wî di vî warê de, qet nebe heta nuha biserketî xuya dikirin, lê wî ancax sal û nîvekê bi tenê qedandibû? Wê gavê firseta lê fikirandinê jî nedîtibû. Bahola wî di bin çengan de, hilma xwe ancax li mala Azadî vekiribû.

Li xeta trêne mest bûbû. Herdu çavên birçî yên ku ji vê xweşikahiyê pê ve tu tişt ne didîtin, nema bi ya kesî dikirin û di nav xeyalan re çûn.

Şeveke tarî bû. Xuşîna baranê bû. Jinika wî ya sembola xweşikbûnê li kêleka rê, destê xwe ji erebeyan re bilind dikir û ji bo erebeyan xwe ya ku xera bûbû, alîkarî dixwest. Wî li

ber wê, pê li firênan kir. Jinik şil û pil bûbû. Ew ji erebeyê daneket. Jinik hat ba paca erebeyê û xwe bi ser wî de daqûl kir. Di çavpêketina yekem de, ket bin pêlên bilind ên daxwaza bê hed û hudûd. Porê şil û kincên wê yên ku bi saya baranê xwe li laşê wê pêça bûn, hemû pîrektiya wê ya ku dilê wî di kafesê de diperpitand, derxistibû ortê.

Herdu jî di nav hisan de gevizîn. Li benda zemên neman û xwe ji nişka ve li odeyeke fireh ku bi awayekî romantîk hatibû raxistin, dîtin. Bi ya wî ba, jinikê dê kincên xwe qet ji xwe nekiriba û wê rewşa xwe ya ku hemû laşê wî dilerizand xera nekiriba. Lê jinikê kincên xwe yên şilbûyî ji xwe kirin û ji ber bê sebiriya wî, bêyî ku rê bibe ser sutyenê xwe, qutikekî hevirmêş î sipî û dirêj bi ser bejna xwe de dakir û bêyî ku bişkoka bigire, ber bi wî de hat. Bi herdu destên wê girt. Lêvên xwe gîhandin lêvên wê. Berê hêdî hêdî û dû re jî bi şhweteke mezin hevdu mêtin. Wî serê xwe rakir, li herdu çavên ku ew, vê baranê li vê odeyê hefs kiribû nihêrî. Destê xwe avêt bizmikên sutyenê wê û ew avêt ser qeryoleyê. Lêvên wî lerizîn, devê xwe ber bi sîngê ve daxist, lê anonsa ku ji bo pênc deqîqeyan derengmayina trêne hat kirin, ew ji xeyalên wî şiyar kir û dîsa bi rastiya jiyane re rû be rû kir. Ji kerba, hem ji anonsê re û hem jî ji ya ku anons kiribû re, xerber da.

Ji nişka ve gotinên Freud bi bîr anîn. Ji rewşa xwe vecinîqî. Freud, ger formulasyon ne yek be jî bi qasî ku dihat bîra wî, weha digot:

– Mirov dikare bibêje ku mirovê an mirova ku bextiyar be, tu carî fantaziyan nake. Bi tenê ew kesên ne tatmînbûyî fantaziyan dikin. Ji ber ku ew hêza ku xeyalan derdixîne ortê, daxwazên ne tatmînbûyî ne û her fantaziyek bi xwe jî bi-

cîhanîna daxwazekê ye.

Bi çavên ku tirs û taswas jê dihatin xwendin, li dora xwe nihêrî. Wî xwe di devereke teng de û di rewşeke pirr xerab de hatiye zevtkirin, his kir. Li hember Freud li bersivê ge-riya. Ger du Emerîkî, yek jê Helen Singer û yê din Andrew Stanway nehatibûna alîkariya wî, nal nala wî ya di destên Freud de, dê her berdewam bûya. Xuya bû ku wî serê xwe berê jî bi vê munaqeseyê êşandibû. Helen Sînger digot:

– Têkiliyên cinsî kombînezona ku ji fantazî û frîksiyo- nan pêk tî.

Tew Andrew Stanway fantazî dikir bingehê bextiyarbûyî- nê.

– Mirov çi qas fantaziyan bike, jiyana mirovî dê ewqas bextiyar be.

Hebekî rehet bû. Lê nema dizanîbû bê kîjan xeyal e û kî- jan rastî ye.

Di ber xwe de pirsî:

– Xeyal... rastî.... Kîjan kîjan e?

Xeyal û rastî ewqas tev lî hevdu bûbûn ku wî nema dika- rîbû ew ji hevdu veqetandana. Li gor wî, rastiya jiyane carî- nan ewqas dişibiya dojahê ku mirov qîma xwe bi di nav xe- yalan de wendakirinê bêtir tîne.

Hîn ji jinikê tîr nebûbû, trêna hat. Girgira trêna û dengê muzîkê, tev lî hevdu bûn û ji vê kombînezona, dengê xerîb hat bihîstin. Beriya ku trêna hereket bike, bi lez xwe gîhandê. Derî hatin girtin, lê çavên wî li derve man. Trêna hêdî hêdî meşiya, wî jî cara talî li vê sembola xweşîkbûnê nihêrî. Piştî demekê, tunela tarî dest pê kir û mîna dijminekê kete navbe- ra wî û xeyalên wî.

Di tunela tarî de, hiseke fetisandinê ew girt. Hiseke weha bû ku mirovî digot qey, hinekan destên xwe dabûn ser devê wî. Heta îstasyona duyem jî weha dom kir. Ancax, gava trêna li îstasyonê sekinî û ji bo daketin û siwarbûna rêwîyan deriyên xwe vekirin, hilma wî hat ber wî.

Ew hîn di bin tesîrê de bû. Taht, baran, daristan, jinik... Xweşikbûn û hezkirina ku ber lê nayê girtin...

Serê wî tev lî hevdu bûbû. Tew gava dît ku keçek û xortek azadiya xwe ya di warê cinsî de bi hevdu maçîkirina li pêş herkesî û bi awayê mizdana laşê hevdu ve bi kar tîne, delala wî ya ku wî ew tu carî maçî nekiribû, berê di nava xumamekê de li ber çavan xuya bûbû, lê dû re pêlên hezkirinê xumam bi carekê dabû ber xwe û ew di nav xeyalan de wenda kiribû.

Wî jî carekê, bi sirra bayekî evînê, xwe li çira şevên tarî girtibû û xwe di nava agirê derya evînê de dakiribû. Belkî zarokên stêrka wî ya li ezmên, dest bi hejandina dergûşan jî kirine, lê nuha dora wî, dîsa bi pêlên deryaya evînê ve hatibû girtin. Pêl di ser pêlan re ew dan ber xwe. Ew di demeke ku bi qasî mirov çavên xwe bigre û berde de, bi temamî ket çembera evînê û nuha heyva wî ya ku ji bo wî, hîn jî li çardehan bû, bi alîkariya tunela zemên ve, ji nişka ve şewqa xwe dida vagona wî. Şewq û şemala wê vagon dadigirt. Çavên wê yê reş î gir, ew bi hesreta bîst sal berê ve, ber bi xwe ve dikşand.

Bîst sal berê...

Herdu bi hevdu re diçûn dibistanê. Ew li dawîya sinifê, li ber pencereyê rûdinişt. Keçik jî li rêza keçan, yanî li rêza pêşiyê bû. Gava ew diket sinifê û di ber keçikê re derbas dibû, bi nerîna xwe re li wir dima, lê laşê wî, bêyî his û çavên wî,

bi destpelînkê, li ber pencereyê li cîhê xwe yê rûniştinê digeriya. Wî heta demeke dirêj jî ji dervayî çavên reş î ku hiş û aqil pê re nedihîştin, tu tişt nedidît. Demek di ser dîtina çavên wê re derbas dibû, lê her tiştên ku li ser maseya wî bûn, hîn jî mîna çavên hezkiriya wî xuya dikirin. Heta ku ew bi dengê hevaleyê xwe, an jî bi yê mamosteyê xwe ve şiyar bûbûya, ev hal her weha bû.

Keçik jî çend caran li ser situyê xwe zîvirîbû û li çavên wî nihêrîbû, lê ji fediya, berê xwe bi lez guhertibû û dîsa li pêşiya xwe nihêrîbû. Bi her nerînekê, herdu jî ewqas tije dibûn ku qafesa sîngê, dil bi zorê di xwe de digirt. Ev nerînên bi dizî, agir bi dilê wan xistibû. Agir her çûbû gûrtir bûbû û di hundurê du salan de, pêtî di ezmanan re derketibûn.

Beriya ku meseleya wî û ya keçikê dest pê bikira, bi bêsebirî li benda dengê zengilê bû, lê piştî çavên reş, ew bûbû perçeyekî dibistanê û dengê zengilê jî mîna dijminê xwe îlan kiribû.

Ji dervayî ku çend caran, jêbir an pê nûs ji hevdu xwestibûn, bi hevdu re tu carî nepeyivîbûn. Nerînên ku agir jê diçirûsîn, di navbera herdu dilên pak de, pirek ava kiribû. Pira li ser deryaya evînê...

Li gor fikra wî, evînek ku bêhna evîna platonîk jê dihat, di rojevê de bû. Wî evîna platonîk, di pirtûkan de xwendibû û hem li hember pîrozbûna wê û hem jî li hember reftariya evîndarên wê evînê, gellek bi hurmet bû, lê pêwendiyêke weha, bi evîna ku di îdealên wî de hebû, li hevdu nedikir. Daxwazên xortaniyê û pêwîstiyên di vî warî de zor didan wî. Wî êdî biryar dabû û rîsk çî dibûn, bila bûbûna, lê wî dê qet guh nedabûya dorhêla xwe.

Berê, bi nameyan dest pê kir. Di bin fediyeke bêsinor de

dest bi nameya xwe ya yekem kiribû û hisên xwe nivîsandibûn. Lê piştî ku hebekî pê de çûbû, fediya xwe dabû aliyekî. Tesîra heyecan û bêtecrubetiya di vî warî de hebû, hîn di nivê nameya yekem de kêmbû. Hemû şiyana xwe ya edebî xistibû hereketê û pênuşa xwe sipartibû dilê xwe û di serkaxizê re biribû û anîbû. Pênuşê jî li hember hêza evîna wî, serê xwe tewandibû û li gor dilê wî ji vî serê çûbû wî serî. Û bi vî awayî hezkirina ku ji ber azab hatibû kişandin, ji devê pênuşa ku tercumana dil bû, li serkaxizê herikîbû.

Name li dû nameyê hatibû şandin, lê keçikê bersiva tu nameyan nedabû. Ji ber ku gellek caran nameyên weha bi saya hin xêrnexwazan ketibûn destên mamosteyan. Xwediyê nameyan bi ser zimanan ketibûn û ji ber hetika ku bi ser wan de hatibû, evîna wan jî sabotebû. Ji ber vê tirsê, keçikê tu carî ranehiştibû pênuşê û hisên ji dilekî pak ku bi hezkirinê ve hilmiştî jê re nenivîsandibûn.

Nameyan jî têra guhertina awayê danûstendina di vê evînê de hebû, nekiribû.

Piştî ku ji Ahmedê Mêqerî yê ku di sinifê de li kêleka wî rûdinişt û nuha jî li Swêdê bûye êsîrê mûçinka ku li seyda tayên sipî digere, bihistibû ku mala bavê keçikê dê ew bidana mala apê wê, êdî tu kesî nema dikarîbû ew bigirta.

Li gor agahdariyên Ahmedê hevalê wî yê porrşayik î serçavgirover, malbata wan keçên xwe tu carî nedidan kesên ji derveyî malbatê. Zarokên xwe hertim ji malbatê zewicandibûn. Heta wê gavê tu kes li dijî wê adetê derneketibû. Malbata wê malbateke xwedî dijmin bû.

Gava ku evîna wan dest pê kiribû, bîst û du salên dijminatîya wan jî qediyabûn. Di wê pêvajoya dijminatîyê de, ji herdu aliyên gellek mêr hatibûn kuştin. Dijminatîya ku her mê-

rek di heyfekê de daqurtandibû, hejmara zilamên malbata wan jî pirr kêr kiribû. Zewicandina di nava malbatê de jî ji bo paraztin û berdewamiya malbatê mîna misogeriyekê hatibû dîtin.

Lê li gor wî, her çi dibû bila bûbûya, diviyabû di vê evînê de, awayê danûstendinê bihata guhertin. Wî weha hêvî dikir ku ger herduyan bi hevdu re hewil bida, belkî wan ê bikarîba bi kêmanî ji bo danûstendinên xwe, ev adet bê tesîr bihiştana. Li gor wî, ji bo vê, piçek cesaret û piçek însiyatîv diviyabû. Heta demeke dirêj jî bi hin nameyên bêbersiv û bi nerînên dizî û şermokî îdare kiribû. Li xwe fikirî, hein ew cesaret û hem jî ew însiyatîva ku dihat xwestin, pê re hebû. Biryara xwe dabû, divê hezkiriya wî jî bi vê biryarê bihata hisandin. Ew hertim bi şiyana xwe ya îqnakirinê dipesinî. Ger pêwîst ba, wî dê bikarîba hezkiriya xwe îqna bikira. Lê ji bo vê, diviyabû ew carekê ji nêzîk ve bidîta, ji çavan dûr, li ba wê rûnişta û ji bo pêşeroja vê evîna ku ew bi agirê wê dikeliyan, ew îqna bikira. Rojekê heta sibehê, xew neketibû çavan û li ser peydakirina çareyan serê xwe êşandibû. Ew serê sibehê, bi lez ketibû hundurê sinifê û çûbû ba pencereyê rûniştibû. Lê ji nişka ve rabûbû ser xwe û ber bi maseya pêşiyê ve meşiyabû. Gava keçikê lê nihêrîbû, dest û lingên herduyan jî li hevdu geriyabûn. Keçik bi hezkirin ve bişirîbû. Heyecanê tu nemabû ku ew teslîm stendiba. Lêvên wî lerizîbûn û nema dizanîbû bê wê çi bigoşa. Wî xweziya xwe ji nişka ve daqurtandibû û bi zorê gotibû:

– Gelo ferhenga te ya Tirkî heye?

Keçika ku ji do de razî bû, ferheng bê îtiraz dabû wî. Ew jî çûbû cîhê xwe û xwedê giravî li hin gotinan geriyabû. Ka-xiza ku li ser wê; “Delala ber dilê min, ez ê li ber trafoyê li

benda te rawestim. Ger tu ya hatinê bî, piştî ku ev nivîs ket destê de, li min binihêre û bibişire.” hatibû nivîsandin, xistibû nav ferhengê û ew dîsa dabû wê û vegeyabû cîhê xwe.

Heta bersiv hatibû dayin, di cîhê xwe de tebatî neketibûyê. Piştî bîstikekê, nerîneke çavên reş û pê re bişirandinek... Êdî dil bi yekcarî ji desthilanî ketibû, xwe bi tamamî spartibû. Çavan ji trafoyê pê ve, tu tişt nedîtibû. Heta wê gavê, qîma xwe bi nerînên bi hesretê ve hilmîştî anîbû, lê êdî hisên wan serê rişmê ji wan stendibû.

Ew wek li ser êgir bû. Ders bi qasî salekê dirêj hatibû hiskirin. Wext derbas nebûbû. Deqîqeya ku heta wê gavê şêst saniye ajotibû, bi qasî saetan dirêj xuya bûbû. Kaloyê ku guloka zemên bada dida, êsîr hatibû stendin. Wî weha his kiribû ku herkesî û hertiştî ji bo wexta hevdudîtina li ba trafoyê neyê, çi ji destên wan hatibû, teksîr nekiribû.

Gava keçikê ew li ba trafoyê dîtibû, berê li dora xwe nihêrîbû û dû re ji bo peydakirina cîhekî xewle, lezandibû û derbasî aliyê din î rê bûbû. Keçik li kêleka rê rawestiyabû û bi maneya; ”Ma ez dakevim nav rezî?” li wî nihêrîbû. Piştî bi serê xwe erêkirinê, wî jî hêdî hêdî ji wir dabû rê û berê xwe dabû nav rezî.

Wî keçik ji dûr ve taqîb kiribû. Ne ji bo xwe ba jî diviyabû ji bo keçikê, pirr bi dîqet hereket bikira.

Li bajarê ku riq î rût ku ji bo dermên bûya jî dar lê peyda nedibûn, rezê ku heta çavên mirovî didît, dirêj dibû, wek xemla bajêr xuya dibû. Holika nav rezî hîn jî nehatibû xerakirin. Lê weha xuya bû ku êdî tu kes li ser ranediket. Keşmûlên li erdê û goşiyên di mêwan de hişk bûbûn, mîna nîşana berdana rezî xuya dikirin.

Gava li nav rezî di bin sitara darekê de hatibûn ba hevdu,



ber bi lehiya evînê ketibûn û di geliyekî kûr de, bi heybet herikîbûn. Ew demekê weha bêdeng mabûn. Herduyan bi destên hevdu girtibûn û bi tenê li çavên hevdu nihêrîbûn. Wan ne hewce bû ku ji hevdu re zêde tu tişt bigotana. Komunîkasyona wan, bi rêya çavan ve hatibû danîn. Tercume ne pêwîst bû. Ji xwe tu gotinan nikarîbûn, şûna wan nerînan bigirtana. Wî xwestibû wê himbêz bike. Keçika ku hîn nuh ferq kiribû ku bi destên hevdu girtibûn jî ber bi wî ve çûbû, lê dû re ji nişka ve, fikra xwe guhertibû û mîna ku jê re bibêje; "Destên min besî te ne" li wî nihêrîbû. Lê herdu jî bi hesreta du salan ve dikeliyan.

Bejna wê ji ya wî ne kêmtir bû. porê wê yê reş î bi gulîk, bi xweşikahiya ruyê wê fûriyabû ser çavên wî û ew bi yekcarî xistibû bin tesîra xwe. Wî berê destê xwe di porê wê de dabû û dû re, ber bi ruyê wê ve daketibû. Ruyê wê, her çûbû di çavên wî de hîn xweşiktir bûbû û di dawiyê de wek yê xwedêya xweşikahiyê xuya kiribû. Pêlek hisa maçîkirina hinariyê ruyê wê, ew livandibû, lê keçika ku di bin tesîra tirs û fediyê de lerizîbû bi situxwarî lê nihêrîbû û mîna ku bibêje: "Ez jî dixwazim, lê tu bi ya min bikî, ewqas bes e" destê wî firmandibû.

Berdilka reşa a ku beskureke sipî bi ser de hatibû dirûtin, ewqas lê kiribû ku wî nikarîbû keçik bê kincên dibistanê xeyal bikira.

Keçikê ji aliyekî bi nerînan bi evînê ve hilmiştî li wî nihêrîbû û ji aliyê din ve jî bi çavên bi tirs, li dora xwe nihêrîbû. Laşê wê bi heyecanek e ku dirûvê tirsê dida lerizîbû. Xwestibû xwe biavêje himbêza wî, lê dîsa li xwe hay bûbû û hisên xwe xistibûn bin kontrolê.

Li gor agahdariyên ku keçikê di derheqa wî de wergirtibûn, bi wî re li hember adetên civatê, nefretek e ku bingehê xwe ji xwendinê wergirtibû, lê di bin ronahiya zanistê de baş nehatibû formulekirin, hebû. Li gor wî, tiştên ku di pirtûkan de hebûn, diviyabû bihatana tetbîqkirin.

Ew di demeke pîrr kurt de, bi xebatên grûpî yên perwerdekirinê bûbû yekî din. Ji bo beşdariya munaqeseyên ku li qahwexaneyan dibûn, çî bihata peydakirin, diviyabû hatiba xwendin. Na na, ew ê di munaqeseyan de qels xuya bûbûya. Diviyabû ku wî hemû pirtûkên ku ji wan jêderk dihatin wergirtin û di munaqeseyan de dihatin bikaranîn, xwendibûna. Gellek hevalên wan pirtûk bi temamî jiber kiribûn û gava jêderk werdigirtin, ji bo yên din bawer kiribana, bêyî ku li tu deveran binihêrin, hejmara rûpelan jî digotin.

Di wê pêvajoyê de, ew jî bûbû gurê pirtûkan. Xwendineke rawestan lê tunebû, di rojevê de bû. Ma çî nedixwend: Pirtûkên mîna Prensîpên bingehîn ên felsefeyê, Dewlet û şoreş, Kapîtal, Antî-Duhring, Têzên Nîsanê, Dinyaya herî xweşik, Teorî û Pratîk û gellek pirtûkên din ên ku munaqese bêyî wan nedihatin meşandin. Ji romanên jî “Û Don bê deng diherikî”, “Firtina”, “Mirov divê çawa bike”, “Ew mîlîtanek bû”, “Ez te li ser navê gel mehkûmî mirinê dikim”, “Dê”, “Zîndanên Saygonê” û gellek berhemên din. Ji xwe, helbestên Nazim û Ahmed Arîfî jê nediqetiyên.

Semînerên li Komeleya Piştgiriya Civakî û xebatên grûpî yên perwerdekirinê, munaqeseyên li qahwe û odeyên gundan –tev li ku herkes li malê bi Kurdî dipeyivîn jî– ku bi zîmanê Tirkî dihatin meşandin, rêya pêvajoyeke nuh a fêrbûnê vekiribûn.

Hêlînên fêrbûnê li derveyî xwendegehên dewletê hatibûn

danîn. Li wira qedexe nedihat naskirin. Li wira sînorên ku hatibû danîn ji ortê radibûn. Û li wira li ser bingehê awayê têgihîştinê jî veqetandineke fikrî civak dabû ber xwe.

Ew û birayê keçikê yê ku endamê tevgerêke din bû, di munaqeseyên qahwe û odeyan de gellek çaran ketibûn pêxîra hevdu. Hem ji ber birayê xwe û hem jî ji ber tesîra pêvajoyê, keçikê jî para xwe ji xwendinê wergirtibû û li gor hevalên xwe yê din jî pirr zana dihat xuyakirin.

Ew berê tu carî bi vî awayî nêzîkî hevdu nebûbûn û tu carî di mahneya sohbetê de, bi hevdu re nepeyivîbûn. Pêlên evîndariyê hişên wan ji serê wan biribûn.

Ev du sal bûn ku ji terefê hisên xwe ve hatibûn îdare kirin. Du salan, agir bi dilê wan ketibû. Lê li nav rezî, êqil rê li ber hisan girtibû. Êqil mîna dijminekî serê xwe hildabû.

Wî piştî ku keçik bi wê biryara xwe ya di warê guhertina awayê danûstendinê de, hesandibû, mîna ku ew ne yê ku ev du sal bûn, newêribû bi hezkiriya xwe re bipeyiviya bû, ji wê re weha gotibû:

– Ez tu tiştêkî zêde naxwazim. Ez dixwazim serbixwe bim. Ez hew vê dixwazim. Ez dixwazim li gor xwe hereket bikim, pêwendiyên deynim û bijîm. Ji ber ku hinekî din, ji min cuda difikirin, ez nikarim jiyane li xwe bikim do jeh û ez naxwazim hew ji bo xatirê wan, ji bo ku dilê wan nemîne, tiştên ku ez jê bawer nakim, bikim. Ev du sal in ku ez û tu tiştêkî dixwazin. Ez û tu bi agirekî dikelin. Ez û tu li ba hevdu, bi xeyalên hevdu dijîn. Ez û tu ji du metreyan bi hesreta hevdu dişewitin. Lê em ji bo xatirê hinekî din, dest û lingên xwe girê didin. Em îrada xwe ya azad, teslîmî kêfa hinekî din ên ku tu carî nikarin vî agirê di dilê me de heye, fahm

bikin, dikin. Belkî tu ê bibêjî ku ev fedekarî ye, lê li gor lênerîna min, fedekariya herî mezin, xebata rizgarkirina îrada azad e; hewildana guhertina adetên ku li pêşiya pêşveçûna civakê radiwestin e û pêşkêşkirina pêywendiyên azad û qetandina kirasê tarîtiyê ye.”

Keçikê bi hezkirin û bi meraq lê guhdarî kiribû. Piştî ku wî gotinên xwe qedandibûn jî wê li hember gotinên wî, weha gotibû:

– Tu pirr baş difikirî. Ez bi xwe jî naşibim keçên din. Ez xwe ji mêran kêmtir nabînim. Lê ez adetên civaka xwe jî baş dizanim. Tu jî vêya pirr baş dizanî ku ez ji nuha ve, gava ku hîn van adetên dibin mijarê rexneyên te, di civakê de, bi hemû xurtbûna xwe ve derbas bibin û pêywendiyên mirovan li gor van adetên tînan danîn, nikarim bi awayekî din hereket bikim. Ger ez li gor fikrên te hereket bikim, navê min dê di civakê de, bi xerabî derkeve. Ger tu di vê meseleyê de ciddî bî, divê tu rojekê beriya rojekê, min ji mala bavê min bixwazî. Yan na, ev pêywendî dê me herduyan jî pirr biêşîne.

Keçikê li ber xwe nihêribû. Hebekî fikirîbû, keserek kişandibû û dîsa dewam kiribû:

– Û ya din jî divê tu careke din, ji bo hevdudîtina bi vî awayî, zorê nedî min. Gelo xweha te, bi yekî re di nav rezî de bê dîtîna, dê çi biqewime?

Ji nişka ve lê fikirî. Gelo xweha wî li devereke xewle bi yekî re hatiba dîtîna, wî dê çi kiriba? Di bin barê fikreke weha de nêviyê taqeta xwe wenda kiribû. Di civatê de cîhekî wî hebû. Mirovên jê mezintir jî xatirê wî dizanîbû û jê re hurmet dikirin. Gava xelkê bihîstiba ku xweha wî li devereke xewle bi xortekî re hatibû dîtîna û wî jî li hember vêya dengê

xwe nekiribû, dê çi tesîr li statuya wî ya di civakê de hebû, kiriba? Xwe di rewşeke weha de di ber qahwexaneyekê re derbaskirî xeyal kiribû. Tu kesî li aliyê wî nenihêribû. Tam di esnaya ku dê hezkiriya xwe îqna bikira de, xeyaleke weha pirr pê ne xweş hatibû. Bêhna wî teng bûbû. Di navbera du şexsiyetên cuda de çûbû û hatibû. Carinan weha fikirîbû ku ev tiştêkî normal e. Lê gava xwe di nav civatê de fikirîbû, toleransa li hember vê rewşê wenda bûbû. Qelsbûna xwe ya di vî warî de his kiribû û taqeta ku bikarîba netîceyên vê bûyerê rake, di xwe de nedîtibû. Ji derveyî îrada xwe li hember vê fikrê, bi pêleke nefretê hatibû dagirtin.

Li gor baweriya wî, di vê evînê de ecêbiyek hebû. Wek mirovên rojhilat bi evîndariyeke xurt bi hevdu hatibûn girêdan. Danûstendin û destpêkirina evînê, heta wê gavê jî bi temamî li gor adetên rojhilatî bûn. Di navbera wan de, tu tişt jî derveyî adetan neqewimîbû. Lê li nav rezî, wî xwestibû xwe, ji rastiya xwe moderntir nîşan bide. Keçikê rewşa wî fahm kiribû. Wê bi problema wî dizanîbû, lê li hember adetan dest û lingên xwe girêdayî his dikir. Xwestibû wî vegerî-nê ser pirsê.

Ji ber vê yekê weha dewam kiribû:

– Ez dixwazim tiştêkî din diyar bikim, divê tu bêyî wextwendakirinê, min bixwazî. Ez dizanim ku pismamekî min, difikire têkeve devê rêya min. Wê gavê dê hertişt li bin guhê hevdu bikevin. Heta nuha, zewacên keç û kurên malbata me, di nava malbatê de bûne.

Wî xwe negirtibû û gotibû:

– Ê, ma tu qet li evîna me nafikirî? Em ê çawa bikin?

Keçikê dîsa adet xistibûn orta xwe û wî. Vêya ew bêtir hêrs kiribû:

– Adet, adet, adet! Ma em ê teslîmî mirovên cahîl bibin? Li dora xwe binihêre, bê kîjan tetbîqkarên van adetan ji min û te pêşdetir û zanatir in? Dewra wan qediya! Tu tiştên ku ew ê bibêjin, êdî nema.

Keçîkê gotibû:

– Mirov li te ecêbmayî dimîne. Tu dixwazî xwe ji min cudatir nîşan bidî, lê di hin waran de, tu bi xwe jî yek ji wan tetbîqkarên adetên me yî. Li van herdu salên ku em ji hevdu hez dikin bifikire. Rast e, min cesaret nekir û ez li sinifê nehatim ba te rûneniştim û min bi dengê bilind ji te re negot ku ez ji te hez dikim. Lê te di vî warî de kîjan rojê reftarek e ku ji ya ji min cudatir bû, nîşan da? Di pêvajoya evîna me de, ji aliyê xusûsiyetên têkiliyan tu ferqa min û ya te tune ye. Tu carinan dixwazî xwe mîna Rahmetovî nîşan bidî, lê bi helwesta xwe tu ji Rahmetovî bêtir Bazarovî tîne bîra mirovî. Heqê te tune ye ku tu wan biçûk bibînî. Bazarovî jî qet guh nedida xelkê. Hetta gava jê hatibû pirsîn “Tu ji bo çi gundiyan biçûk dibînî?” bersiva wî tu jî dizanî: “Ma ew la-yiqî biçûkdîtîne bin, ez ê ji bo çi wan weha nebînim?”. Tu bi heqaretê nikarî mirovên ku tu dixwazî biguherînî, qezenc bikî.

– Tu vêya ji kî derê derdixî? Bazarovî bi çavekî biçûk li evîne dinihêrî. Ma ger ez weha bûma, çi karê min li ba te hebû? Ya din jî prensîpa jiyanê ya Bazarovî, bi tu prensîpan ve negirêdan bû. Di munaqesheyên di navbera grûpan de, ez tîpên wek Rahmetovî derdixînim pêş û her yek ji me dixwaze bibe Rahmetovek. Lê ez ne Rahmetov im. Rahmetovî di warê evîne de, mîna min nedikir. Wî nedixwest qedera kesî bi ya xwe ve girê bide. Li gor Çernîşevskî jî yên weha hindik in û gava yên weha tune bûna, jiyan dê ji xweber bifetisiya.

Lê ma tu dibêjî qey ez xwe weha dibînim?

Kelogirî bûbû. Di navbera his û şexsiyetên cuda de çûbû û hatibû. Tansiyona munaqeseyê hebekî bilind xuya kiribû. Wî ev ferq kiribû û ji ber vê piştî ku kela wî hebekî daketibû, bi dengê berger, gotibû:

– Dijîtiya di navbera fikir û tevgeran de, ji çavên min jî ne-reviyaye, lê ev ne heqaret e, rastî ye.

Dû re li rewşa xwe û wê ecêbmayî mabû û ji nişka ve kiribû qêrîn:

– Haho, ev çi hal e? Bala xwe bidê, bê em di sewiyeyê çawa de, munaqese dikin û têkiliyên me yên vê evîne çawa ne. Em bi sewiyeya xwe li dinyayê din dijîn, lê tevger û xusûsiyetên têkiliyên me aîdî dinyayê din e. Ger ew te nedin min, ma em nikarin hevdu birevînin?

Dilê wê bi qasî yê Zînê bi hezkirin lê dixist. Çavên wê wek ên wê, ji derveyî hezkiriyê xwe tu kes nedidît. Hayê wê ji evîna Binefşa Narîn tunebû. Ger hayê wê ji evîna Binefşa Narîn hebûya, wê jî dê hertişt bida ber çavan û hezkiriyê xwe bê tirs li ser sîng û berê xwe dawetî nêçîrê bikira. Lê ne bi wî re fedakariya kurê Mîrê Hekariyan hebû û ne jî bi keçîkê re ew cesaret û daxwaza ku ji bo vê evîna pîroz, bikarîba dinya bida aliyekî hebû.

Ev ji gotinên keçîkê pîr eşkere xuya dibû:

– Tu vêya ji nuha ve bizanibî ku ez jiyane li xwe diherimînim û xwe ji mala bavê xwe nakim û tu navî naynim ser wan. Ez nikarim, nikarim, nikarim! Belkî tu ê bibêjî, ev fedakariyê bêaqilî ye, lê ez nikarim derkevim dervayî van sînoran. Em ê bi hevdu re hewil bidin, belkî felek li halê me binihêre û deriyekî xêrê li me veke.

Ew sor bûbû, lê tev ku pîr zor xuya dikir jî dev ji hewil-

danên xwe yên ji bo îqnakirinê bernedabû:

– Xuya ye, li gor te, lênerînên min rast in, lê tetbîqkirina wan a nuha xeyalperestî ye. Tu jî min dixwazî û tu di mustewa fikrî de, ne bi giştî be jî bi gellek awayan, wek min difikirî, lê tu naxwazî wek min bikî. Dijîtî di vir de ye. Ma gelo ev ne paradoksek e? Ger mirov bi awakî bifikire, lê bi awakî din bike, ne durûtî ye? Ez fahm nakim, bê tu çawa dikarî weha bikî. Divê mirov li gor fikrên xwe, hereket bike, da ku bikaribe li hember adetên paşverû alternatîveke berbiçav pêşkêşî civakê bike. Em nekin, kî wê bê vê derê û ji berdêla me, vî karî bike?

Keçikê ew di warê fikrî de tesdîq kiribû, lê ji zanebûna se-wiyeya pêşveçûna civakê bêpar nirxandibû. Di rûyê keçikê de, samîmîyet û li gor adetan jî tecrube dihat xwendin. Se-wiyeya têgihîştina wê, ji bo keçikeke di vî temenî de, pîrr bilind xuya dikir. Vê jî karê wî yê îqnakirinê, diwartir kiribû. Hemû hisên keçikê, xwe di çavên wê de civandibûn û ji wir, berê xwe didan wî. Wî hingî li çavên wê nihêribû, gotibû qey ev keçik hew ji çavan pêk hatibû. Keçik wexta peyivîbû, destê xwe avêtibû gulyê darekê û xwestibû tijebûna çavên xwe veşêre, lê wî destên xwe avêtibû ser situyê wê û ew ber bi xwe ve zîvirandibû. Çavên keçikê bi hezkirin dibiriqandin û mîna ku bibêje; “Adetên me weha ne, ne sîcê min e”, li wî nihêribû. Bîstikekê bêdeng mabûn.

Lê gotinên keçikê ev bêdengî xera kiribû:

– Ez ji te hez dikim. Ev du sal in ku çavên min vêya bi her awayî ji te re dibêjin. Lê divê em realîst bin. Ez ji diya xwe û bavê xwe jî hez dikim. Ez ji xwişk û birayên xwe jî hez dikim. Ê ez nikarim xwe bi yekcarî ji wan bikim. Ez dixwazim gava ku tu têkevî jiyana min, dinya min firehtir bibe, ne



ku fatûraya wê, wendakirina hemû têkiliyên min yên ku li ber dilê min hêja ne, be. Ger fatûra dê ev be, divê ez ji nuha ve ji te re bibêjim ku ev fatûra pirr giran e û ez ne ji bo dana vê fatûrayê amade mim û ne jî dixwazim bidim. Lê ez ji te jî hez dikim. Fatûraya paraztina têkiliyên bi malbatê re, dikare qutkirina têkiliyên bi te re be, wendakirina te be. Ez vê dizanim û dixwazim diyar bikim ku ev fatûra jî pirr giran e, lê ger ez mecbûrî hilbijartina yekê ji vana bibim, divê ez li hember te bi durustî bibêjim, ji xwe mirov nikare li hezkiriyê xwe derewan bike, ez ê xwe feda bikim û deriyê dilê xwe bikim deriyê dojhê û ez ê nehêlim ku bav û birayên min di civatê de, serê xwe di ber xwe xin.

Ger hayê wî wek nuha ji destana Mem û Zînê hebûya, ger hayê wî ji fesadiya Beko, ji dixsî û xerabiya Beko hebûya, wî dê adetên civakê yên ku diketin navbera wî û evîndara wî, mîna Beko bi nav kiribana.

Wî di ber xwe de, bi kerb gotibû:

– Realîte... Realîst bûn.... Naskirina realîteyê tiştek e û xwe teslîmî wê kirin, tiştekî din e.

Lê li benda tu bersivan nemabû. Ji ber ku piştî gotinên keçikê, êdî rewş fahm kiribû. Lê dîsa xwestibû bipeyive. Lêvên wî lerizîbûn. Li gotinan geriyabû. Mîna ku qilçixek ketibû qirikê û xwestibû wî qilçixî derxîne, bi kuxikekê sor bûbû. Dû re xweziya xwe daqurtandibû, lê ji berdêla gotinan, hêsîrên wî xwe ji kortikên çavan bera xwarê dabûn. Hêsîran di ruyê wî de cuhokên xwe bi hêsîrên vekiribûn û heta ser lêva wî ya jorîn daketibûn. Hêsîran gotin av dabûn. Gotinan xwe di deryaya evînê ya ku ji hêsîrên çavên melûl pêkhatibû de dakiribûn û bi awakî pak û zelal, bi awayê xwespartina hisên mirovî tê de xuyayî, ji dev herikîbûn.

Di nava xir û cira salên 70–yî de, xwe wenda kiribû.

Heta ew bi xwe hisiyabû, zarokê wê bi ser lingan jî ketibû. Bêyî ku evîndar bigihêjin miradên xwe, rûpelekî evînê li wan hatibû girtin. Divê wî qîma xwe bi xeyalan bianiya. Xeyala afrodîta wî hîn jî li ber çavan bû. Gava ew xeyal dikir, rengê dinya wî dihat guhertin û ji nû ve şikil werdigirt.

Her cara ku evîna wî dihat bîrê, keserek kûr dikişand, çavên wî li dûranê li tişteki digeriya. Lê wî dû re hertim di ber xwe de weha digot:

– Evîna xortaniyê.... Tavên biharê...

Vê carê jî weha got.

Hêdî hêdî bi ser xwe de dihat û hîn nuh ferq kir ku li ser piya ye û divê rûnê. Ji bo rûniştinê li dora xwe nihêrî û li cîhekî vala geriya. Cîhek li kêleka zilamekî kal peyda kir. Hîn cîhê xwe xweş nekiribû, dît ku li hember wî, li rêza sisiyan Azad rûniştibû. Wî qet texmîn nedikir. Gava wî Azad dît jî ew şaş mabû. Ji çavên xwe bawer nekir, dîsa lê nihêrî. Dile wî ketibû cîh, yê ku li hember wî, ji hevalê wî yê kevin Azadî pê ve, ne tu kes bû. Lawikê wî yê çarsalî ku navê wî Arjen bû jî pê re bû.

Serê xwe bi wayekî ecêbmayî kil kir û got:

– Kî bîra Azad...

Tu nemabû, rûyê wî ji bîr bikira. Mirovî digot qey, azad ketiye silûkê. Ne Azad bi tenê, lê gellek kes piştî ku hatine vî welatî, di quncika xwe de melisî mane.

Nema dihat bîra wî, bê cara dawî kengî Azad dîtibû. Porê Azadî yên li herdu kêlekên serê wî, hîn jî terka wî nekiribûn. Lê temberîka wî ji zû ve xatir jê xwestibû û li dewsa waran çend tayên lertzokî hiştibûn. Wan jî dikirin, nedikirin nikarî-

bûn rûtbûna serê wî veşartana. Çavên wî baş bi kort çûbûn. Bêvila wî ji ber ruyê wî yê zeîf, baş kişiyabû. Du xetên qermîçokên ruyê wî, mîna nîşana bêtaqetiya wî diyar dibûn. Çenga wî ji berê dirêjtir û devê wî ji berê sistir xuya dikir. Gava Azad rabû ser xwe û lawikê xwe derbasî aliyê pence-reyê kir, wî dît ku pantalonê wî ancax bi alîkariya çend qul-pên nuh ên ku di qayîşê de hatibûn vekirin, jê nediket. Dirêjbûna herdu milên wî, bi laşê wî yê zipî zuha, ew mîna xeyaletekî dida xuyakirin. Berçavka wî ya ku daketibû ser bêvilê, ew bi emirtir rê dida. Qorika piştê di bin qutikê wî de bilind bûbû. Tev hemû hewildanên wî yên ji bo xwerastkirinê jî xûzbûna wî nedihat veşartin.

Wî hebekî din bala xwe da Azadî. Azad bi lêwik re dipeyivî. Gava dipeyivî metalên devê wî diçûrisîn.

Gava baş bala xwe dayê, bi kerb weha got:

– Heyhat! Zemên çi aniye serê vî fêrisî ku min dikira ew nas nekiriba...

Şaşbûn ji ser xwe avêt û berê bi serê xwe silav lê kir û dû re jî çû ba wî û bi destê wî girt. Li halê wî pirsî, lawikê wî xist himbêza xwe, destê xwe di serê lêwik de da û ew ji herdu aliyên rûyê wî ve maçî kir.

Dîsa li Azadî nihêrî.

Hevaltiyeke wan î dûr û dirêj hebû, lê nuha, herduyan jî nizanîbû, bê ji bo çi weha bûye. Gelo şertên vî welatî, ji bo pêwendiyên berê, dest nedida, ya jî rewşa Azadî ya taybetî bûbû sedem? Belkî jî ew bi xwe sedem bû. Xuyabû ku di vî warî de, li gel hinek faktorên din, hersê faktor jî xwedî rolekê bûn. Lê her çi dibe, bila bibe, nuha pêwendiyeyeke wan î pirr xurt nemabû. Herduyan jî ji ber vê rewşê, aciziya xwe çend caran diyar kiribû û bi hevdu re li ser sedeman fikirî-

bûn, lê tu tişt jê dernexistibûn.

Hisên wî yên nostalgîk ji nişka ve bilind bûn. Di trêna binê erdê de, xweziya xwe bi demên berê anî. Mîna ku bibêje "Ka hevaltiya berê?" bi gaziî li çavên Azadî nihêrî. Navê "Mehemed Elî", piştî daketina binya xetê, bûbû Azad. Vî navî ew bi du awayan şad kiribû. Bi vî awayî hem ji navê "Mehemed Elî" xelas bûbû û hem jî navekî bi Kurdî bi dest xistibû. Gava hinekan ji qestî bangî wî dikir û digot:

– Mehemed Elî!

Pirr hêrs dibû. Ji hêrsa hingî ewqas sor dibû, nema dizanîbû bê wê çi bigota. Lê wî dizanîbû ku ew çiqas hêrs bûbûya, hevalên wî dê ewqas bêtir lê sor bûbûna. Ji ber vê, ji mecbûrî dev ji hêrsbûnê berdida û li ber hevalên xwe digeriya û digot:

– Lawo, ji bo xwedê li min weha nekin û ji bo ez ji vî Mehemed Eliyê ku bavê min kiriye bela serê min, xelas bibim, alîkariya min bikin.

Di malekê de gellek heval; ew û Azad jî di nav de, bi qasî şeş salan, bi hevdu re jiyabûn. Tev gellek zehmetî û problemên wê demê, bi hevdu re gellek wextên xweş jî bihurandibûn. Di wê pêvajoyê de, hewa wê hêlîna sirgûnan jî tenefus kiribûn.

Xweziya xwe dîsan bi wan rojan anî. Xuya bû ku bêriya wan pêwendiyên germ û ji dil, wê hisa hevaltiyê û wê dostaniya xurt kiribû. Gellek bîranînên wan ên muşterek hebûn.

Ma bi hevdu re çi kiribûn, çi nekiribûn... Ma bi hevdu re, hindik caran nêzîkî mirinê bûbûn? Tew di sînor re derbasbûn... Ew jî nema dizanin, bê ji ber pêwîstiya xebatê, wan

çend caran xwêdana sar dabûn; bê çend tayên porê wan ji ber tirsaxa mayinkirî sipî bûbûn.

Wek îro dihat bîra wî. Wexta dihat bîra wî, hingê weha kûr lê difikirî, mirovî digot qey, wê tirsaxa ku ew wek pelê çilo dilerizand, wê heyecana ku xwîn di damaran de bi lezbûna herî bilind digerand û wê mêrxasiya ku bi hêviyê ve hişk girêdayî, laşê wî ji nû ve didan ber xwe.

Di wê rewşê de hertim ev gotin bi qehir ji devê wî diherikîn:

– Sînor!.. Di sînga axê de xencereke zingarî, qada mirinê!..

Carinan ji bo ferdekî çayê û carinan jî ji bo xatirê çend kullekan, lingên gellek lawên bavan bi dengê ku tarîtiya şevê qelaştibû, firiyabûn. Lê di pêwendiyên wan û sînori de, mîna qaçaxçiyên ne çay û pelên çixara li bakur dihatin firotin û ne jî pez derbasî bîna xetê dibû.

Wê şevê dê tava heyvê tunebûya. Ji xwe, mirov nikarîbû her dema ku bixwesta li sînori bixista. Ji bo derbasbûnê diviyabû ya heyv zû biçuya ava, yan derengê şevê hilata ya jî li ber destê sibehê derketa. Ger heyv zû biçuya ava, mirovî diviyabû piştî wê, di sînori re derbas bûbûya. Ger heyv derengê şevê, an jî li ber destê sibehê derketa, mirovî diviyabû beriya ku heyv hilata li sînori bixista. Wê gavê gellek kes jî xefika tava heyvê dûr û di tarîtiya şevê de derbasî aliyê din î sînori dibûn.

Wê carê jî beriya ku heyvê rohiya xwe bida hedefên li axa mayinkirî, diviyabû reşahî bihata bikaranîn. Wê şevê jî beriya ku xezeba mirinê berê xwe bida wan, diviyabû kozikên vedayî û funyeyên li hemana bûn, li dû xwe bihiştana.

Meha Sibate bû.

Wê çar heval bi alîkariya rêberekî di sînori re derbas bûbû-

na. Diviyabû hertişt pîrr bi dizî bihata girtin. Ji ber vê, şeva beriya wê, bi alîkarî û çavnêriya du hevalan, xwestibû bê mala bavê xwe. Mala ku wî cara dawiyê, sal û nivek berê dîtibû. Ji bo wê, li benda qutbûna cereyanê rawestiyabû.

Cereyana bajêr carinan çend deqîqeyan, carinan rojê çend saetan û carinan jî heta serê sibehê qut dibû. Wê gavê, lampeyên kolanan ên ku ji ber voltaja kêr bi rohnîyeke qels û lertzokî ve di ber xwe de didan jî vedimirîn û tarîtiyê xwe bi temamî bera ser bajêr dida. Di saetên weha de, ji bo çûyin û hatina wî, firse teke pîrr baş peyda dibû.

Wî wê rojê jî xwe dabû benda vemirandina lampeyan û gava rohnîya ku ji xwe li hemana bû, kolan bi temamî bi destê tarîtiyê ve berdabû, sê kes ji xaniyekî derketibûn û xwe sipartibûn kolanên tarî.

Li ser cadeyê, tirumbêleke leşkeran bi dengê xwe yê nas, heybet û tîrs li taxê belav kiribû. Di bajarê bêdeng de, taxeke bêdeng. Taxeke kerr û lal... Ne xircira du cîranan, ne xelkên diçûn mêvantiyê, ne dengê leyiztika zarokan û ne jî tu evîndarên di quncikeke kolana xur û xalî de, firseta hevdu-dîtîne bi kar dianîn...

Bi tedbîr lezandibûn. Karê cereyanê diyar nedibû; dikaribû heta sibehê jî nehata û ji nişka ve jî bihata. Ji ber vê yekê, tu kesî pê nizanîbû, bê dê kengî çi biqewimiya. Diviyabû rohnîyê ew di kolanan de zevt nekiriba. Li kesekî nas rast-hatin, dê talûkeya girtîne zêdetir kiriba.

Piştî ku dengê zîla deriyê mala ku bi heyecan û tîrs li benda hêviyekê bû, hatibû bihîstin, kilîta derî du caran ber bi aliyê çepê ve hatibû zîvirandin û ew dilê bi hesretê ve mişt bû, ketibû hundur.

Di serê wî re hezar pîrs derbas bûbûn. Gelo di malê de çi

guhertin çêbûbû? Gelo liberketinê çiqas tesîr li dê û bavê wî kiribû? Nuha zarok jî mezin bûbûn... Cîran, kolan, hewş, hertişt... Belê, bi hesreta hertiştî ve dikeliya.

Bavê wî por, rîh û simbêl bi tamamî sipî kiribûn. Berê jî di nav porê wî de, çend tayên sipî xuya dibûn, lê piştî sal û nîvekê, çav bi hesreta tayên reş mabûn. Bejna wî ya dirêj nema dihat ferqkirin. Ancax bi alîkariya gopêl li ser lingan di-sekinî. Piştî wî bê hawe xûz bûbû. Ew zilamê ku sal û nîveke berê, wek çiyayekî bû, li ber çavên wî çiqas hûr bûbû.

Gava çav li rewşa bavê xwe ketibû, weha fikirîbû:

– Heyhat! Ka ew zilamê ku di her nerîneke wî de jiyana difûriya? Mirov di wexteke weha kin de çawa dikare ewqas bikeve?

Liberketinê bavê wî ji halekî xistibû halekî din. Bavê wî ewqas hatibû guhertin, ger ew li deverêke din lê rast hatibûya, belkî wî dê bavê xwe qet nas nekiriba jî.

Diya wî kitana xwe dabû ber devê xwe û gotibû qey xewn bû, bihezkin û hesreteke kûr, ziq lê nihêribû. Bi tenê lê nihêribû û qet tu tişt negotibû. Tew dikira xwarina ku çêkiribû jî ji bîr kiriba. Bi zorê û bi berger, çend parî xistibûn devê wî û dû re hinek qeliya ku jê re hilanîbû, xistibû kîsekî naylon û dabû wî. Wî kiribû û nekiribû, nikarîbû diya xwe îqna bikira û di dawiyê de jî bi ya wê kiribû. Diya wî ji nişka ve gotibû:

– Wî rebenê, min dikira pêlava te ji bîr bikira.

Û xar biribû qutiya ku pêlav tê de bû.

Bavê wî û diya wî, ji bo ku ew zêde li ber nekeve, giriyan xwe di qirika xwe de hiştibûn. Herdu mîna bombeyên ku pîmên wan hatibûn kişandin, bê çawa gava dest lê bihata sistkirin, dê bigotana “gurm” û biteqiyana, weha tije bû-

bûn. Herkesî baş dizanîbû ku gava lêwik paşê xwe bida wan, wê hêsir wek baranê bibarandana.

Wî hem ji bo tedbîrê û hem jî ji ber ku rewşa wan fahm kiribû, ziyareta xwe dirêj nekiribû. Xatir ji dê bavê xwe û xwişk û birayên ku bi situxwarî û bi çavên xemgîn, lê nihêribûn, xwestibû û dîsa bi alîkariya herdu hevalên xwe ve, di tarîtiya şevê de wenda bûbû. Gava derketibû, bi tenê dengê diya xwe bihîstibû:

– Bila çavên mahkûmiyê birijin û çavên xeribîyê jî pê re, lawo... Lawo, xerîbo lawo....

Bi ku de diçû, dê li ku raketa?

Dê û bavê qet pê nizanîbûn û ne wî, ne jî hevalên wî, di vî warî de ji wan re, tu carî tu tişt nedigotin. Ji xwe dê û bavê wî jî piştî ku çend caran pirsîbûn û pirsên wan yên di vî warî de, bê bersiv mabûn, rewş fahm kiribûn û êdî qet neina pirsîbûn.

Wî û hevalên xwe, ewleyî di ser hertiştî re digirtin. Ji ber ku ev prensîp bi kêrî paraztina lawê wan dihat, dê û bavê wî jî nexwestibûn ji dervayî vê prensîpê hereket bikin. Ji bo paraztina wî, tev zarokên biçûk, hemû malbat her yek bi awayekî polîtîze bûbûn. Mahkûmiyê ew fêrî gellek tiştan kiribûn.

Serê sibehê hevalê wan ê ku dê ew teslîmî rêberê wan bikiira bi erebeya şifêrekî pêbawer, li ber deriyê mala ku ew lê dima, sekinîbû. Şifêr ji erebeyê daneketibû, bi tenê hevalê wî peya bûbû û sê caran li ser hevdu û carekê jî bi tenê, yanî çar caran li derî xistibû. Ev nîşana wan bû. Wî diviyabû li hember hemû lêdanên ji dervayî vî awayî, ji aliyê hundur ve, tedbîra xwe stendibûya.

Wî di hersê rojên dawiyê de, xwe li mala keça xalê xwe



veşartibû. Hem wê û hem jî rebenê mêrê wê pirr dixwestin, lê bi xwedî derkevin, lê ji destê mîrata tirsê de ne di tu halî de bûn. Malxwêyê malê çend caran bi qêrîn ji xew şiyar bûbû û dû re ji jina xwe re behsa xewna xwe ya xerab kiribû. Ew di wan xewnan de, gellek caran hatibû girtin û bi lêdana polîsan ji xew çeng bûbû. Keça xalê wî di nav henekan re, behsa xewnên mêrê xwe kiribû. Wî bi rewşa wan dizanîbû û ji ber vê yekê, dilê wî qet ji wan nedima.

Piştî ku hevalê wî bi awayekî rast û li gor parola wan li derî xistibû, xwediyê malê, keça xalê wî, xar biribû derî û hevalê wî derbasî hundur kiribû. Ji xwe, ew hazir bû. Ji ber heyecana rê, di taştê de qîma xwe bi qedeheke şîr bi tenê anîbû. Qatek kincê lacîwerd û krawateke reş î pitik pitikî li ser qutikekî sipî, li xwe kiribû. Pêlava diyariya diya xwe jî hîn nuh dixist pê. Hew diviyabû ji xwediyê malê, ji wan kesên ku xwe bi gellek awayan avêtibûn nava talûkeyê, xatir bixwesta. Li gel alavên wî yên şexsî û nemaze teyrê baz, ji bo gellek dostên xwe yên binya xetê jî diyarî kirîbûn. Vê ji barê wî pirr giran kiribû.

Piştî xatir xwestinê, berê keça xalê wî derketibû derve, alavên wî xistibûn bagaja erebeyê û li dora xwe nihêrîbû, gava tu talûke nedîtibû, hatibû hindurê hewşê û ji wan re gotibû:

– Rêya we vekirîbe.

Gava ku herdu heval derketibûn, ew li pê wan derneketibû. Deriyê hewşê girtibû û hatibû hundurê xênî. Lê xanî pirr vala hatibû hiskirin. Di hundurê xênî de, çûbû û hatibû. Rûniştin lê tunebû. Dilê wê kiribû tepûrep. Ji nişka ve berê xwe dabû deriyê hewşê û cara taliyê li wan nihêrîbû.

Herduyan bi lez xwe avêtibûn erebeyê û berê xwe dabûn

taxa bakur a bajêr. Li wira jî du hevalên ku diviyabû hevaltiya wan bikira hebûn. Rêyek di navbera qereqola polîsan û ya cendirmeyan re derbas dibû. Rêya herî nêzîk ev bû, lê ew rê çî qas nêzîk bûya jî kesên wek wan tu carî newêrîbûn di wir re derbas bûbûna. Rêyek bi kêmanî du caran ji wê rêyê dirêjtir ku li dora bajêr pirr dizîvirî hebû. Ew rê dirêj bû, lê talûkeya wê, pirr kêmbû. Wan ew rê gellek caran bi kar anîbû. Wê carê jî ew rê hîlbijartibû û berê xwe dabûn taxa ku hevalê wan lê bû.

Li wira teyrêkî wan î baz jî hebû. Li gor agahdariya ku hatibû, teyrê baz li ba Ereban pirr pere dikir. Ji ber vê yekê, hevalên wan ji bo peydakirina îmkanên aboriyê, temiya teyrêkî baz jî li wan kiribû. Teyrê wan ê ku du meh berê hatibû şandin, celebekî qertela derketibû û piştî mesrefeke mezin, ew li hember Ereban rûsar derxistibûn. Ji ber vê yekê, ji bo îspatkirina bazbûn an nebazbûna vî teyrî, ew nîşanî gellek kesan dabû.

Piştî ku herdu hevalên wan jî li erebeyê siwar bûbûn, ji bo ku Azad jî bi xwe re bibirana, berê xwe dabûn bajarê Azadî.

Gava leşkeran dest danîbû ser îqtîdarê wek noka li kevir, her yek ber bi deverekê ve pengizîbû. Azadî jî xwe ji mecbûrî dabû alî. Gotina "xwe dabû alî" aîdî Azadî ye. Piştî Duwanzdehê Îlonê, gava bi hevalên xwe re, xwe ji ber leşker û polîsan vedişartin, henek dikir û digot:

– Me xwe daye alî, lê yên ji dervayî me, reviyane.

Li gor wî, ger Azadî xwe dabe alî, ya jî reviyabe, netîce nehatibû guhertin; warekî terkkirî, jineke situxwar û keçeke sê salî li dû xwe hiştibû.

Azadî beriya derbasbûnê bi çar rojan, ji bo dîtina pîreka

xwe û keça xwe, ji ba wan dabû rê û bi şev, li deriyê malê xistibû. Jinik berê tirsiyabû û nexwestibû derî lê veke, lê piştî ku serê xwe di ser hewşê re dirêj kiribû, derî bi lez vekiribû. Bêyî ku tu tiştî ji hevdu re bibêjin, çend deqîqeyan weha şaşmayî li hevdu nihêribû û piştî ku kûrînî bi jinikê ketibû, xwe avêtibû himbêza hevdu.

Wexta vegeerê hatibû. Azad ji bo çûyinê li benda hevalên xwe bû. Erebe ketibû nav bajêr û berê xwe dabû taxa Azadî. Lê çi tax, çi rê... De were, vêca vê erebeyê ji vê heriyê derxîne. Çare tunebû. Diviyabû ji dervayî şifêr, hemû daketana û erebe dahf bidana. Di dahfdanê de tekerê dawîyê badanaj kiribû û qatê kincê lacîwerd, di heriyê de hiştibû. Hevalên din pirr pê keniyabûn û gotibûn:

– Mirov divê qey tu dê biçî dawetê.

Lê piştî ku wan fahm kiribû ku ew gellek aciz bûye, heneken xwe dirêj nekiribûn. Piştî deh deqîqeyan, erebe ji heriyê hatibû derxistin, lê problemeke wan î din xuya bûbû. Hevalê ku xwedêgiravî mala Azadî nas dikir, gotibû:

– Rast e, ez mala wî nas dikim, lê ez tu carî bi erebeyê nehatime mala wî. Ji ber vê, divê ez peya bimeşim û hun jî bi erebeyê bidin dû min.

Erebe li dû hevalî û heval jî kolan bi kolan, li mala Azadî geriyabû. Gava wan ji Azadî re rewşa xwe gotibûn, ji ken, hêsiran xwe di çavên Azadî re avêtibû.

Herçar hevalên ku dê derbasî aliyê din î sînor bûbûna, amade bûn. Hevalê wan ê ku karê sînorî organize dikir, ji bo derbasbûnê, ji wan re rêberek pêyda kiribû. Wan û rêberê xwe, dê li ba restoranteke li ber rê, hevdu bidîtana. Gava gîhaştibûn cîhê jivanê, mîla saetê ya kin li ser şeşan û ya dirêj jî li ser duwanzdehan bû. Şifêr û hevalê ku ew û rêber gî-

handibûn hevdu, xatir ji wan xwestibûn û di cîh de vegeriyabûn.

Rêber erebeyeke nas kirê kiribû. Ew û rêberê xwe, li wê erebeyê siwar bûbûn û berê xwe dabûn aliyê rojhilat. Piştî ajotina ku li gor texmîna wî, bi qasî sî-çil kîlometreyan bû, ji erebeyê peya bûbûn û berê xwe dabûn gundekî.

Gund li ser gîrekî hatibû avakirin. Beriya ku tariyê xwe bera erdê dabûya, ji jêr pîrr baş hatibû xuyakirin. Li dorhêlê, gundên din jî hebûn, lê tu gundan, bi qasî wî gundî baş xuya nekiribû. Nemaze, odeya bilind ya li pêşiya gund ku der û dora pencereya wê ya sipî, li berriyê dinihêrî, mîna golikê beş, ew gund ji hemû gundên din, vediqetand.

Dinya êdî baş tarî bûbû. Rêberê wan ji bo sîlehanînê, ew li wira hiştibûn û çûbû gundî. Rêberê wan gellek daran di sînorî re derbas bûbû. Sînor ji xwe re kiribû kar. Lê her cara ku rêberî nêzîkî li sînorî dikir, dibû şexsekî din. Hertim hiseke poşmaniyê pê re peyda dibû. Pîrr ditirsiya. Lê ya ecêb ev bû ku nikarîbû dev jê berda. Xuyabû ku ger îmkan hebûya ew ê tu carî nehatibûya ber sînorî. Ev dudiliya wî li ba gellek kesên ku hatibûn derbaskirin, bûbû sedema bêbaweriyekê.

Bayekî sar ew ricifandibûn. Ew hem li gor talîmata rêber û hem jî ji tîrsa, qet tev neliviyabûn. Saet bûbû dehê şevê, lê rêberê wan hîn ji gundî nehatibû. Ew jî li wê çolê, li erdekî nenas, ketibûn nav taswasan. Şika ku belkî rêberê wan, li cîhê wan digere, lê ji ber tarîbûna şevê, wan nabîne, kiribûn. Ji ber vê yekê, ji bo îşaretdayînê, dest bi livandinê kiribûn; her yekî ji wan, berê xwe bi texma gundî vekiribû û bi dorê, li ser hevdu heyşt çixare kişandibûn.

Zikê birçî, şeva reş, bayê sar, di cîhê xwe de rawestin û di

ser de jî heyşt çixareyên ji mecbûriyetê, serê herçar hevalan, lê ji hersêyên din bêtir jî serê wî gêj kiribûn. Wî carekê pêlav xwe ji pê kiribû, lê ji ber werimandina lingên xwe, ancax bi alîkariya hevalên xwe, dîsa xistibû pê.

Ew bi halê xwe biliyabû û nexwestibû tu kes jî pê bihese. Ji ber ku tecrubeyên wî nîşan dabûn ku li ber sînori, gazinek dikarîbû bihata mahneya tirsê. Wê gavê nehatibûya gotin jî kengî hevaltiya wan xera bûbûya, dê bihata rojevê. Gellek numûneyên di vî warî de hebûn. Wî ev dizanîbû û tev hemû tiştî, diviyabû îdare bikira. Beriya hatina rêberî, yê ku carekê nemîztibû nemabû.

Piştî şilbûneke baş, rêberê wan xuya bûbû û ji bo pêşî li gazinan bigre, gotibû:

– Pirr dereng bû. Ger hûn bi ya min bikin, em îro neçin. Em dikarin li gund razên û sibehê êvarî bên ser sînori û derbas bibin.

Herçaran şewra xwe kiribû yek û bêyî ku tu gazinan bikin, gotibû:

–Em dixwazin îşev biçin. Ger tu neyê jî em ê bi tena serê xwe, li sînori bixin û derbas bibin, lê divê tu bizanibî ku em ê vê kirina te bighînin deverên elaqadar.

Biryar hatibû dayin.

Herçaran rahiştibû barên xwe û dabû dû rêberî. Di rê re çûyin qedexa bû. Mirovî diviyabû bida nava erdan. Piştî baranê jî meşa li ser erdê cotkirî, gellek zehmet bû. Gava gavên xwe avêtibûn du–sê kîlo herî jî pê re bilind bûbû. Carinan jî lingên wan di heriyê de çikiyayî mabûn û ji bo ji erdê rakirinê, bi destên xwe ve alîkariya lingên xwe kiribûn. Serma, xwêdan, betilbûn, birçîbûn û tesîra çixareyên ji bo îşaretdayinê, ew ji halekî xistibû halekî din. Ew ne bes bûn, bi

ser de jî barekî giran li pişta wî bû.

Nêzîkî li sînori kiribûn. Hasasiyeta wan, di di dereceya xwe ya herî bilind de bû. Her ji sed metreyî kozikek hebû. Diviyabû ku mirov ji dervayî kozikan teqwîyeyên ku bi şev dihatin danîn jî bihesibanda.

Rêberî ew li nav erd, bi awayê li ser dev veketî rawestan-  
dibûn û ji wan re gotibû:

– Hûn li vira rûnin, ez ê cîhê kozikên leşkeran tesbît bi-  
kim.

Diviyabû ku mirov bi kêmanî cîhê du kozikan baş diyar kiribûna û dû re di navbera herdu kozikan re li sînori xisti-  
bûya. Ew jî dihat wê mahneyê ku mesafeyeke bi qasî pêncî metreyî diket navbera mirovî û leşkeran. Mesafeyeke bi qasî pêncî metreyî û devê tivinga sar... Şaşiyeke bi tenê, îmkanê ku mirov dîsa bikaribûya şaşiyeke bike, ji ortê radikir. Mirinê he-  
nek nas nedikir û li hêsiyên çavên tu diyan jî nedinihêrî.

Mîlên saetê li ser dudu û nîva bûn. Panzerê bi projekto-  
rê ve, dora xwe rohnî dikir. Panzer di rê re dimeşiya û bi projektorê, li hedefê digeriya. Hêdî hêdî nêzîkî li wan jî kiri-  
bû. Rohniya projektorê di ser wan re jî derbas bûbû. Wê ga-  
vê tirsê wan gîhaştibû bandevê. Yek ji wan cara yekem di sî-  
noran re derbas dibû. Gava siya rohniya projektorê di ser wî re derbas bûbû, ketibû heyecanê, xwe avêtibû erdê û go-  
tibû:

– Haho, em dîtin!

Lawik hingî pirr lerizîbû, lerizandina wî tev tarîtiya şevê jî hatibû dîtin. Lawik bi yekcarî ketibû tev. Tu ferqa wî û sipi-  
ya firkandî nemabû.

Rêber û Azadî bi rewşa wî dizanîbû, ji ber vê yekê, ji nişka ve xar biribûnê û gotibûn:

– Hişşş kuro! Ma qey tu dixwazî ku ew bi me bihesin? Netirse, ew me nabînin. Bi tenê siya rohniyê di ser me re derbas bû.

Meraq û tirs ketibû nav hevdu. Şiyana konsantrasyonê hemû hêza xwe seferber kiribû. Pêvajoya bîhnstendin û bîhndayînê pirr bi lez meşiyabû. Bîhn, hingî ewqas bi lez hatibû dayin û stendin, nêzîkî xeta bîhnçikînê bûbû. Kuxikeke zuha ew hemû dabûn ber xwe. Kuxika zuha, xwestibû xwe mîna sinyala dereceya heyecan, tirs û taswasê, bide der. Lê kuxik û her awayê dengkirinê, qedexe bû. Destên xwe dabûn ser devên xwe û di xwe de kuxiyabûn. Wan gotibû qey, di dinyayê de yên cara yekem di xwe de kuxiyabûn, ew bûn.

Ancax piştî çûna panzerê, hilma wan hebekî hatibû ber wan. Lê ew bi xwe, ji ber halê ku ketibûyê, nikarîbû li panzerê jî bifikirîya. Di nav re carinan hin pirs di serî wî de derbas bûbûn:

– Gelo tu teqwîyeyên din tunebûn? Wê vê carê şer derketa? Ger şer derketa wê çi bihata serê wan? Gelo di şer de, dê çend çira bihatana tefandin? Ew bi xwe an yekî din?..

Di herdu halan de jî fikirandin, pê pirr dijwar hatibû. Laşê wî bi tamamî ricifibû. Rewşa Ahmedê hevalê xwe yê ku du meh berê, ew ji sînor bi zorê gîhandibû nexweşxaneyê, bi bîr anîbû. Halê ku Ahmed ketibûyê û ew problemên fîzîkî yên ji ber vê birîndariyê peyda bûbûn, dê tesîra xwe li hemû pêşeroja wî bikira. Bi vê re tirs û taswasa wî bêtir bûbû.

Baranekê jî hûrik hûrik dest pê kiribû. Hemûyan mîna ku bibêjin “Ji xwe ev kêmbû” li hevdu nihêrîbû.

iş bêdeng rûniştibûn û li benda rêberê xwe bûn. Bi baranê re kêfa rêberî hatibû. Şopa wan dê bi vî awayî wenda bûbûya. Gava rêberê wan vegehiyabû, cîhê herdu leşkeran jî hati-

bû tesbâtîkirin. Rêber hêdîka rûniştibû, berê xwe bi bakur ve vekiribû û mîztibû. Dû re rêberî berê tivinga xwe dabû kozîka aliyê rastê û Azad jî li ser kozîka çepê rûniştibû. Gava leşker tev liviyabana, rêber û Azadî dê bi tivingên xwe ve, li ser wan girêdabûna. Kêfa wan hatibû û li gor talîmatên rêberî, dest bi meşê kiribû.

Halê wî her çûbû, xerabtir bûbû. Çavên wî hêdî hêdî hatibûn girtin, lê wî dîsa jî di ber xwe de dabû. Gava di navbera herdu leşkeran re derbas bûbûn, tirs û heyecan gîhaştibû dereceya xwe ya herî bilind. Herçar heval, li dû rêberêkî, daketibûn qada mirinê. Mirinê hergav dikarîbû destên xwe yê qirêj daniya ser devên wan. Nefesa mirinê, pîrr jî nêzîk ve hatibû his kirin. Xeta mirin û jiyanê jî hevdu vediqetand, pîrr zirav bûbû. Tirs û heyecan, bi mêrxasiyeke mirovî re derketibûn dereceya herî bilind.

Bi tirs li tirsê fikirîbû û di hundurê xwe de gotibû:

– Tirs... Hisa ku bi payîna talûkeyekê re, bi mirovî re peyda dibe...

Dû re, tev lî halê ku ketibûyê jî hebekî din li ser vê pîrsê hûr bûbû. Ev çi his bû ku tesîra xwe li ser hemû tevgerên mirovî dikir? Ev çi quwet bû ku laş diricifand, çav jî ber wê, li sitarekê digeriya? Wec zer dibû. Dev zuha dibû.

Mîna ku li bersivê geriyabû, jî nişka ve û bi meraq jî xwe pîrsîbû:

– Ma gelo di tu rewşên din de, lêdana dil ewqas bileztir dibû? Ma bîhn di tu halên din de, ewqas bi lez tê stendin û berdan?

Heta wê gavê jî di pirtûkan de, jî bo kesên di rewşa wan de bûn, weha xwendibû: “Yên ku tirs qet nas nedikirin”.

– Ev çi qas rast bû? Gelo wan bi rastî, tirs nas nedikirin?



Li benda bersivê nesekinîbû. Ji ber ku li wira rastî hatibû jiyîn. Çepera tirsê pêwîstî ji tu bersivan re nehiştibû.

Hebekî fikirîbû, “teslîmî tirsê nebûn”, hîn bêtir nêzîkî rasiyê xuya bûbû.

– Gelo di rewşa ku tirsê laş dabe ber xwe de, cîh ji mêrxasiyê re dima?

Bersiva vê pirsê bi pirseke din dabû.

– Ma di erdê mayinkirî re derbasbûn û rîska mirinê stendin, ne mêrxasî ye? Ma mêrxasî hîn dê çawa be?

Wê gavê bi hiseke ku ne bi tenê ji tirsê û ne bi tenê ji mêrxasiyê, lê ji hevdu rapêçandina herduyan pêkhatî hatibû dagirtin. Li ser mêrxasiyê û têkiliya wê ya ku bi tirsê re hebû, fikirîbû.

– Mêrxasî... bê tirs çûyîna ser talûkeyê.

Ma ya wan bê tirs bû? Li gor wî, ya wan ne mêrxasiyeke ku ji derveyî rastiya mirovî bû. Hiseke ku bi her awayî mirovî... Hiseke ne xur û xalî, hiseke mêrxasiyê ya ku ji aliyê tirsê ve rapêçayî.

Nefesa mirinê û tirsê ji ber wê; hêviyên bi jiyanê ve girêdayî û mêrxasiya ji bo pêkanîna van hêviyan laşek dabû ber xwe.

Di bin tehdîda nefesa mirinê de, dîsa li herdu hisên mirovî fikirîbû.

– Tirs û mêrxasî... Ger herdu bi hevdu re dikarîbû bihata-  
na jiyîn, gelo di rewşên weha de kîjan li pêş bû? Kîjan serdest bû?

Li gor wî, di wê rewşê de herdu ewqas tev li hevdu bûbûn ku ji hevduveqetandina wan, pîrr zehmet bû.

Wan herdu kozik bi selametî li paş xwe hiştibûn û dû re, di ser rêyekê re derbas bûbûn. Wê gavê, rêberê wan ê ku

wek pelê çilo lerizîbû bi heyecan gotibû:

– Ji bo Xwedê, bilezînin, wextî panzer bi paş de bê.

Piştî derbasbûnê, rêberê wan bi paş de vegeyabû û her çiqas baranê alîkariya veşartina şopa wan kiribû jî ji bo dilê xwe di cîh xe, bi destên xwe ve, qûma hûr ya li ser rê, rast kiribû.

Du kesan têl hêdî bilind kiribûn û yên din jî di bin re derbas bûbûn. Rêber li pêşiyê û ew jî li gor talîmatê, lingê xwe danîbûn dewsa lingê yê pêşiya xwe û bi vî awayî di rêya ku berê hatibû vekirin û ceribandin re meşiyabûn.

Gava nêzikî li têla ortê kiribûn, ji nişka ve berê bi dengê G–3–yekê û dû re bi dengên teqînên rawestî lê tunebûn, veciniqîbûn. Dilên wan ji tirsê wextî di devên wan re avêtîbûna. Berê rêza wan bi temamî kil bûbû û wan xwestibû ku xwe biavêjin erdê, lê gava li rêberî nihêribû, ew jî di cîhê xwe de rawestiyayî mabûn û li dengên sîlehan guhdarî kiribûn. Teqîn her çûbû gûrtir bûbû.

Panzêrekê berê projektorê dabû nava erd û hedef rohnî kiribû. Yekî jî bi sîleha ku li ser panzêrê girêdayî ve, li yên li nava erd bûn, reşandibû. Piştî çend deqîqeyan, projektor hatibû vemirandin û sîleha li ser panzêrê bêdeng mabû.

Rêberî xwe gîhandibû wan û bi dengê gellekî nizim gotibû:

– Xema nexwin, dûrî me nin. Ew û grûpeke din şerî dikin. Baş bû ku em ji panzêrê xelas bûn. Heta ew bi hevdu bibilîn, divê em derbas bibin. Bilezînin!

Di bin dengên çend teqînên bêhedef de, têla ortê jî hatibû bilindkirin. Piştî ku têla ortê li dû xwe hiştibû, rewşa wî xerabtir bûbû, lê bi zorê bûya jî xwe gîhandibû têla herî dawiyê.

Dengê rêberê ku têla dawiyê jî li dû xwe hiştibû, hatibû guhertin. Rêber wek mirovê ku beriya bîstikekê di bîreke bêbinî de bû û ji nû ve bi rûkala dinyayê ketibû, kêf kiribû. Piştî ku li ber têla dawiyê mîztibû jî tevgerên wî bi temamî normal bûbûn.

Piştî meşa bîstikekê, rêberê wan gotibû:

– Em nuha di nava axa rojhilatê başûr de ne, lê em hîn jî di hedefa tivingên leşkeran de ne. Ger leşker bi me bihesin, dikarin ji cîhên xwe jî bera me bidin. Ji ber vê yekê, divê hûn çend sed metreyên din jî îdare bikin.

Wî ancax, wê gavê fahm kiribû ku êdî sînor bi temamî hatibû derbaskirin. Bi awayekî ecêbmayî xwestibû li dû xwe binihêre, lê ji ber betilîbûnê, di xwe re nedîtibû û qîma xwe bi tenê bi çend pirsan anîbû.

– Gelo têl hebûn? Tew mayin? Ma mayin hebûn? Ma wan mayin kengî derbas kiribûn?

Ji xwe nehatibû bîra wî, bê wan têl û mayin kengî derbas kiribûn. Gelo ew di bin têlan re derbas bûbûn, an wan xwe di ser têlan re çeng kiribûn? Lê fikiribû, lê qet nehatibû bîra wî.

Halê wî êdî nema îdare bûbû. Birçîbûn, xew û betilbûnê ew teslîm stendibû. Çavên wî ji dervayî îrada wî, çûbûn ser hevdu. Çongên wî sist bûbûn. Lingên wî, ew nema hildigirtin û wî bêrikên xwe tije nok his kiribû. Gava destê xwe avêtibû bêrikên xwe û vala derketibû jî pirr şaş mabû. Ji nişka ve sifreyeke fireh ya li erdê raxistî hatibû ber çavên wî. Wê gavê li ber sifreyê rûniştibû û ji bo xwarinê destê xwe dirêjî mesefê kiribû, lê ew jî vala derketibû. Wî kiribû nekiribû, sifreya li erdê raxistî bi dest negirtibû. Li gor wî, xwedêgiravî du deqîqe berê, sifre li erdê raxistî bû; mesefeke bi-

rincê ku ser wê tije goşt û tirşika li ber, ew ber bi xwe ve kişandibû, lê hewildana wî ya ji bo îstîfadekirina ji na'metên vê sifrê, her vala derketibû.

Çavên wî careke din çûbûn ser hevdu, bîstikekê razayî meşiyabû. Ji nişka ve rawestiyabû û destên xwe xistibûn herdu bêrikên çakêtê xwe. Beriya ku wî destên xwe xistibûn bêrikên xwe, xwedêgiravî, herdu bêrikên wî jî ji noka mişt bûn. Wî bi vî awayî tibabekî di ber xwe de dabû.

Hevalên wî û rêber, bi qasî çend sed metreyan, jê bi dûr ketibûn. Ji nişka ve lê hay bûbûn û bi xar ber bi wî de baz dabûn. Gava wan rewşa wî fahm kiribûn, hem bi wî re xeyidî bûn û gotibûn:

– Em pê nizanin, bê tu dixwazî bi vê paya xwe, çi îsbat bikî?

Û hem jî li ber xwe ketibûn.

Du heval ketibûn bin milên wî û yên din jî barê wî hilgirtibûn. Lê wî dîsa jî xwe li sifreya ku xwedêgiravî li erdê raxistibû rakişandibû. Heta ku gîhaştibûn gund û rêberî li deriyê nasekî xwe xistibû, tu nemabû ji dest çûbaya. Rûyê wî zer û zuha bûbû. Gava xwediye malê piştî xêrhatinê, ji wan re gotibû:

– Gelî mêvanan, hûn ji rê tên û nuha birçî ne. Hebekî sebir bikin, xwarina we çêdibe.

Wî xwe negirtibû û avêtibû ortê û gotibû:

– Ez nikarim li benda çêkirinê rawestim, tu bi xêra xwe, ji min re, zû nanî bîne.

Gava ev gotin ji devê wî derketibû, ricifbû jî. Xwediye malê bi nerînên mîna ku bibêje; “Bavo, di sînor re derbasbûn, ne karê herkesî ye”, lê nihêribû. Lê wî ev fahm kiribû û ji ber vê yekê gotibû:

– Bavo heyran, tu ji min re nê n bîne û dû re tu çi difikirî, tu serbest î.

Mazûbanê wan ê ku li tevgerên wî ecêbmayî mabû, bi lez du nanên hilatî danîbûn ber wan. Wî di jiyana xwe de, tu carî nanê tisî nexwaribû, lê ew nanê hilatî yê mezin, bi tisî kiribû çend pariyan û dû re bi çavên ku ”çend nanên din jî bîne” li mazûbanê xwe nihêribû. Mêrik li gel nanin din, hinek dims jî peyda kiribû. Dims û nanê hilatî di hundurê çend deqîqeyan de, li ortê nemabû. Ew dû re, li benda xwarina li ser êgir nemabû û ji bo çend saetên xewê, çavên xwe dabûn ser hevdu. Ji xwe çavên wî, ji xweber çûbûn ser hevdu.

Gava ew rabûbû ser xwe, wî bi xwe serpêhatiya xwe, ji serî heta binî ji wan re gotibû. Hingî pirr keniyabûn, zikê hemûyan êşiyabû. Ji wê rojê û pê ve, her cara ku Azad wî dibîne, dibêje:

– Hela li bêrika xwe bigere, bê nok tê de tunene, lo.

Lê vê carê kul û derdan hişê Azadî nehiştibû. Tew ev mesele nema dihat bîra wî jî.

Azadî piştî hal û xatir pirsînê, got:

– Tu ji kê derê tê? Tu şil û pil bûyî, kuro. Çi bi te hatiye?

Wî jî li hember pirsên Azadî weha bersiv da:

– Qet nepirse, ez bi tava tirsonek hatim xapandin. Min digot, qey mirov dikare piştî xwe pê ve girê bide, lê li gor hêviyên ku jê dihat kirin, derneket. Gava wê çend çilapekên baranê dît, bi carekê ve, xwe da alî. Ji bo çi ez dibêjim, xwe da alî. Hema welleh, pirr êşkere bû ku reviya.

Li çavên Azadî nihêrî, fahm kir ku peyvên wî Azad îqna

nekiribû.

Azadî got:

– Ma ev karê çilapekan e, mal ava? Mirov divê qey hinekan tu di golê de dakiriyî.

Ew di hundurê xwe de, weha fikirî:

–Mirov nikare henekekê jî bike. Ev Azad jî divê illeh, mirovî li derewê biqelibîne. Tu divê qey kumê wî ji rastiyê qeti-yaye.

Dû re, wî ji Azadî re got:

– Xwedê jê razî, min xwest ku ez henekekê bi te bikim, na na, ma qey ez nizanîm bê ev ne karê çilapekan e. Tu nema ji henekan jî fahm dikî, lo.

Lêwik ziq li wî dinihêrî. Di çavên lêwik ên reş de, xemgîniyek dihat xwendin. Di rûyê wî de, tev hemû îmkanên vî welatî jî kêmaniyek dihat hiskirin. Mirovî digot qey ev kêmanî di rûyê wî de hatine kolandin û xuya bû ku wê şopa vê kêmaniyê, di hemû pêvajoya mezinbûna wî de, tesîra xwe nîşan bida. Belkî jî lêwik bîra tu tiştî nedibir, lê gava wî bi dilovanî li çavên lêwik nihêrî, ev bi xwe his kiribû.

Azad beriya nuha bi bîst salan, zewicî bû. Zewacek di bin tesîra adetên civakê de... Şertên wê demê û sewiyeya têgihîştina malbatan, bi alîkariya temenê wan î biçûk ve, hema mirov dikare bibêje ku ji dervayî îrada wan, ew ber bi pêvajoyeke nuh dahf dabûn. Fatûra wê biryarê, nuha ji aliyê herduyan ve bi tibabeke mezin û bi birînên kûr ve tê dayin. Gelo guneh ê kê bû? Gelo divê pêvajoya zewicîmayînê, hersê zarokên wan û fedakariya bi salan, çawa bihata nirxandin û roleke çawa bileyizta?

Azad piştî ku nozdeh salan zewicî mabû, li gor ku jê dihat fahmkirin, li dû azadiya kesî geriyabû û saleke berê, ga-

va hîn keça wan Dîlberê sal û nîva xwe baş tije nekiribû, jina xwe berdabû. Bi vî awayî, xwedêgiravî xwe ji hemû berpirsiyariyên xwe yên di vî warî de hebûn, rizgar kiribû. Di destpêkê de, wek ku barekî giran ji ser milên xwe avêtibe, xwe pirr rehet his kiribû. Lê di hundurê wextê de, hinek hesabên wî li hevdu derneketibûn.

Gava Azad ji welêt derketibû, jina wî, Zîna ku bi qasî du salan ji Azadî biçûktir ku panzdehsalî zewicîbû û di şanzdehsaliya xwe de bûbû dê, hîn nozdeh salên xwe bi zorê qedandibû. Ji xwe heta wê çaxê, ancax çar salan li ba hevdu mabûn. Ruyê Zînê yê girover î gewr î boz ku tev çavên reş î gir ên kilkirî ew pirr şêrîn rê dida, di keçikaniya wê de bala gellek xortan kişandibû. Bêvila wê ya ku mirovî digot, ji bo ruyekî weha nayê peydakirin, lêvên wê yên tenik, du diranên wê yên ku li ser kara wê hatibûn zêrkin, bejna wê ya zirav û guliyên ku xwe bera ser kulêmekan didan, hîn wê gavê bûbûn mijara sohbetên gellek xortên ku ji derveyî zewacê tu rêyên din ên ku wan bikarîbûna xwe pê nêzîkî cînsên din bikirana, tunebûn.

Zîna ku heta sinifa pêncan xwendibû, di pêvajoya zewaca xwe de, ji derveyî xweşikbûna xwe ya ku ketibû bin kitanê, nîşan dabû ku ew di eynî wextê de jina mala ye jî. Di mala xwe de pirr çav fireh bû. Wê dikarîbû hemû tiştên xweşik ji bo mêvana daniya û hertiştê xweş jî li ber wan bikira. Ji bo mazûbaniya wê bê qusûr be, çi ji destên wê dihat, teqîr nedikir.

Li Swêdê piştî du mehan, kitan ji serê xwe avêtibû. Berê bi xavikekê îdare kiribû, lê piştî sawa xwe stendibû, êdî hewce nedîtibû ku porê xwe binixumîne. Lê gava li belediyeyê bi cîh bûn, heta ku Azadî kirasên zêrîn ên li ser diranên wê pê

dan avêtin, çavên wî dikira birijiyana.

Gava piştî şeş salan bi porê xwe yê kurtjêkirî û etekê ku bi qasî du tiliyan dadiket biniya çongê ji bo ziyareta malbata xwe vegeyabû welêt, bavê wê ew bi zorê nas kiribû.

Gava Azadî ji mecbûrî ew bi tenê hiştibû, wê gavê keçeke wan a sêsalî hebû; Beybûn. Li Swêdê jî keç û kurekî wan çêbûbû. Keçika wî ya herî mezin nuha ketibû nozdehsaliya xwe. Kurê wî Arjen çar salî bû û temenê keçika wî ya biçûk Dîlberê jî du sal û nîv bû. Piştî berdanê, dadgehê welayeta zarokan dabû diya wan. Ji xwe Azadî vêya ji xwedê dixwest. Li gor biryara dadgehê, Azadî ancax dikarîbû her ji du hefteyan carekê, mafê xwe yê hevdudîtîne bi kar bianiya. Lê Azadî gellek caran herdu bi hevdu re dibirin ba xwe. Carinan jî gava destê Dîlberê ji diya wê nedibû, Azadî ew li ba diya wê dihişt û Arjen ji bo du rojan dibir ba xwe. Piştî panzdeh rojên din dîsa dihat zarok dibirin ba xwe. Heta ku temenê zarokan bibe hijdeh, ev ê her weha dewam bike. Jinikê jî di vî warê de, zêde zehmetî dernedixist.

Piştî ku Azad ji mal derketibû, rewşa maddî ya malbatê bi qasî ku jinik jê ditirsiya, xerab nebû. Jinikê ji derveyî alîkariya zarokan a ku her bîst û heftê mehê ji terefê kasaya sîgorteyê dihat şandin, ji Azadî jî nefeqe werdigirt. Û ji derdê mesrefa Azadî jî xelas bûbû. Vê bi xwe jî îmkanên ku malbat bikaribe pera bide ser hevdu, zêdetir kiribû.

Azadî vê carê Arjen anîbû ba xwe û Dîlber li ba diya wê hiştibû. Pêwendiyên wî û keça wî ya mezin piştî ku Azadî jina xwe berdabû, baştir nebûbû. Keçik yek ji wan ên ku fatûreyeke pîrr giran a vê lihevdunekirina Azadî û Zînê didan, bû. Van rojên dawiyê, vê fatûreyê xwe bi awayekî hîn girantir nîşan dabû.



Azad û pîreka xwe, li welêt çar salan zewicî mabûn, lê ji ber karên Azad ên siyasî, bi hevdu re zêde nejiyabûn. Dû re Azad bi qasî şeş salan jî li rojhilata navîn mabû. Pîreka wî di vê pêvajoyê de, bi sebir li benda wî mabû. Ger mirov bibêje, Azad û pîreka xwe, li vira dest bi hevdu re jiyane kiribûn, dê ne şaş be.

Pêvajoya jiyana kampê, bi qasî sal û nêvekê ajotibû. Di vê pêvajoyê de, li benda destûra rûniştinê mayîn û piştî wê jî problema li belediyeyekê bi cîhbûyînê û gellek problemên din, asabên wan tev li hevdu kiribûn. Piştî ku li belediyeyekê bi cîh bûbûn, herduyan jî helwesta alîkariya hevdukirinê û di jiyane de hevdu temamkirinê dabûn aliyekî û ji berdêla wê, tiştên ku ji destên wan dihatin li hember hevdu bi kar anîbûn û ji bo ku bikaribûna karakterê hevdu biguherînin ketibûn nav hewildanên mezin. Herduyan wek du raqîbên ku qet nikaribin li hevdu bikin, di ber hevdu de dabûn. Yekî bigota heft ya din digot heyst. Bi vî awayî dinya li hevdu teng kiribû. Ji ber hevdu gellek kişandibûn.

Şerrê wan berê, di navbera wan de mabû. Kes pê nehisiyabû. Lê piştî demekê, wan êdî nema dikaribûn bi metodên xwe, pirsên xwe çareser bikin. Ji ber vê yekê, gava hîn Dîlberê sala xwe neqedandibû, mecbûr mabûn ku ji hevalên xwe alîkariyê bixwazin. Bi vê munasebetê, ji bo çareserkirinê, gellek dostên wan ketibûn nav meseleyê. Daîreya karûbarên civakî tev hemû îmkân, tecrube û zanebûna xwe jî di warê çareserkirina pirsê wan î malbatî de, bê çare mabû.

Gava alîkarî hatibû xwestin, yek ji wan ên ku xwe dabû ber û ji bo çareserkirina vê meseleyê gellek xebitîbû jî ew bû. Di wê pêvajoyê de gellek tiştên ku berê qet pê nehisiyabû, bihîstibû. Ji bo têgihîştina rastiyê, agahdariyên ku ji

Azad û Zînê hatibûn wergirtin, dabûn ser hevdu.

Ji agahdariyan jî weha xuya bûbû ku herduyan jî beriya hevduberdanê, bi danûstendinên xwe û bi helwestên xwe, gellek tişt li ber çavên hevdu reş kiribûn. Gava li ba hevdu diman, herduyan jî dinya li xwe pirr teng his dikir. Jinik di rewşên weha de nikarîbû ji mal biçûya, lê Azadî xwe bi lez diavêt kolanê û berê xwe dida îstasyona trêne. Ji xwe, Azadî bi xwe jî gellek caran gava hevalên wî yên ku xwestibûn ji bo çûyîna malê şîretan lê bikin, ji wan re weha gotibû:

– Mal êdî mîna dojhê ye. Vê jînikê mala min li ber çavên min reş kiriye.

Azad beriya hevduberdanê, ji ber pêwendiyên xwe yên taybetî jî li hember malbata xwe ketibû rewşeke pirr xerab. Wî ji bo veşartina hinek pêwendiyên jî jîna xwe gellek caran xapandibû, lê şensa Azadî, hertim baş nemeşiyabû. Azad şevê, heta destê sibehê nehatibû malê. Jîna wî her ji çend deqîqeyan carekê çûbû ba pencereyê û ji zarokên xwe re gotibû:

– Bavê we nehat şîvê û saet bû dehe şevê jî hîn tu xeber jê tune.

Zarok razabûn, lê xew li jînikê tunebû. Heta trêna dawî jî şiyar mabû, lê Azadê me, xwedê bide. Gava jînikê destê xwe ji hatina wî şuştibû, dest bi razanê kiribû.

Azad roja din hatibû malê û jîna xwe re weha gotibû:

– Civîna me heta derengê şevê ajot. Ahmed jî ji bo mayîne pirr îsrar kir û hema min jî ew neşikenand û ez li wira, li ba wî razam.

Jînikê Ahmedê ku ji bajarê wan bû, hîn ji salên heftêyî û vir de nas dikir. Ahmed jî yek ji wan ên ku xwestibûn pirsar wan bi awayekî çareser bikin da ku herdu bikaribin dîsa li

hevdu rûnin. Wê dizanîbû ku Azad telefonê nede malê jî Ahmed dê ji bo ku taswas bi Zînê re çênebûya û Zînê şika hin tiştên din nekiriba, bi awakî hayê wê jê çêkiriba. Ji ber vê yekê, wê li peyvên wî guhdarî kiribû, lê xuya bû ku çavên wî ne bi lêvên wî re bûn û dixwestin tiştên pîrr cuda bibêjin. Ji xwe, rastiya vê bûyerê, di demeke kin de, gava Ahmed ji bo şîvê hatibû mala wan, derketibû ortê.

Ahmedî piştî şîvê, dest bi serpêhatiyên xwe yên Yûnanîstanê kiribû. Ahmed dest bi serpêhatiyên xwe kiribû, lê Zînê bûbû, wek ku mirov kûzeke ava sar, bi ser wê de dakiribe. Gava Zînê xwe ji vê şokê xelas kiribû û ji Ahmedî pirsîbû:

– Ahmed tu kengî çûbûyî Yûnanîstanê?

Dilê Azadî kiribû tep û rep. Dilê wî hingî weha lêxistibû, Azad ji ber tîrsa ku dengê lêdana dilê wî dikarîbû, ji aliye yên li dora wî bûn jî bihata bihîstin, pîrr li ber xwe ketibû. Bersiva Ahmedî jî nik lêrizandibû û jînikê bi awayekî bi qerf ji Ahmed re weha gotibû:

– Min digot qey civîna we hebû.

Azad nema wêrîbû li çavên jînikê binihêriya. Hema serê xwe bera ber xwe dabû û dengê xwe nekiribû. Hew carekê bi tenê, serê xwe bilind kiribû û mîna ku bibêje; “Lawo, ma Ahmed nuha wexta serpêhatiyên te yên Yûnanîstanê bû?” li çavên Ahmedî nihêrîbû. Lê ji ber seqetiya Ahmedî devê wî li ber Ahmedî nedigeriya û tu carî nikarîbû pê re bixeyidiya. Ahmedî jî rewş fahm kiribû, lê wê gavê, hertişt qediyabû û pînekirinê jî nema feyde dikir.

Carekê jî jînikeke Swêdî saet di yanzdehê şevê de telefonî Azadî kiribû û wî jî kincên xwe li xwe kiribûn û çûbû. Gava jîna wî jê pirsîbû:

–Tu dê biçî ku?

Wî weha bersiv dabû:

– Ev hevala min a sinifê ye. Em bi hevdu re diçin Dibistana xwendin xwehînkirina salmezinan a belediyeyê. Dolaba rebenê ya qeşayê xera bûye. Ew ji dervayî min, tu kesî din nas nake û ji bêçaretiyê li min geriyaye. Na na, di vê saetê de, kî telefonî kê dike? Û ya din jî çi bi vê heye?

Jinik lê ecêbmayî mabû û wê baş dizanîbû ku Azad ne ji ta'mîra dolaba qeşayê û ne jî ji ya tu tiştên din fahm dikir. Jinikê di ber xwe de weha gotibû:

– Ev jî dereweke nuh e, bê hela ka li ku disekine.

Azad şeveke din jî ji bo ta'mîra televîzyonê, ji mal dabû rê û çûbû. Jinikê carekê bi xwe nikarîbû û jê pirsîbû:

– Xuya ye, tu tişteki vê hevala te, ne saxlem e. Divê rebenê hertiştê xwe ta'mîr bike. Ya din jî, Azad tu bi xwedê bikî, ma tu kengî fêrî ta'mîra ewqas tiştan bûyî? Malava, madem te ji ta'mîra televîzyonan fahm dikir, me ji bo çi ew qas pere li ta'mîra televîzyona xwe dan?

Jinikê dû re li çavên Azadî nihêrîbû û di ber xwe de weha gotibû:

– Vî Azadî berê derew nedikir, lê nuha kes nema dikare wî bigire. Ji xêra xwedê, li eniya her mirovekî lampeyek hebûya û gava mirovî derew bikira, ew lampe pêketa. Wê gavê, wê lampa eniya Azadê me hertim pêxistî bimaya.

Azadî carekê jî gotibû:

– Ez ê biçim dibistana trafîkê û erebeyê biajom.

Wê gavê, jina wî di ber xwe de bişirîbû û gotibû:

– Xuya ye, tûrikê te yê derewan vala bûye. Haho, ji bo xwedê, roja yekşemê û dibistana trafîkê... Ez ê kirasê xwe, bê çîr û biçirînim. Ma kesî ev gosirmet dîtiye?

Azadî nema dizanîbû bê wê rewş bi çi awayî serrast biki-

ra. Mîna ku jinikê sucek kiribe, bi ser wê de rabûbû û gotibû:

– Ê... Bes bike pite pit! Ez diçim ku ez dizanim. Ma çi ye te daye ser pişta min, tê min di ku re derxînî?

Azad hatibû zevtkirin. Çareyek diviyabû. Piştî ku hertişt eşkere bûbû, Azadî xwestibû vê helwesta xwe biparêze, lê ji awirên civakê tirsiyabû, ya rastî fedî kiribû û ji ber vê yekê, serê xwe ji bo peydakirina hin rêyên din eşandibû. Di dawiyê de jî gîhaştibû biryarekê. Ji bo vê pirsê, nemunaqêşekirin, wek çareya herî baş hatibû dîtin. Li gor wî, ya baş ew bû ku mirov ji munaqêşeyên weha reviyaba û di vî warî de rê nedeba jinikê.

Zînê bi xwe jî ne hindik bû. Ew jî têra xwe hebû. Wê gellek caran, bi dizî dabû pê wî û xwestibû wî di ser hinek pêwendiyên de zevt bike. Jinikê carinan jî ji bo saxtîkirinê, telefonî cîhê wî yê ku wî gotibû, ew ê lê be, kiribû. Zînê ji bo di civatê de cîhî li Azadî teng bike û bi tesîra civatê wî li malê bide rûniştandin, bi telefonê ji gellek malbatên Kurd re bi detay behsa rewşa Azadî kiribû. Herkes bi pirsê wan hisiyabû. Azadî xwe di civata Kurd a li welatî de, hetikê his dikir û ev jî dikir sûcê jina xwe. Hin kesan şika ku wan hevdû ji bo hin hesabên aboriyê û taktîkên ku hatina wan a mehane zêdetir bike, berdabû, kiribû.

Hin kesên din digotin:

– Jinikê asoxî, mêrê xwe rezîl kir û mêrik jî mecbûrî berdana wê ma.

Lê hinekî din jî digotin:

– Ger herduyan ji berê de, li hevdu nedikir, ma ji bo çi Azadî jinik bi xwe re anî vî welatî û ji bo çi zarok çêkirin? Ev ne fen be, ev çi ben e.

Piştî ku herkes pê hisiyabû, êdî Azadî jî di ser qebran re, pêwîstiya veşartina hinek pêwendiyên xwe nedidît. Vê jî ew xistibûn rêya nevegerê.

Carekê gava gellek kes ji bo pirsra wan, li mala wan civiya-bûn, jinikê di nava munaqeseyan de, carekê ji Azadî re weha gotibû:

– Azad, em weha bihesibînin ku tu di nava pêwendiyên modern de yî. Ma gelo ez jî wek te bikim, tu dê qebûl bikî? Ma ne te hertim digot, jin û mêr li ba min wekhev in?

Wê gavê Azadî berê serê xwe rakiribû û li çavên hevalên xwe nihêribû û dû re bi helwestek e ku nexwestibû raste-rast bersiya pirsê bide û weha gotibû:

– Problemên min û te ne ev in. Ez û tu li hevdu nakin û gava jin û mêr li hevdu nekin, divê bi awakî medenî dev ji hevdu berdin. Meseleyên din tev lê neke.

Azadî baş dizanîbû ku li gel gellek sedemên din, netatmînbûna di warê cinsî de jî roleke mezin dileyizt û şikil dida ref-tarên wî. Têkiliyên wî yên cinsî, mîna yên gellek hevvelati-yên wî, ancax bi zewaca wî re dest pê kiribûn. Beriya wê, wî û xeyalên xwe mala hevdu şewitandibûn. Wî ji zarokên xwe pirr hez dikir, lê dîsa jî ji malê direviya. Wî ji jina xwe nefret nedikir. Hetta, di destpêkê de, di navbera wan de hezkirinek jî hebû. Tew bi çêbûna zarokan re, ev hezkirin û girêdana wan a malbatî, ji derve xurttir dihat xuyakirin. Lê hem ji aliyê têgihîştinê û hem jî ji aliyê îdelan ve her yek aîdî dinya-yeke cuda bû. Tev li ku Azadî dizanîbû, ne sûcê wê ye jî ew wek barekî li piştî xwe dihesiband. Li hember pêşveçûna xwe, mîna astengekê dinirxand. Li gor Azadî, danûstendi-nên wan têra daxwazên wan û nemaze jî têra daxwazên Azadî nedikir. Daxwazan .serî ji Azadî stendibû û Azad li

gor xwe dixist rê. Azad bi vêya hisiyabû, lê devê wî li ber daxwazan jî nedigeriya.

Piştî ku Azadî û jina xwe ewqas hevîr di zikê hevdu de sit-rabûn, biryara ji hevduxelasbûnê dabûn. Ji ber hebûna zarokan dadgehê ji bo fikirandinê şeş meh wext dabû wan. Piştî şeş mehan jî herdu ji ya xwe daneketibûn û zewaca ku bîst salan ajotibû û bi sê zarokên situxwar qediyabû.

Di vê pêvajoya piştî berdanê de, bi herduyan jî hiseke poş-maniyê pêyda bûbû û erê nedigotin, lê baş diyar dibû ku herduyan tev li pirsên ku ew anîbûn vê niqteyê jî xweziya xwe bi rojên berê dianîn. Lê parsuyên herduyan jî qalind bûn û ew hîn ne gîhaştibûn wê merhaleya ku yek bikaribe ji ya xwe dakeve.

Nuha piştî ku ew rewşa yên wek Azadî dibîne, qudûmê wî ji zewacê dişikê. Baskên wî dikevin avê û dilê wî li zewacê sar dibe. Ji xwe ew bixwaze jî nikare bizewice, lê gava mirov ji wî bipirse, dibêje:

– Min hîn biryar nedaye.

Xwedê ji wî jî razî be, ma ew jî jineke weha dixwaze, ger xwazgîniyên wî bi rastî li yeka weha rast bên, dê ne ji bo wî, lê ji bo xwe bixwazin. Mirov dibêje, qey metre di desta de ye û ji xwazgîniyên xwe re, pîvanên ku divê di keça ku wê jê re bê xwestin de hebin, rêz dike. Ji xwe xwazgîniyên wî gel-lek caran, ji wî re dibêjin:

– Kuro, ger te yeka weha pêyda kir, cewabê bide me jî.

Hisên wî yên zewacê, mîna pêlên deryayê, carinan dadikevin carinan jî bilind dibin. Gava xwe pirr bi tenê his dike, xweşiya jiyana malbatîyê dibîne û xweziya xwe bi jiyana malbatî tîne, li zewacê sor dibe û dibêje:

– Zû ji min re yekê pêyde bikin.

Hevalên wî yên zewicî di nava henekan re şîretan lê dikin û dibêjin:

– Lawo, ma tu me nabînî? Ma qey xwedê ji te stendiye? Ji bo xwedê çewtîtiya ku me kiriye, tu neke. ”

Ew wê gavê bersiva wan weha dide:

– Kengî we jî dev ji jinên xwe berdan, ez ê wê gavê şîretên we di serê xwe xim.

Lê carinan jî gava dibe şahidê problemên ku di navbera jin û mêran de hene, çongên wî sist dibin, xeyalên wî wenda dibin û hêviyên wî qels dibin. Tirsek wî digre û ji xwe re dibêje:

– Xwedê min ji vî agirî bisitrîne! Ma ev hal e?

Lê dû re bi bîaqilî difikire û dibêje:

– Lê tev hertiştî jî divê mirov li yeka ku wê bikaribin hevdu temam bikin, bigere; neslê xwe bidomîne. Tew gava mirov li fêkiyên mirovatiyê û kulîlkên pêşerojê difikire, divê zêde guh nede rîskan.

Wî piştî ku li Dîlberê pirsî, bi zimanê şewitî got:

– Ma tu hayê te ji Beybûnê jî heye? Gelo ew û diya xwe li hevdu dikin an na?

Li ber xwe nihêrî. Hebekî fikirî û dû re got:

– Nuha bûye jin. Wextê wê yê zewacê jî hatiye.

Di vê navberê de serçavê Azadî bi carekê hat guhertin. Giraniyeke weha li ser xwe his kir ku di bin de dikira bifetisiya. Hilma wî bi zorê çû û hat. Azadî weha his kir ku ji ber vê giraniyê, qoltixa ku ew li ser rûniştibû, dê nema bikaribe xwe ragire. Dinya li ber çavên Azadî reş bû. Mirovî digot qey ger Azadî Arjen bi hêrs du caran bi awayê ku lêwik bi-



guvêşe himbêz nekiribûya, dê hilma wî qet derneketibûya. Ruyê Beybûna ku kula wê qet ji dilê Azadî dervediket, bi pirsra wî re dîsa hatibû ber çavên Azadî. Biçûkaniya wê hat ber çavan. Çavên zerî û zimanê ku hîn nuh digeriya kela wî derxist sînore herî bilind.

Azad pênc roj berê, ji bo daweya wê çûbû dadgeha îdarî ya wîlayetê. Ne Azadî û ne jî keçikê biryara dadgehê qebûl dikir. Li ser kaxiza ku bi biryara dadgehê re hatibû şandin û bi sernivîsa “mirov çawa îtiraz dike” dest pê dikir, weha hatibû nivîsandin: “Ji bo ku li ser îtiraza we bê rawestin, divê ji wê roja ku biryar gîhaştiye we û pê ve di hundurê sê hefteyan de, îtiraza we bi nivîskî gîhaştibe dadgeha îdarî ya wîlayetê.” Ji ber vê yekê, ji bo îtirazê, pêr muracaetî dadgeha îdarî ya îstînafê kiribû. Azadî rewşa wê ne ji wî re û ne jî ji tu kesên din re negotibû. Ji xwe, ji ber Qanûna Nehênîbûnê, di vî warî de ji devê tu kesên ku di van daîreyên resmî de kar dikirin, tu gotin ne mumkun bû ku bihata derxistin.

Beriya ku Azad jina xwe berde bi salekê bû. Çi bû wê rojê bûbû. Heta wê rojê Azadî di vî warî de qet tu tişt nezanîbû. Ji wê rojê û pê ve vê kulê ew perîşan kiribû. Saetê nêzîkî li sisiyê şevê kiribû. Taxa wan di bêdengiya şevê de kerr û lal mabû. Dengê zengila telefonê ji nişka ve êrişî bêdengiya şevê kiribû û Azad û jina wî bi tirs û heyecaneke mezin ji xew çeng kiribûn. Azadî bişkoka lampeyê bi destpelînkê dîtibû û xwe bi zorê gîhandibû ahîzeyê. Bi destê xwe yê lerizî ahîze bilind kiribû û gotibû:

– Elo, fermo mala Azadî.

Û dû re bi meraqeke mezin li benda bersivê mabû. Azad ji ber heyecana ku ew dabû ber xwe, dengê di telefonê de bi

zorê fahm kiribû. Ancax piştî ku mêrikî gotina xwe dubare kiribû û gotibû:

– Bibuhurin, ez polîs im û navê min Thomas Andersson e. Ez dixwazim bi dê û bavê Beybûnê re bipeyivim.

Dengê wî hatibû fahmkirin. Lê devê Azadî çend saniyeyan negeriyabû.

Dû re ji devê wî yê ku ketibû tev, bi zorê ev gotin derketibû:

– Ez bavê Beybûnê mim. Çi qewimîye?

– Beybûn nuha li ba me ye. Ez dixwazim hûn bèn wê bi bin malê.

Çavên Azadî fireh bûbûn. Devê jina wî ya ku meraqa wê ji ya Azadî jî bêtir bûbû, vekirî mabû û bê sebir li hêviyê bû ku Azadî tiştê jê re bigota. Azadî piştî ku awirek dabû jina xwe û mîna ku sûcê wê bû, serê xwe bi kerb hejandibû, ji bo dilê xwe baş di cîh xe, dîsa ji yê polîs pirsîbû:

– Te got Beybûn li ba we ye?

Bi erêkirina yê polîs re rengê ruyê Azadî yê ku ji xwe, bi dengê telefona ku ew ji nav ciyan çeng kiribû berê hatibû guhertin, xerabtir bûbû. Tew gava yê polîs behsa erebeya hatibû dizîn û heşîşê kiribû, tu nemabû ku ahîze ji desta biketa. Hilma xwe bi zorê stendibû û berdabû. Dû re li pîreka xwe zîviribû û bi zorê gotibû:

– Beybûn? Ma ne diviyabû ew li mala Annayê bûya?

Azadî nexwestibû dirêj bike, ji ber vê yekê, tev li ku mesele baş fahm nekiribû jî hema ji yê polîs navnîşana polîsxaneyê wergirtibû û ahîze danîbû.

Wê rojê Beybûnê piştî pevçûneke ji wan pevçûnên herroj ên dê û bavê xwe, gotibû:

– Ma gelo hûn ê destûrê bidin min ku ez biçim li mala he-

vala xwe Annayê rakevim? Anna îşev bi tenê ye. Diya wê û bavê wê ne li mal in û ew ê li cîhê ku çûnê şevder bimînin.

Azad û jina xwe ji ber pevçûnê ji hal de ketibûn. Her yek ji wan di qoziyêke odeya rûniştinê de, li cîhê xwe melisî mabû. Ji ber vê yekê, zêde li teklîfa wê nefikirîbûn û bêyî tu mûnaqeşeyan, jê re gotibûn:

– Temam, tu dikarî biçî.

Lê piştî danîna ahîzeyê, Azadî fahm kiribû ku Beybûnê derew li wan kiribû û ji berdêla mala Annayê berê xwe dabû devereke din. Bi lez telefonî taksiyekê kiribû. Nema dihat bîra wî, bê çawa gîhaştibû wê derê. Bi kerb û fedîkirî derbasî hundurê polîsyaneyê bûbû. Beybûnê bikaranîna heşîşê înkâr kiribû û xwedêgiravî di jiyana xwe de tu carî tahm jî nekiribû. Gava hevlekî wê gotibû; “Bila ev li ba te be” jî wê nizanîbû ku ev heşîş bû. Azadî jî nema dizanîbû bê wî Beybûn çawa anîbû malê. Ji nav wan gotinên ku polîsî jê re gotibûn, bi tenê ev di bîra wî de mabûn: Beybûn bi du xort û keçeke din re, di erebeyek e ku hatibû dizîn de, tev heşîşa ku bi qasî têra çixareyekê bike, hatibûn girtin. Ji bo erebeya ku hatibû dizîn, dê dadgir ji wan re name bişanda û li gor polîsî, ji ber biçûkbûna emrê wê, dê di vî warî de tu mahkeme çênebûya. Polîs dê kaxizên wê bişanda Bingeha Ciwanan a belediyeya wan û vê bingehe dê dû re ba wan bikira.

Piştî çend civînên bi Karîn Ishaksson û Elin Blomberg, herdu berpirsiyarên Bingeha Ciwanan re û lêhûrbûna li ser tevgerên Beybûnê, guhertinên ku dibûn sedemên taswasan û hevalên ku wê hevaltî bi wan re dikirin, hemû bi hevdu re gîhaştibûn baweriya ku divê Beybûn di warê bikaranîna heşîşê de bê kontrolkirin. Ancax bi vî awayî sedema taswasa di vî warî de, dikarîbû ji ortê rabûya. Gava Karîna bejin di-

rêj î nav zirav î porzer berê bi çavên xwe yên şîn lê nihêrîbû  
û dû re bi cidiyeteke mezin ji wî û jina wî re gotibû:

– Em ê li ba Maria Ungdomê, yanî nexweşxaneyê ciwanên ku narkotîkayê bi kar tînin, ji bo civînekê û danîna numûneya mîzê wextekî veqetenîn. Em ê dû re di warê wext de agahdariyê bidin we.

Azadî ji nişka ve û bi nîvecêbmayî û bi meraq pirsîbû:

– Maria Ungdom ji teva ye? Ez ji zû ve li vî bajarî dijîm, lê ez vî navî cara yekem dibihîsim. Gelo ew ê bi çi awayî alîkariyê bi me bike?

Hîn Azadî peyva xwe neqedandibû, Elina devliken a ku bi qasî Karîna hevala xwe dirêj, lê hebekî jê qelewtir û ji axavtina wê ya bi Swêdî diyar bû ku ew bi eslê xwe ji Fînlândiyayê bû, dosyeya xwe danîbû ser maseyê û ji refîka li paş xwe, rahiştibû du buroşurên ji hevdu ku navê buroşuran “Maria tu carî ranazê” bû û yek ji wan dirêjî wî kiribû. Elin dû re li ser hin agahdariyên ku wê carinan rojê du–sê caran tekar dikirin û pîrraniya wan di wê buroşurê de jî hebûn, rawestiyabû:

– Maria Ungdom (MU) ji bo ciwanên ku li bajarê Stockholmê û li herêma Stockholmê dijî û temenên wan di binîya bîstan re ne hatiye avakirin. MU navendeke ku tu carî nayê girtin. Her roj û her saetê vekirî ye. Servîseke wê ya acil heye ku ew jî di hemû rojên salê de û di her saetê de vekirî ye. Maria Ungdom ji bo ciwanên ku tûşî xerabbikaranîna tiştên mîna alkohol û narkotîkayê dibin, navendeke pîrr hêja ye. Ne bi tenê ciwan, herweha dê û bavên ciwanan, kesên ku têkiliyên wan bi vê xerabbikaranîne re çêbûne, an jî ew kesên ku ji bo vê xerabbikaranîne taswas bi wan re çêbûye, dikarin berê xwe bidin vê navendê û alîkariyê bixwa-

zin.

Li vê navendê hemû awayên tedawiyê pêk tên. Xebatkaranê Maria Ungdomê hertim bi şêwra dêûbavên ciwanan tedawiyên pêwîst tetbîq dikin. Ji ber ku xerabbikaranîna alkol û narkotîkayê, ne bi tenê ji bo ciwanên ku tûşî wê dibin, herweha ji bo hemû kesên ku nêzîkî wan in; wek dêûbav, meriv û dostên wan jî problemek e. MU ji bo wan jî hertim vekiriye.

Çalakiyên Maria Ungdomê bi hevkarîya Meclîsa Wîlayetê ya Stockholmê û Îdareya Karûbarên Civakî ya Stockholmê tên birêvebirin. Gava belediyeyên herêmê ji bo xebatên xwe yên di warê xizmetên civakî de, xizmetê ji vê nexweşxaneyê dixwazin, divê xerca xwe bidin.

Li vê derê, ji derveyî servîsa acîlê ku hertim vekiriye, beşa ji jehrêpaqijkirinê, beşa tedawiya malbatan û beşa lênêrîna bêyî razana li nexweşxaneyê jî hene.

Di vê navê de Azad û Zînê ji bo baş têgihîştinê, li ser Maria Ungdomê hin pirsên din jî pirsîbûn û herdu berpirsiyaran bi sebireke mezin û bi îzahateke fireh bersiv dabûn.

Karîna ku beriya Elinê di nav van karan de bû û bi şiyana xwe ya îqnakirinê pîrr bawer bû, berê pirsîbû:

– Gelo tu pirsên we yên din hene?

Û piştî ku tu pirsên din nehatibûn pirsîn, gotibû:

– Ger hûn bixwazin, gava em li ba Maria Ungdomê wextê veqetînin, em dikarin ji bo peydakirina tercumanekî an tercumanekê jî temiyê li wan bikin. Ji ber ku heqê we yê tercumanxwestinê heye.

Bi bihîstina gotina tercuman re hem Azad û hem jî Zînê ketibûn tev. Bi çavên bi tirs li dora xwe nihêrîbûn û dû re ji

nişka ve û bi qasî ku yên li dora xwe ecêbmayî bihêlin, gotibû:

– Na, na ! Ji bo Xwedê na!

Wê gavê Elina ku li rewşa wan ecêbmayî mabû, bi dengê nerm ku xwestibû wan ji tirsê wan xelas bike, dest bi axavtinê kiribû.

– Azad, belkî ji bo te zêde ne problem be, lê têgihîştina hin gotinan dikarin ji bo Zînê problem be. Ji ber vê yekê, ya baş, çî dibe, çî nabe bila tercumanek li wê derê amade be.

Wê gavê Azad û Zînê bi hevdu re gotibû:

– Ma qey hûn li hetika me digerin? Ma ger hin Kurd pê bihisin, em ê ji xelkê re çî bibêjin?

Herdu berpirsiyar bi hevdu re bişirîbûn û dû re Karina ku sedema tirsê wan fahm kiribû, ji wan re gotibû:

– Qet metirsin! Tercumanên me sûndxwarî nin û erka wan a sirveşartinê heye. Li gor qanûnê di vî warê de nikarin tu tiştêkî ji devê xwe derxînin.

Azad û Zînê dîsa ji ya xwe daneketibûn.

– Na, na! Ji me re ne lazim e. Em ê hewil bidin, ji hevdu fahm bikin.

Azad ji bo bi awayekî bi temamî ji vê bela tercumanîyê xelas bibe, gotibû:

– Ez ê ferhengêkê bi xwe re bînim, ji bo wan gotinên ku em pê nizanibin, em dikarin wê bi kar bînin. Ji bo Zînê jî xema mexwin. Bi alîkariya ferhengê û bi rêya ji we şerhxwestinê, ez ê ji wê re tercume bikim.

Di civîna ku li lokalek e ji wan lokalên xweş û rohnî yên Maria Ungdomê hatibû amdekirin de, ji derveyê herdu berpirsiyarên Bingeha Ciwanan, ji xebatkarên Maria Ungdomê Kristina pîr a ji ber kêmbûna taqeta wê ya ku bikaribe bejna

wê ya dirêj ragire, xûz bûbû, bi çavên xwe yên şîn î di bin berçavîkê de baş hûr bûbûn, bi ruyê xwe yê qermîçî û bi porê xwe yên bi rengê qahweyîyê tarî boyaxkirî ku sipîbûna porê wê baş veşartibû ve li kêleka herdu berpirsiyaran û tam li hember wan rûniştibû. Andersê hevalê wê yê çavşîn ê ku porê xwe yê zer î dirêj li paş xwe girê dabû û temenê wî ji sîyî ne zêdetir xuya dikir ku tîşortekî zer î bêbeskur û pantalonêkî di rengê qahweyîyê vekirî de lê bû jî li kêleka wê rûniştibû. Piştî agahdariyeke kurt ku pirraniya wan mîna yên ku berê li Bingeha Ciwanan bihîstibûn, wergirtibûn, berpirsiyarên Maria Ungdomê di derheqa guhertina reftariyên Beybûnê, têkiliyên wan û wê de û di derheqa wan xusûsiyêtên ku dibûn bingehê taswasa wan de, ji Azad û Zînê pirsîbûn.

– Hevalên wê yên nuh ku we ew berê nas nedikirin, hene? Ew baweriya we ya ku berê pê hebû, nuha çawa ye? Ma ew hertim dixwaze derkeve derve û gava derdikeve jî pirr dereng tê malê? Pereyên we carinan wenda dibin? We tu carî tesbît kiriye ku wê hin tiştên xwe, mîna hungulîsk, bazin an tiştên weha firotibin? Di derheqa wext û cîhê ku ew diçê û kesên ku hevaltîyê ê re dikin de derewan dike? Ma ew êdî zû hêrs dibe û xulqê wê jî pirr teng bûye? Ma ew bala xwe mîna berê dide malbat û dibistanê? Ma serê sibehan dereng ji xew radibe û gellek caran jî ji dibistanê dimîne? Ma qeneteke weha bi we re çêbûye ku ew êdî bi dorhêla xwe re qet elaqadar nabe û bûye yeka di xwe de girtî ku mirov nema dikare têkiliyan pê re deyne?

Pirs li dû pirsê hatibû pirsîn û Azadî û jina xwe jî li gor tiştên ku tesbît kiribûn bersiv dabûn. Pirs û bersivan taswasa wan bêtir kiribû.

Heta wê gavê Beybûn nehatibû hundurê odeyê. Ancax piştî niqteyên ku ji bo wan girîng bûn, li ba xwe nivîsandi-bûn, ba Beybûnê kiribûn û di derheqa bikaranîna heşîşê de hin pirs jê kiribûn. Piştî ku li çîroka bikaranîna wê ya heşîşê ku li gor lixwemukurhatina wê, carekê bi tenê ew jî tahn kiribû, hatibû guhdarîkirin ji bo danîna numûneya mîzê Kristina û Beybûn çûbûn tûwaletê. Ji ber ku li gor qaîdeyan, gava hinek ji bo danîna numûneya mîzê, çûbana tûwaletê, diviyabû ji bo saxtîkirinê ji MU'yê personalek jî bi wan re bûya. Li gor ku li hevdu kiribûn jî piştî encama tahlîlê dê dîsa li Maria Ungdomê li hevdu rûniştibûna.

Encama tahlîlê pozîtîv derketibû û ev jî dihat wê mahneyê ku di mîzê de cannabis hatibû tesbîtkirin. Ji ber vê yekê ji bo tesbîtkirina plana ji bo tedawiyê, agahdarî û tedbîrên pêwîst, dîsa li Maria Ungdomê hatibûn ba hevdu.

Kristinayê berê rahiştibû dosyeya li ser maseyê, rapora tahlîlê ya ku ji laboratûwara Nexweşxaneyê Karolinayê hatibû, jê derxistibû û ew gotina ku Azad û jina wî xistibûn rewşeke weha ku herduyan jî xweziya xwe bi “ji xêra Xwedê erd veqelişiya û em têketana bin erdê” anîbû, ji devê wê derketibû.

– Encam pozîtîv e. Yanî di mîza Beybûnê de cannabis hatiye tesbîtkirin.

Herduyan berê çavên xwe li çavên Beybûna ku serê xwe bera ber xwe dabû gerandibûn û dû re piştî lixwemukurhatina Beybûna ku jê re tu rêyên înkarkirinê nemabûn, xwestibûn şaşbûna xwe zû ji ser xwe biavêjin û ji bo fahmkirina “bê ev mîrata cannabîsê çi ye” liviyabûn. Azadî ji aliyekî ve ferhengê xwe vekiribû û xwe bi ser Zîna ku nema dizanîbû bê çi qewimîbû, bi tenê bi çavên bi meraq û tijepirs li wan



nihêribû, xwar kiribû û bi dengekî nizim jê re gotibû:

– Di ferhengê de tê mahneya kindira Hîndê.

Û ji aliyê din ve jî gotibû:

– Gelo hûn dikarin di vî warî de agahdariyên pêwîst bidin me?

Kristina berê gotibû:

– Ji xwe, me hem ji bo ku em agahdariyên di vî warî de pêwîst in bidin we û hem jî ji bo tedawiya ku tê fikirandin bi we re bidin û bistînin, ba we kiriye.

Û dû re rahiştibû çend buroşuran û carinan li wan nihêribû û carinan jî bêyî wan dest bi agahdariyên giştî yên ku hem ji bo wî û hem jî ji bo jina wî pirr nuh bûn, kiribû:

– Cannabis ji bo heşîş, donê heşîşê, esrarê û hwd navekî giştî ye. Di cannabisê de bi qasî çarsed madeyên kîmyewî hene. Navê madeya aktîv a ku serxweşiyê bi mirovî re çêdike Tetrahydrocannabinol e. Ji vê madeyê re bi kurtî THC tê gotin. Ferqa mezin a ku di navbera, heşîş, esrar û donê heşîşê de, di warê nîsbeta THC'yê de derdikeve ortê. Di esrarê de, li gor heşîş û donê heşîşê nîsbeta THC'yê kêmtir e. Di esrarê de nîsbeta THC'yê di navbera ji sedî yekê û pêncan de ye. Di heşîşê de nîsbeta THC'yê di navbera ji sedî çar û dehan de ye. Nîsbeta herî bilind di donê heşîşê de heye. Ev jî carinan digihêje ji sedî nodî.

Kristina xwestibû dest bi tesîrên wê yên ku di laşê mirovî de çêdibin bike, lê pirsên ku “Gelo ev li kê derê çêdibe? Ji ku tê Ewrûpayê? Di vî warî de qanûnên Swêdê çi dibêjin” ên Azadê ku nikaribû bi meraqa xwe, ew rawestandibû.

Anders destûr ji Kristina xwestibû û peyivîbû:

– Li gor qanûnên Swêdê, cannabis narkotîka tê hesibandin û hem çandin, hem firotin, hem li ser mirovî peydabûna

heşîşê, donê heşîşê û esrarê qedexe ye. Cezayên di vî warî de li gor dereceya sûcî, di hinek rewşan de herî pirr heta sê salan û di hinek rewşan de jî ji herî hindik du salan heta deh salan tê guhertin. Ji bo pirsra we ya di vî warî de, ez dikarim bibêjim ku pirraniya heşîşa ku li Ewrûpayê belav dibe, ji Lubnanê tê. Li gor texmînan, li Geliyê Bekaayê bi tenê salê nêzîkî deh hezar ton heşîş tê çêkirin. Di 1982an de li lîmaneke Yûnanîstanê di keştiyeke Lubnanê de bîst û du ton heşîş hat girtin.

Gava navê Lubnanê û Geliyê Bekaayê derbas bûbû, çavên Azadî û yên jina wî ewqas fireh bûbûn ku yên li dora wan gotibûn, qey çavên wan dikin ji serê wan baz bidin. Li şaşbûna wan ecêbmayî mabûn. Şaşbûn û ecêbmayîna wan tesîr li atmosfera odeyê jî kiribû. Ji ber vê yekê Andersê ku nika-rîbû xwe ji meraqa xwe rizgar bikira, pirsîbû:

– Gelo tu tiştêkî hûn dixwazin bipirsin, heye?

Azad û Zîna ku tew Beybûn û rewşa wê ji bîr kiribûn, ji nişka ve li xwe hay bûbûn û gotibû:

– Na, nuha tu tiştêkî ku em dixwazin bipirsin, tune ye.

Kristina ji vê firsetê îstîfade kiribû, berê mîna ku bibêje, “ez dixwazim dewam bikim” li çavên Anders nihêrîbû û piştî ku di warê destûrê de ji nerînên Andersî sinyalên erînî wergirtibûn, xwestibû peyvê bîne ser tesîrên ku ji ber van madeyan di laşên mirovî de çêdibin.

– Heşîş yek ji wan madeyên narkotîkayê yên ku dibin sedemên halusînasyonan. Tesîra wê raste rast li mejî û psîkoljîya mirovî heye. Ger mirov wê û alkoholê bide ber hevdu, mirov ê xeteriya bikaranîna heşîşê baştir fahm bike. Belkî hûn jî dizanin, di alkoholê de du made hene; av û etanol. Lê hejmara madeyên ku di çixareyeke esrarê an jî di yeke heşîşê

de hene, ji çarsedî zêdetir e û ji vana bi qasî deh madeyan jî tesîreke mezin li psîkolojiya mirovî dikin. Em dizanin ku hatên mîna psîkoz, reaksiyona panîkê û halusînasyonan piştî çend caran kişandina heşîşê dikarin bên holê.

Azad û Zîna ku bi awayekî ku devên wan ji hev çûbûn û bi çavên ji ber şaşbûnê fireh bûbûn, ziq li Kristinayê dinihêrîn, gava behsa tesîra heşîşê ya di laşê mirovî de hatibû kirin, xwe negirtibû û gotibû:

– Gelo ji bo çi heşîş dikare ewqas bi tesîr be?

Kristina ji ber elaqa wan a li hember axavtina xwe ya li ser heşîşê û meraqa wan a bi vê pirsê jî baş diyar bûbû, kêfa xwe bi zorê veşartibû. Wê tev li ku xwe ji bo vê civînê baş amade kiribû jî ji bo kontrolê û rê li agahdariyên şaş bigre, carinan buroşur û pirtûkên ku li ser maseyê bûn jî tev dabûn. Gava Azad û Zîna pirsibûn, wê dîsa buroşurek vekiribû û gotibû:

– Di vê derheqê de, tiştên ku li vira hatinin nivîsandin, pirr bi feyde nin. Hûn dikarin li malê jî bixwînin. Me berê jî diyar kiribû, madeya ku serxweşiyê çêdike û tesîrê li psîkolojiya mirovî dike, tetrahydrocannabinol, yanî THC ye. Ev made bi kişandina heşîşê bi awayekî pirr bi lez tê pişikê û di hundurê çend deqîqeyan de tesîra xwe nîşan dide. THC di avê de nahele, lê di bez de dihele. Di tevnên bi bez de depo dibe û dû re bi rêya xwînê digihêje mejiyê mirovî. Di vê pêvajoyê de tesîra xwe li kezêb, pişikê jî dike, rê li guhertinên hormonan vedike û rîska astma û alerjiyan zêdetir dike. THC ya ku piştî serxweşî nemîne jî heta demeke dirêj di laşê mirovî de dimîne, dikare tesîrê li sîstema asaban jî bike.

Azadî xwe ne girtibû û pirsibû:

– Gelo heta kengî di laşê mirovî de dimîne?

– Bo numûne, di laşê mirovê an mirova ku heşîşê bikişîne de, piştî kişandinê bi hefteyekê jî hîn nêviyê THC'yê di laşê wî an wê de dimîne. Ji bo ku laş bi temamî jê paqij bibe, carinan heta mehekê jî wext divê. Lê mesela, ji ber ku nîkotîn, alkohol û kofeîn di avê de dihelin, piştî çend saetan an jî herî pirr rojekê ji laşê mirovî derdikevin.

Ger Azadî bi pirsekê peyva Kristinaya ku ji ber baldariya civatê, li meseleyê baş germ bûbû, nebiriya, agahdariyên ku ji berê de hatibûn plankirin, dê yek bi yek û ji bo têgihîştina wan bi Swêdiyê hêsan, bihata pêşkêşkirin.

– Te behsa tesîra wê ya li ser mejîyî kir. Gelo di mejîyî de çi dibe?

– Tesîrên ku heşîş li ser mejiyê mirovî dike, gellek in, lê ez dixwazim du numûneyan bidim; tesîra ku li navenda hafiziyê dibe û ya ku li navenda hisan dibe. Mirovên ku heşîşê dikişînin, dibêjin qey ew pirr zelal difikirin. Lê di eslê xwe de, di warê konsentrasyonê de problemeke mezin derdikeve ortê û ya din jî fikirandineke ne mantiqî tê rojevê. Ji bo xweîfadekirinê gotinan zehmet peyda dikin û gava dipeyivin jî di navbera gotinên wan de tu girêdan tune ye. Mefûma zemên di pêvajoya fikirandinê de hertim qut dibe û mirov nema dizane bê nuha çi ye, zemanê derbasbûyî çi ye û pêşeroj çi ye. Ji ber ku hafize pirr qels dibe, mirov di fêrbûna tiştên nuh de pirr zehmetiyê dikişîne. Ew tiştên ku mirov beriya bîstikekê fêr bûye jî nayê bîra mirovî.

Tesîreke mezin li ser şexsiyeta kesên ku heşîşê êdî adetî bi kar tînin, derdikeve ortê. Hinek li hember tiştan, mîna ku bi temamî bê his in weha laqayt dimînin. Bûyerên ku bi rastî diqewimin û xeyalan tev lî hevdu dikin. Rastî û fanteziyê nema dikarin ji hevdu veqetînin. Peredeyek dikeve navbera

wan û jiyane. Pêlên hisên ji şik, taswas û tirseke zêde pêkhatî, hemû kesên ku heşîşê dikişînin didin ber xwe. Haletên panîk û psîkozê jî netîceyên mantiqî yên vê pêvajoyê ne.

Geh Kristina û geh jî Anders avêtibûn ber hevdu û di nava dengê qulipandina rûpelên ferhenga Azadî û pispisa wî û Zînê de, tev bersivên pirsên Azadî, Zînê û herdu berpirsiyarekî Bingeha Ciwanan, agahdariyên pêwîst dabûn. Di derheqê tesîrên ku çî di dema kurt û çî jî di dema dirêj de derdikevin, agahdariyên ku hatibûn dayin, hîn jî dihatin bîra Azadî.

– Nebza mirovî dikare di deqîqeyekê de sed û şeş çaran lêxê. Ji ber ku damarên di tebeqeya çavî de fireh dibin, çav sor dibe. Nêrînên mirovî di dema serxweşiyê de dibiriqînin, lê piştî serxweşiyê jî biriqandinê tu eser namîne û betilîbûn xwe bi her awayî dide der. Devê mirovî pirr zuha dibe, tîbûneke berdewam di rojevê de ye û dilê mirovî hertim dibije tiştên şêrîn. Xwêdan, ricifandin, kuxik, verşî, navçûyin....

Piştî ku Kristina û Anders di warê tesîrên heşîşê de çî dizanîbûn, pêşkêş kiribûn, li ser planek e ku ji bo du mehan hatibû amadekirin, li hevdu kiribû. Di wextên diyarkirî de di-viyabû Beybûn bihata û numûneya mîza xwe danîbûya. Piştî ku ji bo selametiya tahlîlê, temiya ku di-viyabû Beybûn beriya danîna numûneya mîzê zêde av venexwaribûya, hatibû kirin, bi awayekî situxwar û xemgîn berê xwe dabûn malê.

Di pêvajoya herdu mehan de, di herçar civînên ku hatibûn çêkirin de diyar bûbû ku Beybûn du çaran neçûbû Maria Ungdomê û numûneya mîzê di wextê ku hatibû diyarkirin de danîbû û ji ber ku du çaran jî pirr av vexwaribû, bawerî bi netîceyên tahlîlan nehatibû anîn. Lê ji derveyî van,

di hemû tahlîlên din de, cannabis hatibû tesbîtkirin. Piştî ku du mehên din jî weha dewam kiribûn, berpirsiyarên MU'yê gotibû:

– Em bi vî awayî nema dikarin bidomînin. Ji bo ku em bi-karibin ji tahlîlan netîceyeke baş ku em pê ewle bin, werbigirin, divê Beybûn deh rojan ji bo ji jehrê bê paqijkirin, li nexweşxaneyê me bimîne.

Azad û Zînê bi hevdu şewirîbûn û piştî ku tu çareyeke din nedîtibû, ji bo ku Beybûn deh rojan li nexweşxaneyê bima, bi berpirsiyarên Bingeha Ciwanan re biryar dabûn.

Di wî dehrojî de Beybûn ji terefê doktoran jî hatibû muayenekirin û li gor qaîdeyan, numûneya mîzê dabû. Piştî deh rojan, laş ji cannabisê hatibû paqijkirin û hêviya ku êdî Beybûn dê bi jiyane ve bêtir elaqadar be, hatibû kirin. Lê kontrol dê her berdewam bûya. Ji ber vê yekê, her gava ku berpirsiyarên MU'yê telefonî mal kiribûna, diviyabû Beybûn biçûya wê derê.

Di vê peryodê de, Beybûn, tev ku baş hatibû temîkirin jî carinan nehatibû MU'yê, carinan gava hatibû jî beriya mîz-tinê pîrr av vexwaribû û di tahlîla hemû carên din de jî cannabis hatibû tesbîtkirin.

Piştî soza ku ji aliyê Beybûnê ve gellek caran hatibû dayin, hertim pûç derketibû û tedbîrên MU'yê têrê nekiribûn û piştî encama munaqeseyên di gellek civînên hem li Bingeha Ciwanan û hem jî li MU'yê de hatibûn kirin, berpirsiyarên Bingeha Ciwanan ji Komîsyona Karûbarên Civakî ya belediyeyê biryara ku dest bi tedawiya pêwîst bikin, derxistibûn. Ji ber ku hem Azad û hem jî Beybûn li dijî biryarê derketibûn, Komîsyona Karûbarên Civakî ji bo bi rêya Qanûna bi Qaîdeyên Taybetî yên di derheqa Lênerîna Ciwanan de dest

tedbîrên pêwîst bike, dawe hewaleyî dadgehê bûbû. Komîsyona Karûbarên Civakî xwestibû ku dadgeh li ser bingehê xala sisiyan a vê qanûnê, desthilatdariyê bide wan, da ku ew bikaribin Beybûnê ji bo tedawiya pêwîst teslîmî muesseyek e ku li derveyî Stockholmê bikin. Dadgeha Îdarî ya Wîlatetê li gor daxwaza Komîsyona Karûbarên Civakî biryar dabû. Lê Azad û Beybûnê îtirazî vê biryarê kiribûn û îtiraza xwe, bi rêya Dadgeha Îdarî ya Wîlatetê ve şandibûn Dadgeha Îdarî ya Îstînafê.

Li gor agahdariya ku ji awûkatê xwe wergirtibû, dê dadgeh bi texmînî çar hefteyên din bicive û di vî warî de biryarê bide. Ji ber vê yekê ruyê Azadê ku serê wî ji xwe berê tev li hevdu bûbû, bi li halê Beybûnê pirsînê xerabtir bûbû. Wî tu mahne neda guhertina ruyê Azadî û ji ber vê yekê jî bi çavên ecêbmayî lê nihêrî. Ancax piştî ku wî Azad du caran niqurçand û got:

– Birako, xuya ye tu ne li vira yî. Xêr e, çi bi te hatîye?

Azad bi ser hişê xwe de hat û got:

– Na lo, tu tişt tune ye. Ma derdê dinyayê diqedin?

Dû re, ji bo ku ew mecbûrî îzahkirina rewşê nemîne, Azadî mesele guhertibû û pêkeniya ku du hefte berê ji hevalekî xwe bihîstibû û hingî kêfa wî jê re hatibû, digîhaşt kê, ji wan re digot, ji wî re jî got. Bi pêkeniyê pîrqînî bi herduyan jî ketibû. Pêkeniya li ser yê ku ji xalê xwe re behsa eskeriya xwe dikir ku di roja teskereya xwe distîne de, ji yekî “hoste–er” şîrmaqekê dixwe û gava xalê wî dibîhîse, jê re dibêje; “Te xwelî li serê xalo kiro! Ma roja ku te teskere stend, tu kesê ku ji te “hoste–er”tir hebû?”

Ji ber pîrqîniya wan, çend kes li ser situyên xwe zîvirîn û

bi çavên bê mahne û bi meraq li wan nihêrîn.

Azadê ku ji ber guhertina hewayê, kêfa wî lê vegeyabû, hevalê xwe yê ku piştî pirqîniyê bêdeng mabû, rehet nehişt û dest bi hin pirsan kir. Wî jî bêyî dilê xwe serê xwe rakir û bersivên kurt dan. Xuya bû, Azad dixwest hinek pirsên aktuêl munaqêşe bike. Munaqêşeyê hebekî dom kir û Azad her diçû, lê germ dibû, lê wî nexwest munaqêşeyê dirêj bike. Ji ber ku gellek dost ji bo munaqêşeyên weha, ne amade bûn. Di rewşên weha de, encamên ku dihatin xwestin, nika-rîbûn bihatana wergirtin. Rewşa ku mirov tê de ye, tesîreke mezin li munaqêşeyê dike. Munaqêşeyên weha, gellek caran dostaniya hebû jî xera dikir.

Ma sedema xeyda do êvarî jî ne munaqêşeyê weha bû? Gellek hevalên kevin li mala Hesoyî civiyabûn. Ew bû, Hesoyê Lîceyî bû, Darayê Qulpî bû, Serdarê Batmanî bû ku berê di nav çepên Tirkan de xebitîbû, lê di pêvajoya xurtbûna munaqêşeyên di warê mêtîngehiya welêt de, helwesteke neteweyî wergirtibû û nuha jî li nexweşxaneyê meslekê xwe yê li welêt, doktoriya zarokan dewam dikir, Remoyê Kexteyî bû yê ku fakulteya siyasetê qedandibû û bi salan bi wan re di eynî xanîyî de jiyabû û nuha ji bo projeya weşandina kovareke bi zimanê Kurdî ku tê de munaqêşeyên siyasî û îdeolojîk bèn kirin, bi rê ve dibir, Şerîfê Mêrdînî yê ku hemû porê xwe di nav xebatê de weşandibû û çend tayên mabûn jî sipî kiribû û di postexaneyê de di beşa name jihevduveqetandinê de kar dikir....

Xwezî, bi Darayî re neketibûna nav wê munaqêşeyê û ji ber wê jî dilê hevdu nehiştibûna. Darayî di nav xebata siyasî de, bi salan fonksiyon leyistibû. Di wê pêvajoyê de jî yek ji



wan ên ku gellek kesan ji destan pirr kişandibû. Lê nuha hertişt li bin guhê hevdu ketibûn û xwedêgiravî ew sertbûna berê nema bû.

Dara bi berçavka xwe ya heta serê bêvilê daketî, bi porê xwe yê bi qasî ku bikaribe bi yê xortekî bîstsalî re qayîşê bi-kişîne, gûrr, bi bejna xwe ya ku ji ber çenteyê wî yê dîplo-mat ku hertim di desta de bû, hîn xûztir bûbû û bi awayê axaftin û danûstendina xwe ve, di çavpêketina yekem de ji bo ji terefê yên li hember xwe mîna yekî bi tecrube, zane û têgihîştî xuya bike, cîh ji tu şikan re nedihîşt. Dara yek ji wan ên ku jiyana li rojhilata navîn, li gellek hevalên xwe ki-ribû cehenem ku nuha xwe mîna dewrêşê dîyalog, demok-rasî û toleransê nîşan didan, bû. Di vê tevgera xwe de, çiqas ji dil in, di hundurê pêvajoyê de hêdî hêdî diyar dibû.

Di munaqeseya do êvarî de, Dara di destpêkê de pirr aram bû. Gava lênerînên xwe pêşkêş dikirin, mirovî digot qey, wê uslûba ku li ser bingehê nermbûn û toleransê, hatibû avaki-rin, dê heta dawiyê berdewam bike. Tu kesî texmîna ku ew uslûb, dê ji nişka ve, bikaribe bê guhertin, nekiribû. Ji xwe gava rewş diyar bûbû jî gellek ji wan, şaş mabûn. Ji ber ku Dara berê, ji prensîpên demokrasî, tolerans û mafê xwe îfa-dekirinê, dest pê kiribû û li gor Darayî, mirov diviyabû lêne-rînên cuda mîna xeteriyekê nedîta, lê mîna dewlemendiyekê binirxana.

Heta ku Darayî pêşkêşkirina lênerînên xwe temam kir, munaqeseya pirr normal meşiyabû. Gava Serdarî gotinên wî, bi serê xwe kilkirinê tesdîq kiribûn jî kêfa Darayî pirr hati-bû.

Lê çi bû wê gavê bû. Wê gava ku Remo bi awayekî din nêzîkî meseleyê bû û lênerînên Darayî mîna mîna perspektî-

vek e ku di bin tesîra balana hêzan a îro de hatiye avakirin, nirxandibû... Wê gavê divê mirovî rûyê Darayî dîtibûya. Lê Remoyî bi vê jî qîma xwe neanîbû û nirxandina lênerînên Darayî domandibû. Lênerînên wî, ji ronahiya dersên pêvajoya derbasbûyî û ji pira ku divê di navbera îro û pêşerojê de hebe, bêpar nirxandibû. Gava lênerînên Darayî ji zanyariya dîrokî bêpar û mîna modeyeke hatibûn nirxandin, Darayî êdî nema dikarîbû xwe bigirta. Tew gava ku Şerîfî gotina kalikê xwe bi bîr anîbû û gotibû:

– Dara, bavê min, ger her bayek rabe, tu bi berkevî û her avek rabe, tu bi serkevî, tu ê ji dinyayê derkevî.

Dara dikira bigota ”gurm” û biketa. Ji xwe, Dara heta wê gavê xwestibû gellek caran mudaxeleiyê munaqeseyê bike, lê yên li wê derê gotibûn:

– Malava, gava tu peyivî, herkesî li te guhdarî kir. Destûrê bide, bila yê li hember te jî mafê xwe bi kar bîne.

Darayî ji ber helwesta civatê, îdare kiribû, lê çi îdare... Wek li ser êgir bû. Erê deng nedikir, lê di hundurê xwe de dikeliya. Bi ufe–uf û pife–pif û niçe–niçê, pêvajoya guhdarîkirinê bi saxî û selametî qedandibû. Mîna bombeyek e ku pîma wê hatibû kişandin, xuya dikir û gava dor hatibû wî jî teqiyabû. Çavên xwe girtibûn û devê xwe vekiribû û hema çi hatibû ber devê wî, gotibû. Ne uslûb, ne tolerans, ne dostanî... Guh nedabû tu tiştî. Kesên li hember xwe, bi nepaqijiyê û ji welatparêziya wan şik jê tê kirinê, îtham kiribû. Her ku çûbû hêrstir û bêpîvantir bûbû. Heta, carekê di nav axavtina xwe de, weha gotibû:

– Divê mirov nehêle yên mîna we, di civatê de bipeyivin.

Wî bi awayekî ecêbmayî, di dilê xwe de gotibû:

– Xwedêyo, çi bi vî mêrikî hat? Di destpêkê de, çi nerm û

çi uslûbxweş xuya dikir. Li hember lênerînên xwe, çi bi tolerans bû, çi demokrat bû û çi bêhnfireh bû. Ev çi paradoks bû?

Lê li gor wî, li wê civatê tişteke pirr baş diyar hebû ku hêvî dida mirovî; ew jî helwest û reftara pirraniya wan kesên ku li wê derê bûn, diyar kiribû ku civata me jî hêdî hêdî fêrî di bin atmosfereke demokratîk de, munaqêşekirinê dibû. Kesên mîna Darayî, di civatê de, ne hindik bûn, lê ne xwediyê tu pêşerojê bûn. Ya xerîb jî ew bû ku Darayî û yên mîna wî, di vê pêvajoyê de, tev vê mentalîteyê, xwe pêşevanê demokrasîyê diditin û gellek kes bi tengbûn û ji toleransê bêpariyê îtham dikirin. Xuyabû ku kesên weha, van maf û azadiyan bi tenê ji bo xwe dixwestin û ne xwedê heye, di warê bikaranîna van mafan de jî tu teksîrî nedixistinê. Gava Dara ji bo çûyinê rabûbû ser xwe, xatir ji civatê nexwestibû û di ser re jî weha gotibû:

– Mirov ji we ne xerabtir be, nayê civata we.

Ew do bi vê rewşê pirr aciz bûbû. Li gor wî, ev tiştekî pirr xerab bû. Civat bi vê gotinê pirr êşiyabû. Şevbuhêrk têk çûbû. Deng nema ji tu kesî derketibû. Bêdengiyekê ode dagirtibû. Herkesî bêyî ku li yê din binihêre, bi tenê li ber xwe nihêribû û bi awayekî bi berketî, kûr fikirîbû. Civatê quweta serrastkirina vê çewtîyê di xwe de dîtibû û ji ber vê yekê rê nedabû tu reaksiyoneke neyînî.

Piştî çûyina Darayî, beşdarên wê munaqêşeyê baş dizanîbû ku heta ew û Dara dîsan li hevdu veşandin û mîna berê dostaniya xwe bimeşînin, pêwîstî bi wextê hebû. Gava Darayî ew weha sar hiştibûn û çûbû, wî berê serê xwe bilind kiribû û li hevalên xwe yên bêdeng temaşe kiribû û dû re di bin bayê acizbûnê de, di hundurê xwe de weha fikirîbû:

– Heta ku bayê tolerans û hevdu tehamulkirinê, ji aliyê pîrraniyê ve bê tenefuskirin, xuya ye ku hîn demeke dirêj divê.

Bi vê gotinê re di serî wî de çend pirs jî çêbûbûn.

– Lê ma gelo divê mirov li benda hatina wê demê raweste? Ma ji bo bilezkirina pêvajoyê û guhertina rewşê, tev rîskên muhtemel, ji nuha ve, hewildan ne pêwîst bûn?

Ew li tu bersivan nefikirîbû û bi dengekî nizim xatir ji civatê xwestibû û ji bo ku deqîqeyeke beriya deqîqeyekê ji wê atmosferê derkeve, bi lez di derî re derketibû kolanê.

Wî ji ber tîrsa do êvarî, nexwest tu rîska bistîne. Ji ber vê, bi Azadî re dirêj nekir. Devê wî ji şîr şewitîbû û nuha ji tîrsa, pif dew dikir. Divê xwe bisitranda. Ji xwe, ji ber problemên malbatî, rewşa Azadî ya psîkolojîk jî ne musaît bû. Ji ber vê yekê, wî rengê sohbetê guhert û sohbet li ser rewşa Azadî ya şexsî û malbatî domand. Azadî di vê sohbetê de, ne normaliyek ferq kir, lê îtiraz nekir. Azad li gor wî meşîya û dû re jî ew dawetî mala xwe kir:

– Ger tu karê te yê girîng tune be, em bi hevdu re biçin malê. Em dikarin piştî şivê, bişînin pê Zîwer û Hemoyî jî û çend destên pinîkêr bileyizin. Me ji zû de neleyistiye. Bi gotina pinîkêr re sahneya leyiztika pinîkêr ji nişka ve hat ber çavan û dengên leyiztikvanan di guhên wî de kir zingînî:

– Ji bo derxistinê ji wan re çi qas maye?

– Qoz çi ye?

– Kûpa ye.

– Saxên te çawa ne? Ger saxên te baş bin, berê saxên xwe bikişîne.

– Bi usûl bimeşe.

- Ger saxên te neman, destê wan bide wan.
- Qoz biavêje. Wî sedê began xwendibû, ha!
- Tu dixwazî bi “çaqa” min were, ez ê dû re destê wan bidim wan...

Li hember pinîkêr gellek zeîf bû. Azadî jî bi vê hêla wî dizanîbû. Pinîkêr perçeyekî jiyana wî bû. Ji xwe ew bê pnîkêr nikarîbû bihata fikirandin. Lê rebeno, ji ber fediyê, di navbera salên 1975an û 1980yê de, têra xwe neleyistibû. Heyfa wan salan, nuha hiltanî.

Evîndariya wî ya pinîkêr ewqas pêş de çûbû ku wî carekê xwestibû li ser vê leyiztikê, lêkolînekê jî bike. Gellek pirsên di vî warê de, serê wî meşgûl dikir. Li hinek deveran jê re digotin, ”xoşkîn”, li hinek deveran jê re digotin, ”nezere” û li hinek deveran jî jê re digotin ”pinîkêr”.

Bi kûrahî lê difikirî. Gelo ev leyiztik berê çawa dihat leyiztin? Ji bo çi desteyê pinîkêr ji nav çar desteyên kaxizên leyiztikê dihat neqandin? Çima ji herçar desteyên kaxizan, bi tenê dehlib, lawik, keçik, keşe û yeklib dihatin neqandin? Ji bo çi desteyê pinîkêr ji heştê kaxizan pêk dihat û hwd...

Di jiyana xwe de, pêrgî gellek awayên vê leyiztikê bûbû. Pinîkêrê bi du kesan, pnîkêrê bi sê kesan ê girtî, pinîkêrê bi sê kesan ê vekirî, pinîkêrê bi sê kesan ê pênc kaxiz veşartî, pinîkêrê bi çar kesan ê her yek ji xwe re, pinîkêrê bi çar kesan ê bi hevaltî û hwd. Awayê pinîkêr yê ku herî pirr dihat leyistin, pinîkêrê bi çar kesan bû. Pinîkêrê bi çar kesan, li gellek deverên cuda yên welêt, bi awayê cuda dihat leyistin, gellek caran qaîdeyên li deverekê qedexe bûn, li devera din, xwediyên fonksiyoneke bingehîn bû.

Ji ber vê yekê, gava çar kes tên ba hevdu û dest bi leyiztika

pinîkêr dikin, dibêjin:

– Em li gor qaîdeyên kîjan deverê bileyizin?

Wî jî herî pirr bi pinîkêrê bi çar kesan dileyizt. Li hinek deveran îşaredayin û axaftin qedexe bû. Lê di leyiztika wî de, axaftin serbest bû. Ji ber vê yekê, axavtinên di pêvajoya leyiztikê de dihatin kirin, bi qasî leyiztikê bi wan xweş bûn. Henekên ku li ser maseya leyiztikê dihatin kirin, bi tu tiştî nedidan. Hezkirina wî ya li hember vê leyiztikê, pirsên di serê wî de pirrtir dikirin.

Xuya bû, ji bo lêkolîna li ser vê leyiztikê, xebateke ciddî û dûr û dirêj pêwîst bû. berê pirsên ku di serê wî de çêdibûn, sînore herêma wî derbas nedikirin. Ji ber vê yekê, leyiztika pinîkêr di wira de hefskirî dihişt.

– Gelo ev leyiztik cara yekem ji aliyê kîjan gelî ve hatibû leyistin? Ev hersê nav û gotinên din yên ku di leyiztikê de tên bikaranîn, aîdî kîjan zimanî bûn? Ji bo çî bi tenê Ermenî, Suryanî, Kurd û Erebên Mêrdînê bi pinîkêr dileyiztin?

Dû re bi şik ji xwe dipirsî:

– Gelo ev leyiztik li tu deverên din jî dihat leyistin?

Li gor wî şik jê dikir, belkî ev leyiztik li gellek deverên din jî dihat leyistin, lê ew jê ne agahdar bû. Her ku diçû, pirsên di serê wî de pirrtir dibûn. Ji bo çî di derheqa "Brîç" an leyiztikên din de pirtûk hatine nivîsandin, lê pinîkêr ji vê meh-rûm bû? Mîna hemû dîroka gelê xwe, di warê leyiztikên xwe de jî ji belgeyên nivîskî bêpar bû. Rastiya di vî warî de, hîn jî di tariyê de bû. Ewrûpî kultura leyiztikan ji nifşan teslîmî nifşan dikirin. Lê pinîkêr ji lêbixwedîderketineke weha bêpar bû. Liberketina wî, pirs çareser nedikir.

Gelo navbera nifşên nuh û pinîkêr çawa ye? Agahdariya wî ya ku di vî warî de hebû, ji bo bersiva vê pirsê têr nedikir

lê tiştê ku dizanîbû, ev bû; pinîkêr hîn jî bi nivîskî pêşkêşî civakê nebûbû.

Li gor wî, xususiyeteke din a vê leyiztikê jî ev bû ku ev leyiztik li bajaran dihat leyistin. Kesên ku bi eslê xwe gundî bûn û bi vê leyiztikê dileyiztin jî ya bar kiribûn û hatibûn bajêr û ev leyiztik li wir dîtibûn, ya jî pêwendiyên wan bi kesên ku li bajêr rûdiniştin pirr xurt bûn. Li gor wî, ji ber ku gelê Kurd, bi dû hemû gelên cîran re, dest bi jiyana bajarvantiyê kiribû, ew nikarîbû xwediyê yekem yê vê leyiztikê bihata hesibandin. Lê gava li hevalên xwe yên Bîtliisî yên ku hertim li bajêr rûniştibûn û ev leyiztik bi qasî wan baş dileyiztin rast hat, fahm kir ku tesbîtên wî yên di vî warî de bi tenê li bejna herêma wî tên.

Lê li gor wî, xwediyê wê yê yekem kî dibûya, bila bûbûya, ger gelê Kurd ji destpêkê an jî dû re fêrî vê leyiztikê bûbe, qet ferq nedikir. Kurd jî nuha bi vê leyiztikê dileyize, bi awakî xurt lê bi xwedî derdikeve û wek kultureke muşterek a gelên Mezopotamyayê didomîne.

Ev leyiztik di nav muhacîrên ji Mezopotamyayê, hatibûn welatên cuda yên Ewrûpayê jî, leyiztika herî sereke bû. Gotinên ku di pêvajoya leyiztikê de, dihatin bilêvkirin, mîna zîmanê pinîkêr ji aliyê herkesî ve dihatin parastin. Vê muşterekê, li gel gellek muşterekên din, Mezopotamyayî nêzîkî hevdu dikirin û pêwendî û girêdanên ku ji berê de, di navbera wan de hebûn, xurttir û dewlemendtir dikirin. Wî ev tesbîta xwe ji bo parastina xwe ya di warê pinîkêr de, gellek çaran bi kar dianî.

Gellek kesan ji ber hezkirina wî ya li hember pinîkêr, rexne lê digirtin û digotin:

– Tu hemû wextê xwe, bi pinîkêr derbas dikî û tu tiştêkî din nakî, ev ne tu sen’et e.

Pinîkêrleyistina wî û ji bo vê leyistinê gellek wextveqetandina wî, rast bû, lê wî rexneya ku dibêje; ” Tu hemû wextê xwe bi pinîkêr derbas dikî û tu tiştêkî din nakî” neheqiyek dihesiband. Wî ji bo îqnakirina xwediyê rexneyan, gellek zehmetî dikişand û carinan jî ji bo ku leyiztika pinîkêr bi wan jî bide qebûlkirin, dest bi pesnê pinîkêr dikir.

Heta carekê hingî pesnê pinîkêr dabû û behsa şiyana kesên ku bi vê leyiztikê dileyizin û pêwendiyên zanebûna di vî warî de û entellektuelbûnê kiribû, hevaleyê wî yê ku berê rexne lê digirt, lê piştî îzahata wî, nedixwest ji karwanê entellektuelan bi şûn de bimîne, ji bo fêrbûnê, jê tika kiribû. Wî ew danîbû ber xwe û bi cidiyeta mamosteyekî dest bi dersa pinîkêr kiribû. Bi îzahatên fireh û bi detay mêrik gêj kiribû. Mêrik xwe di dinyayeke xerîb de, bê nas his kiribû. Lê ew ji dersdanê qet of nebûbû û bi hilmeke fireh qaîdeyên leyiztikê yek bi yek jê re şerh kiribûn:

– Li min binihêre, ji bo vê leyiztikê mejiyekî baş şert e. Di vî tu ji destpêkê de bizanibî ku herkes nikare vê leyiztikê fêr bibe.

Mêrik ji destpêkê de xistibû bin tesîra xwe. Çavên mêrik fireh bûbûn, meraqa wî bêtir bûbû û ji ber peyva ku “herkes nikare vê leyiztikê fêr bibe” jî kêfa wî hatibû. Ji ber ku madem hevalê wî ew ji bo fêrbûnê qebûl kiribû, xuya bû ku ji mejiyê wî emîn bû. Wî dersa xwe, wek melleyê duwanzdeh-ilm dabû û ji hevalê xwe re bi sebireke mezin gotibû:

– Desteyê pinîkêr ji heştê kaxizan pêk tê. Ji nav çar desteyên kaxizan ku hejmara her desteyekî pêncû û dudu ne, hemû dehlib, keşe, keçik, lawik û beg tên neqandin. Di desteyê



yekî pinîkêr de ji her rengêkî bîst kaxiz hene. Di pinîkêr de.....

Herduyan jî bi heyecaneke mezin xwe dabû wezîfeyên xwe. Mêrik di nav dersa bingehîn de, wenda bûbû. Di destpêkê de rehet xuya bûbû û vê jî hewesa mêrik zêdetir kiribû. Mêrik carinan li benda wî nesekinîbû û bêyî ku dor hatibû-ya wan, mahneya hin gotinên ku gava li wan temaşe kiribû hatibûn bikaranîn, jê pirsîbû. Wî çî qas gotibû dê nuha dora wan jî bê, lê mêrik ji bo bersivê îsrar kiribû. Wî ev rewş bê dilî xwe bûya jî qebûl kiribû.

Hevalê wî gotibû:

– Nuha rehme li bavê te be, tu ji min re nabêjî, bê “saxkişandin” çî ye?

– Saxkişandin, begên ji derveyê qozkişandine.

– Beg? Ma di kaxizan de beg jî heye?

– Belê, em ji “as”ê re dibêjin, “beg”. Bega qoz, yanî asa qoz.

Hevalê wî îcar mahneya qozkişandinê pirsîbû:

– Ez bala xwe didimê, hun pirr behsa qozkişandinê dikin, ev qozkişandin, çî ye?

– Qozkişandin, bi bega qoz leyistin e.

Hevalê wî pirsên xwe rêz kiribûn:

– Mezinkirin çî ye? Texmîn çî ye? Bi usûlhatin çî ye? Çaqkirin çî ye? Eyne çî ye? Sedê began..... Şêstê keçikan..... Çilê lawikan.....

Wî her pirs bi kurtî bersivandibû.

– Em ji “mezinkirin”ê re dibêjin, di ser re girtin jî. Ev di leyiztika pinîkêr de qaîdeyeke bingehîn e. Gava yek bi kaxizekê daket, divê yê ku piştî wî bileyize, ger di destê wî de hebe, mecbûr e ku kaxiza ji ya li erdê mezintir biavêje. Texmîn

jî ev e; di desteyê pinîkêr de ji her rengêkî çar beg hene, ger hevalê te bega rengêkî kişand û di destê de du begên ji wî rengî hebin, tu dikarî bibêjî “texmîn”. “Bi usûlhatin”; gava yek ji hevalê xwe re bibêje, bi usûl were, wê gavê hevalê wî bi qozekî biçûk dileyize. “Çaqqirin” tê maneya ku gava rengê ku daket erdê bi mirovî re tunebe, mirov dê ji mecbûrî bi qoz bigre. Peyva “çaqqirin”ê bi me gellek leyiztikvanên pinîkêr nexweş e. Ji ber vê yekê, em dixwazin wê biguherînin û ji îro û pê ve ji berdêla “çaqqirin”ê, gotina “pêvedan”ê bi kar bînin. Eyne jî gava mirov dest dişkenîne, kaxiza herî binî ku diçe destê yê ku kaxizan belav dike ye. Sedê began..... Sed û pênciyê qoz... Heyştêyê keşeyan... Şêstê keçikan..... Çilê pinîkêr.....

Pirs û bersivan bi rojan dewam kiribûn. Êdî hevalê wî dev ji wî bernedabû. Lê wî jî pîrr dixwest hevalê wî fêrî vê leyiztikê bibe. Ji ber ku carinan sê kes digîhaştin hevdu, lê heta yê çaran peyda dikirin, çavên wan dirijîya. Bi armanca ku hevalê wî dikare carinan bûbûya yê çaran, di derheqa pinîkêr de çi dizanîbû pêşkêşî wî kiribû. Hevalê wî di demeke kin de, ne pîrr lê bi qasî ku yê çaran temam bike, fêrî vê leyiztikê bûbû. Lê tev vê jî wî ji leyiztika hevalê xwe zewq nedistend. Ger ne ji mecbûrî bûya, bi wî re nedileyist. Ji xwe wî ev leyiztik bi herkesî re nedileyist. Raqîbê wî jê nezantir bûya, ji wê leysistikê qet tu tahm nedistend.

Hem jî leyiztikê û hem jî ji muhabeta ku di pêvajoya leyiztikê de çêdibû pîrr hez dikir û qet nedixwest wê bi tu tiştî biguhere. Li gor wî, ya wan bi tenê hobîyek bû. Hobîyeke ku muhabet xweş dikir. Ne wek qumara Suleyman Xan û Haşmet Dîwan bû, ne wek rewşa “John Montagu Sandwich”ê

Îngilîz bû û ne jî dişîbiya tu danûstendinên din. Hobiyeke ku ji berdêla mirov jê şerm bikira, divê pê bipesîniya bû.

Leyiztikên wî qet ji bîra wî nedîçûn. Hema hema hemû leyiztikên wî dihatin bîra wî. Gava hinekan bigota:

– Ma nayê bîra bê me filan salê çî anî serê te?

Ji bo amadekirina bersivê, tavilê dipirsî:

– Ya li mala filankes?

Dû re jî dest bi îzahata sedemên têkçûna wê rojê dikir.

Heta carinan digot:

– Me leyiztik pirr bi rehetî derdixist, lê hevalê min qoz nehejmartibû û ji ber wê, çewt leyist. Bega qoz kişand û bega min xist. Ev jî bû sedema ku em bi bîst hejmaran têkevin hundur.

Gellek caran di nav xeyalên leyiztikên xwe de wenda dibû. Do ne pêr jî bera Zîwer û Hemoyî dabû. Gava Azadî behsa Zîwerî kir, ji nişka ve ketibû nav xeyalên wê leyiztikê.

Wê rojê ew, Zîwer, Heso, Simaîl, Ahmedê Mêqerî û Şêxoyê Dêrîkî bi hevdu re çûbûn mala Hemoyî. Gava deriyê asansorê vekiribû û derbasî korîdorê bûbûn, bêvila wan bi kombînezona hilma çend xwarinên cuda ve hatibû dagirtin. Kevaniya malê ya ku berê bi telefonê hatibû agahdarkirin, ji rewşa wan fahm kiribû ku ew şev dê şeva pinîkêr bûya. Li nûçeyên Merhabayê, wê radyoya ku ji terefê dewletê ve tete finansekirin û bi zimanê Tirkî weşanê dike, guhdarî kiribûn û beriya ku dengê radyoyê hatibû birrîn, Simaîlî bi xwe nikaribû û rahiştibû desteyê kaxizan û ew du caran şeh kiribûn. Hîn wan cîhên xwe baş xweş nekiribûn, kevaniya malê ya ku ji ber tecrubeya bi salan di vî warî de kone bûbû, ji wan re gotibû:

– Beriya ku xwarina we sar bibe, we xwarin bixwara, wê

baş ba.

Bi çavên xemgînî li hevdu nihêribûn û Simaîlê ku hertim diket xulqê Zîwerî û dibû sedema ku Zîwer hercar bi ser de bike birre birr, berê bi destê xwe yê rastê berçavika xwe ya ku li serê wî bûbû bela, rast kiribû û dû re kaxizên di destê xwe de bêdilî xwe danîbûn ser maseyê. Hemuyan bi situxwarî li destê kaxizên ku ji aliyê Simaîlî ve hatibûn lihevduxistin nihêribûn û mîna ku bibêjin “emrê me ji xwedê re”, derbasî metbexê bûbûn.

Maseya xwarinê bi tirşik, birinc, şorbeya nîska, bahcanên biraştî, zelete, dewê ku qeşa di nav de û nanê germ ê malê ve hatibû xemilandin. Simaîlî tev keda kevaniyê û mesrefa ku hatibû kirin ji bi çavên xemgîn û bê sebir mîna ku bibêje; “Ev xwarin nahêle em ji xwe re têr bi kaxizan bileyizin”, li wî nihêribû.

Wan xwarin bi lez xwaribû. Êdî nema hatibû îdarekirin. Li benda çayê jî nemabûn. Maseya metbexê paqij kiribû û dû re kaxizên pinîkêr danîbûn ortê. Kevaniyê li rewşa wan nihêribû ku ne yên îqnakirinê bûn, ji ber vê yekê gotibû:

– Bila firax bimînin, ez ê wan sibehê bişom. Lê ma hun ê çayê vexwin an qahweyê?

Hemoyê ku li welêt ji ber mamostetiya wî, jê re digotin “xoce”, bi lêvên xwe yên qalind, devê xwe yê mezin, biruyên xwe yên gûr û bi laşê xwe qelew girdo mirdo xuya dikir, ji nişka ve gotibû:

– Ez çayê mayê venaxwim. Ez ê araq xwe vexwim, ka bîne nuha cemidiye. Ez gava araqê vedixim, baştir dileyizim.

Hemoyî araq wek avê vedixwar. Ji xwe nema dizanîbû bê kîjan av e, kîjan araq e. Jiyana sirgûnê araqvexwarin kiribû xusûsiyeteke wî. Hevalên wî dikirin û nedikirin, nikarîbûn

ew jê vegeranda.

Hemoyî her digot:

– Ez dizanim bê ez çi dikim.

Hingî weha pîrr vedixwar, hevalên wî henek pê dikirin û digotin:

– Êdî ne hewce ye ku tu ji bo kîrîna araqê biçî “Systembolaget”ê, wê şîrketa dewletê ya ku araq lê tê firotin. Em ê xortûmekê ji dikanê bikişînin mala te û bila wek nargîleyê li ber te be.

Heta ku Hemoyî araqa xwe xwestibû û yên din jî daxwaza çayê kiribû, Zîwerî ji firsetê îstîfade kiribû û kaxiz çend caran li hevdu xistibûn jî. Gava yên din pê hisiyabûn, jê pîrsibûn:

– Destê kê ye?

Wî bi awakî ji xwe ewle gotibû:

– Ne destê kesî ye. Kaxiz li ortê ye.

Wê gavê wî xwe negirtibû û wek hertim bi munaqeşeyeke bê rawestan, ketibû qirika Zîwerî:

– Ê, madem kaxiz li ortê ye, ji bo çi te kaxiz şeh kirin. Me hîn tesbît nekiriye, bê kê dê bibe hevalê kê.

– A, va min danî. De ka bazar bikin.

– Tu hertim weha dikî. Ger te kaxiz şeh kirin, divê tu destê xwe jî bidî.

– Ê baş e, yabo, em careke din weha nakin. Xuya ye li ba we weha tê leyiztin, em ê li gor qaîdeyên we bileyizin.

Êdî ji hêrsa nema dizanibû bê wê çi bigota, ji bahca dikira biteqiya. Bi qehir û bi qêrîn gotibû:

– Lawo haho! Ji bo xwedê ma qaîdeyên ba me û yên ba we cîhê ne? Ma ne ez û tu ji eynî deverê nin. Ma me li eynî qahweyê hezar carî bi hevdu re neleyiztiye? Tu li xelkê weha

dikî, ma li me jî lawo. Çavên xwe veke!

Zîwer hatibû girtin, lê ez heyrana wî kesî bim ku bikaribe lê tesbît bike. Hemoyî dizanibû ku Zîwer dê qebûl neke û munaqeşe dê her weha berdewam be. Ji ber vê yekê gotibû:

– Ka bisekînin, lo! Me hîn dest pê nekiriye, hun dikin li hevdu bixin, îcar xwedê dizane bê hun ê di leyiztikê de çi bînin serê hevdu.

Wî bi çavên ku li alîkariyekê digeriyan, gotibû:

– Ma hun wî nabînin, bê çi dike?

Zîwerî xwe avêtibû ortê û bi edayeke wek hertim xwedêgiravî bi heq gotibû:

– Hun ji bo çi guhên xwe didin wî? Ew eşhed û billeh, dikare ji libik tirî mahsereyekê çêbike. Hema bila xwedê di orta me û wî de be. Ji bo xwedê wî çi got, qebûl bikin, bila devê wî bê girtin.

Wî teb'ê Zîwerî dizanibû, loma kiribû niçe niç û gotibû:

– Ê yabo, ez neheq! Ma ji xwe peyv bi te re nabe.

Zîwerî wek ku hertim dikir, vê carê jî tişt qebûl nekiribû û xwestibû dest bi leyiztikê bike û munaqeşeyê di wir de bido-mîne:

– Kuro, ma tu hatiye peyvê? Ger tu bi xwe bawerî, a va ye kaxiz û dest pê bike. Tu weha nikarî moralê me xera bikî.

Ew di ber xwe de keniya bû û gotibû:

– Gurrîko, navê min li te û kumê min li serê te!

Simailî xwedêgiravî ji bo çareserkirinê, lê ya rastî, ji bo tiştê Hesoyê birayê Hemoyî eşkere bike, gotibû:

– Van kaxizan rakin û yên ku Heso ji keştiyê kurrîbûn, bînin.

Hemoyî bi meraq jê pirsîbû:

– Ji bo çi yên Hesoyî? Çi hunera kaxizên Hesoyî heye?

Simaîlî bi ken û bi mahne gotibû:

– Yên wî, yê Estonyayê ne. Ma nayê bîra te ku ew sê meh berê çûbû Estonyayê? Gava vegeriya di keştiyê de kirrîbû.

Îcar Zîwerê ku kêfa wî ji guhertina mijarê munaqeseyê re hatibû, pirsîbû:

– Çi karê Hesoyî li Estonyayê hebû, lo?

Simaîl bi rehetiya yê ku gîhaştibû merama xwe, gotibû:

– Welleh, qet, bi tenê pratîk...

Zîwerî dîsa fahm nekiribû, ya rastî nexwestibû fahm bike.

– Pratîk?

– Belê, Pratîk. Pratîka zimên!

Meraqa Zîwerî bêtir bûbû.

– Pratîka zimên çawa? Ma Heso zimanê Estonyayî fêr bûye?

Simaîl êdî bi temamî gîhaştibû merama xwe. Di bin simbelan re keniyabû û gotibû:

– Ez êdî nizamim, ji wî bipirsin.

Wî rewş fahm kiribû û ji Simaîlî re gotibû:

– Lawo tu ecêb î! Te asoxî lawik hetikand. Ecêb nebû ku lêwik xwest carekê xwe ji te vedize û tiştêkî bike... De dev ji vê meseleyê berdin, lo!

Dû re berê xwe dîsa bi Zîwerî vekiribû û gotibû:

– Zîwer, ka ji xwe re hevlekî peyda bike. Tu kes nema dibê hevalê te jî. Ji ber ku kî dibê hevalê te, ew jî bi te re dihetike.

Zîwerî serê xwe kil kiribû û gotibû:

– Maşallah, devê te dîsa vebû, ha! Tu yê xwe peyda bikî, yê min rehet e.

Kaxiz danîn ser maseyê. Hessso gotibû:

– Min nehesibînin. Ger hinek betilîn, ez dikarim ji berdêla wan bileyizim, na na ez dixwazim îşev bi tenê temaşe bikim.

Piştî vê gotinê, ew û Simaîl bûn hevalên hevdu. Rakîbên wan jî Hemo û Zîwer bûn. Ji bo Ahmed û Şêxoyî gotibûn:

– Ahmed û Şêxo bila di dorê de bin. Zora kê biçê, ew ê rabe û Ahmed û Şêxo dê dewam bikin.

Û ji bo Hesoyî jî gotibû:

– Ew dikare xizmetê bike.

Hemoyî ji kevaniyê kaxiz û pênuşek xwestibû û gotibû:

– Bi xêra xwe ji me re kaxiz û pênuşekê bîne, ez ê hejmaran binivîsînim.

Çav li kaxizên ortê bûn û bi wî awayî dest bi bazarê kiribû. Zîwerî serê xwe bilind kiribû û ji hevalê xwe re gotibû:

Hevalo, tu bazarê ji min re bihêlî, ez ê dînê wan teneke bikim.

Wî gotibû:

– Bi pêncsedî, ji me re.

Lê Zîwerî lê zêde kiribû û gotibû:

– Bila bi pêncsed û dehan ji me re be.

Wî li hevalê xwe nihêribû, gava hevalê wî deyn nekiribû, cesaret stendibû û gotibû:

– Ma çi bi pêncsed û bîstan hatiye?

Zîwerî dîsa lê zêde kiribû:

– Pêncsed û sî.

Wî nema wêribû li Zîwerî zêdebikira û ji ber vê yekê, gotibû:

– Vekin!

Û bi pêncsed û sîyî li ser Zîwerî mabû. Diviyabû tev hejmar û kaxizên di leyiztikê de hatibûna qezenckirin, bi kêmanî pêncsed û sî hejmar dabûna ser hevdu. Ya na, ew ê biçû-



na hundur. Yanî hem dê hejmarên wan ên wê leyiztikê hatibûna xerakirin û hem jî pêncsed û sî hejmar wek deyn ketibûya situyê wan.

Wî dest bi dana kaxizan kiribû. Kaxiz pênc pênc dabûn. Hemoyî dê qoz çêkiribûya. Di destê herkesî de panzdeh kaxiz çêbûbûn. Pêncê dawiyê hatibû belavkirin. Bi vî awayî herkes diviyabû xwediyê bîst kaxizan bûya. Gava dor hat ser herpênc kaxizên Hemoyî yê destê dawiyê, wî ji Zîwerî pirsîbû:

– Tu ê destê dawiyê bidî hevalê xwe?

Zîwer ji ber heyecana ku ketibê û meraqa ku gelo hevalê wî qoz dîtibû an na, nema dikarîbû bipeyiviya, carekê xwezîya xwe daqurtandibû û dû re bi zorê gotibû:

– Erê.

Wî bi teb'ê Zîwerî dizanîbû, ji ber wê yekê, ew îqaz kiribû:

– Lê divê tu wek hertim nekeî, ha! Ger tu lê binihêrî, divê em jî wan bibînin.

Zîwerî di bin çavan re lê nihêrîbû û gotibû:

– Temam temam, tu ji xwe re li leyiztika xwe miqate be.

Dilê Hemoyê ku dê qoz çêbikira, kiribû te û rep. Pîrr tirsîyabû ku leyiztikê dernexîne. Loma Zîwerî halan di wî de hildabû û gotibû:

– Çi hejmar ketin destê te, deyne. Ez birayê te mim, ez ê li ser wan temam bikim.

Hevalê Zîwerî bi streseke mezin kaxiz yek bi yek kişandibûn, lê nihêrîbû û kiribû ufe uf. Di nav re jî gulpa xwe ya ji qedeha araqê îhmal nekiribû. Zîwerî bi çavên bi meraq lê nihêrîbû û gava deng ji hevalê wî derneketibû, jê pirsîbû:

– Dest çawa tê?

Hevalê wî bi awayekî bê hevî gotibû:

– Bi Xwedê, ger weha dom bike, xerab e. Min ji te re got, bazarê ji min re bihêle. Ji te heye ku ev leyiztik bi tenê bi kurrînê tê leyiztin.

Zîwerî bi bergerînî gotibû:

– Ma bîst hejmarên te jî tune ne?

Hemoyê ku kaxiz bi hêrs kişandibûn, qeherîbû û gotibû:

– Na kuro! Ma qey tu bawer nakî? Ger hebe, bila bi te bi-mîne, lo!

Zîwerî awayê xwestinê guhertibû:

– Ê baş e, keşe û keçikên nezewicî deyne. Va pênc kaxizên te li ba min ine, ez ê wan bizewicînim.

Hêrsa Hemoyî bi qedeha araqê jî daneketibû:

– Lawo, tune ye, tune ye! Ma qey tu fahm nakî?

Simaîlî bi qerf gotibû:

– Bi hevdu ketin, ha!

Zîwer pê re xeyidîbû û gotibû:

– Tu li karê xwe binihêrî.

Dû re zîvirîbû ser hevalê xwe.

– Ka deyne, ez wan bizewicînim, lo.

Ew bi halê Zîwerî keniya bû û gotibû:

– Çi xwe zewicandiyê, îcar dora keşe û keçikan e!

Zîwerî ji Hemoyî re gotibû:

– Tu li wî guhdarî mekî, bila heta sibehê bipeyive.

Simaîlî ji wî re gotibû:

– Hevalo, dev ji wan berde, guneh in. Ma tu lê nanihêrî ku ew bi hevdu ketine?

Hemoyî di bin çavan re lê nihêrîbû û di ber xwe de gotibû:

– Tu çi xwedanxêr î, lawo!

Simailî disa qerfê xwe kiribû:

– É lawo, xêr jî bi we nabe.

Zîwerê ku destê wî ji heyecanê ricifibû, ji wî pirsîbû:

– Eyna te çi bû?

Ew keniyabû û ji hevalê xwe re gotibû:

– Hevalo, guhdarî bike, îcar li ser eyneyê man in.

Zîwerî bi hêrs gotibû:

– De ka bibêje! Divê heta ku qoz neyê gotin eyna te ji erdê ranebe.

Ew dîsa ketibû xulqê Zîwerî:

– Îcar li mahneyan digere, ha!

Zîwer bi hevalê xwe biliyabû û dev ji eynê meynê jî berda-bû. Qoz hatibû gotin bi herduyan du sed û bîst hejmar hatibû nivîsandin. Zîwerî dest bi hesêb kiribû. Ji bo vê, ji hevalê xwe pirsîbû:

– Sax û qoz çawa nin?

Hevalê wî bi awayekî ji xwe ne ewle, gotibû:

– Çend saxên min hene û qoz jî ne xerab e, lê nizanim...

Zîwerî hesabê xwe domandibû:

– Çilê pinîkêr û şêstê keçikên min... Yê te çi qas bû?

Hevalê wî dîsa li destê xwe nihêrîbû û gotibû:

– Yê min jî bîstê maçayê û sedê began.

Wê gavê Zîwerî gotibû:

– Bû du sed û bîst. Ma sê sed û deh. Ma tu dibêjî çi, em ê bikaribin derxîne? Sax yên me ne, lê zehmet e. Ma qozê te pirr xurt e?

Mirovî digot, qey hevalê wî ji qazî dilê wî rehet nedikir.

– Yaho, xurt çawa... normal e. Ger yê te jî baş be... belkî...

Herkesî hejmarên xwe ji erdê rakiribûn û dest bi leyiztikê kiribû. Êdî bi hemû awayî konsantreyî ser leyiztikê bûbûn.

Dengên leyiztikvanan tev lî hevdu bûbûn. Herkes ji aliyê xwe ve, bi awakî peyivîbû:

– Saxê xwe bikşîne. Ger nema qoz jî bikşîne!

– Bi usûl were ba min.

– Ger tu nikaribe “çaqa” wî bidê.

– Ma tu nikarî mezin bikî?.....

Zîwer ji nişka ve piçekî rawestiyabû û ji hevalê xwe pirsîbû:

– Ma destê te sax dibe?

Dû re beriya bersiva hevalê xwe, fikra xwe guherandibû û ji hevalê xwe re gotibû:

– Qoz bikşîne, qoz!

Hevalê wî kiribû ufe uf, du hilm li çixareyê xistibû û jê re gotibû:

– Tune ye, welleh tune ye!

Zîwerî nexwestibû bawer bike:

– Kuro, ez dibêjim bikşîne, dibêje tune ye.

Hevalê wî êdî jê tije bûbû:

– Lawo, tune ye, ha! Ma em ji te re Hemê Mûsikê dibêjin? Te du dest belaş dan wan, îcar tu nuha, tu li saxbûna destê min digerî.

Derxistina pênc sed û sîyî her çûbû zehmettir xuya kiribû. Çewtiyeke herî biçûk dikaribû hemû hêviyên di warê derxistinê de têk biribûna. Heyecaneke mezin ew dabûn ber xwe. Heyecana yên li dorê, ji ya leyiztikvanan bêtir diyar bûbû. Herkes li ser leyiztikê konsantre bûbû. Ji derveyî leyiztikê tu tişt nehatibû fikirandin. Di mejiyê Zîwerî de rengên kaxizan li bin guhên hevdu ketibûn. Devê wî zuha bûbû, destê wî lerizîbû. Ji xwe û hevalê xwe pê ve tu kes nedîtibû. Bi pirsan hem xwe û hem jî hevalê xwe gêj kiribû. Zîwerê bi yekcarî

ketibû tev, tew qedeha çayê ya ku kevaniya malê danîbû ber wî jî nedîtibû û gava bi destê xwe yê rastê kaxiza ku dê avêtibûya erdê, bilind kiribû, destê wî li qedeha çayê ketibû û bi ser maseyê de rijandibû. Hemoyî devê xwe tije kiribû ku paçîkekî bixwaze, lê Zîwerî ji ber tirsê ku heta paçîk hatibûya, dê mahta wan sar bûbûya, guh nedabû nuhbûna cakête xwe û milê cakêti di maseyê dabû. Herkes şaş mabû. Zîwerî jî nema dizanîbû, bê çî kiribû. Simaîlî debar nekiribû û jê re mesela herçar kesên bi pokêr leyiztibûn, gotibû:

– Zîwer, te jî wek wan herçar kesên ku bi pokêr dileyiztin, kir. Çar kesan bi pokêr dileyizt. Perekî pîrr mezin di ortê de bû. Yekî got; “rest”, yê din hîn difikirî. Yekî din got, terp û ket û mir. Dilê wî ji heyecana leyiztikê sekinîbû. Hevalekî wan pirsî, got; “Em çawa bikin?” Tew tu kes li termê li ser maseyê bû, nedifikirî. Yekî ji wan, ji bo ku leyiztik nesekine û maht sar nebe, ji wan re got; “Heftlib û heştliban jê derxîne, da ku em hersê bikaribin dewam bikin”.

Hemû bi hevdu re keniyabûn, lê Zîwer sor bûbû û çavên wî nema kaxiz jî ditibûn..

Di nav re çûbû. Tew Azad û teklîfa Azadî ji bîr kiribû. Ger Azadî ew şiyar nekiribûya, dê hemû leyiztikên wê şevê ji nû ve bijiya. Lê bi xêra Azadî, li xwe hay bû.

Azadî jê pirsî:

– Xuya ye guhên te ne li min e. Dîsa çî bi te hatiye? Ma tu ji teklîfa min re çî dibêjî? Tu ê bê an na?

Ji bo ku Azadî ew ji xeyala pînîkêr şiyar kiribû, hebekî aciz bû û dilê xwe de got:

– Ev Azad jî nahêle ku mirov ji xwe re têra xwe bifikire. û dû re berê xwe bi Azadî vekir û got:

– Welleh, sipas. Bila bimîne rojêke din. Zîwerî hîn du roj berê, li mala Hemoyî dersa xwe stend. Nema tê bîra min, bê me çend çaran bera wî û Hemoyî da. Ew wek hertim dîsa pîrr qeherî û bela xwe hem di hevalê xwe û hem jî di me de da. Heta carekê kaxiz ji destên xwe avêt û got ; “Ez nema dileyizim”. Em hemû li ber geriyan û asoxî me ew razî kir. Lê di dawîya leyiztikê de, dîsa qeherî û hertişt kir sûcê Hemoyî û sûnd xwar ku ew ê di pinîkêr de, careke din hevaltîya Hemoyî neke.

Azadî xwe negirt û avêt ortê:

– Ez dibêjim, belkî ew ji leyiztika wê bêtir, ji gotinên we aciz bûye û nuha ji bo heyfhilanînê jî li her deverê li we digere.

Ew li ser vê peyvê kenîya û got:

– Ez vêya dizanim, lê ji bo ku ez dilê wî rehet nekim, ez ê heta çend rojên din jî xwe rê wî nedim.

Anonsa trêne axavtina wî birrî, lê piştî anonsê dîsa dewam kir:

– Kuro, ma tu nizanî bê ew çawa ye? Gava ku carekê çûk li kevirê wî bikeve û desteyekî bera mirovî bide, kî dikare wî rawestîne. Ji xwe, yê wî hertim weha ye; kevirê wî tu carî bi zanebûn li çûkan nakeve, lê çûk tên li kevirê wî dikevin. Wê carê jî gava em dibêjin; ”Ka were, em careke din bileyizin, lingên xwe yê rastê diavêje ser yê çepê û kil dike û dibêje: “Herin ji xwe re fêrî vê leyiztikê bibin û dû re werin.” Welleh bi peyvê be, em kêş pê nikarin.

Zîwerî xwe pîrê pinîkêr dihesiband. Pîrê li sirgûnê. Ji ber ku ew bi eslê xwe, ji Dêrika Çiyayê Mazî bû jî di vî warî de payeke bilind dida xwe. Heta, Derîkîbûna gellek kesan ger bi henekan bûya jî diviyabû ji aliyê wî ve bihata tesdîqkirin.

Ew tu carî qebûl nake ku kesek dikare jê baştir bileyize. Ev hêla wî ya herî qels bû. Gellek caran di leyiztikê de, şiyana yê li hember xwe biçûkdîtin, dibû sedema têkçûna wî. Lê wî ev qet qebûl nedikir û ji çewtîtiyên xwe bêtir, xwe li ser yên hevalê xwe konsantre dikir.

Azadî lê nihêrî ku niyeta wî tune, weha got:

– Ê, tu dizanî, birako. Tu bihata, wê xweş ba, lê xuya ye tu îro ne musaît e û ya rastî, tu naxwazî dilê Zîwer û Hemo-yî rehet bikî. Wê gavê, bila bimîne rojeke din.

Azadî xatir jê xwest û di îstasyona pêşî de daket. Dû re deriyê trêne hatin girtin û du pîrekên ku bi bazdan, ber bi trêne ve direviyan û negîhaştin trêne, li ber deriyê trêne rawestiyên û bi kerb lê nihêrîn. Lê trêna ku li gor qaîdeyan diherikî, li hisên mirovan guhdarî nedikir. Du alkolistên bi vir de û wê de kil dibûn, ji trêne re şûşên xwe kil dikirin...

Tev li ku gellek cîhên vala çêbûbûn jî gellek kesan qîma xwe bi rûniştinê neanîbûn û li ser piyan rawestiyabûn. Pir-raniya mirovan ya bi rojnameyekê ya jî bi pirtûkekê mijûl bûn. Di destên gellekan de, rojnameya Metroyê ya rojane ku di navbera duşem û îniyê de belaş dihat belavkirin, hebû. Yekî xwe li ber rojnameya ku di destê jinikekê de bû xwar kir û dest bi xwendinê kir, lê gava jinikê bi awirên nedostane lê nihêrî, wek yekî ku sûc kiribe, berê xwe da pencereya vagonê. Hinekan jî bi çavên bi meraq ve li hevdu dinihêrîn, lê gava yên ku lê dihat nerîn, pê dihisiyan, wan jî çavên xwe dadigerandin û xwe bi tiştêkî din mijûl dikir. Li cîhê ku îşareta seqetan lê xuya dibû û ji bo seqetan hatibû veqetandin, mirovekî pirr saxlem rûniştibû, lê gava di îstasyona pêşiyê de, yekî seqet siwar bû, yê saxlem bi alîkariya îşareta hevalê

xwe ve, ji nişka ve rabû ser xwe û cîh da yê seqet. Li reklamên ku li hundur trêne hatibûn daliqandin, temaşe kir. Hemû reklam yek bi yek xwendin. Lê xwe ji bîr kiribû û ji îstasyona ku diviyabû lê daketa bihurî.

Gava trêne sekinî, wî li dora xwe nihêrî û lewha ku navê taxê li ser bû, xwend; "Hötorget", yanî "Meydana Kayê". Li wir, ji trêne daket û ber bi meydanê ve, bi pêlikan ve hilkişiya.

Meydanên weha li gellek bajarên mezin ên Ewrûpayê hene. Ev meydan di dawîya sedsala hîjdehan de, bazara ku gundiyên ku li bakurê Stockholmê rûdiniştin bû. Lê piştî ku biyanî bûn perçeyekî girîng ê vê civatê, êdî rengê Meydana Kayê jî hat guhertin û nuha mîna sûkeke rojhilata navîn xuya dikir. Ji xwe, gava Swêdî jî dihatin vê sûkê, xwe li welatekî din his dikirin. Hertişt bi wan xerîb dihatin xuyakirin. Ji malên ku li wir dihatin firotin û heta awayê firotinê, hertişt pirr cuda bûn. Hemû firoşer jî biyanî bûn; mirovên ji welatên cuda yên Amerîkaya Latînî, ji Hîndîstanê, ji Afxanîstanê, ji Etyopyayê, ji Bengladeşê, ji Sûriyeyê, ji Kurdistanê, ji Tirkîyeyê û hema ji her deverên dinyayê...

Li wira, berhemên kulturên cuda, dihatin pêşkêşkirin. Hem ji aliyê qelebalixbûnê, xir û cirê û hem jî ji aliyê awayê danûstendina ku bi muşterîyan re dihat danîn ve, nedişîbiya sûkên welatên rojava. Ji nişka ve, ji hisa biyanîtiyê xelas bûbû. Hertişt mîna yên welatê bav û kalan, dihatin xuyakirin.

Porên pirraniya mirovên ku li wira diçûn û dihatin, reş î qîr xuya dikirin. Xwe li erdekî nas his kir, hilma wî hat ber wî û bi hêviya ku yekî nasê xwe bibîne, li dora xwe nihêrî, lê di wê qelebalixiyê de dîtina kesên ku mirov lê digere, ne hêsan bû. Wî dev ji lêgerîna dostan berda û ji bo derketina



ser cadeyê, lezand.

Avahiya sînemayê rengeke din daye meydanê. Ji ber yekê bi şev, piştî karberdanê jî meydan şên bû. Bi avakirina Filmstaden Sergel a ku ser Hötorgshallenê hemû girtiye jî mozaîkeke hîn dewlemendtir reng daye meydanê.

Li kêleka meydanê "Konserthuset" mîna sitareke meydanê xuya dikir. Berê xwe da avahiya wê, ji rengê wê yê şînê gemarî heybet girt. Bi heybetê re, hiseke hurmetê jî pê re peyda bû. Avahiya ku ji salê carekê di dehê Çileyaya Pêşîn de, çavên dinyayê dadigerin ser wê. Stîleke klasîk. Esera Ivar Tengbom. Mîmarê ku ji romantîzma neteweyî, klasîzma nuh heta fonksiyonalîzmê, stîlên cuda cuda bi kar anîne. Mirovê ku piştî berhemên xwe yên ku wî di dema nuha de jî didin jiyandin, li dû xwe hiştin, di 1968an de, gava nodsali bû, çavên xwe li dinyaya gewrik girtibûn.

Her cara ku dehê Çileyaya Pêşîn tê, Konserthusetê ku di 1926an de hatiye avakirin, bi saya xelatên Nobêl, dikeve rojê dinyayê. Dinya wê rojê dibe şahidê ku xelatwergirên Nobêl ji destê qiralê Swêdê xelatên xwe werdigrin. Bi hezar û şeşsed kursiyên xwe ve meydana gellek bûyerên dinyaya kultur û huşê. Dîsa serê xwe bilind kir û li bilindahiya wê temaşe kir.

Di dilê xwe de got:

—Bi qasî ku şewqê mirovî ji serê mirovî bixe, bilind e.

Û nêzîkî li pêlikên wê yên ku li ber derî bûn, kir. Li ser pêlikan, mirovî ax biavêta li erdê nediket. Xortekî reşik î Afrîkî ji derencekan daket xwarê û xwe ji nişka ve çeng kir himbêza yeka por zer î pantolonkurt a ku ji nava qelebalixiya ku ji aliyê îstasyona trêne dihat. Yê reşik ew bilind kir û piştî ku du cara li dora xwe zîvirand, danî. Heta ku ew li ava-

hiyê zîvirî jî hîn devên wan ji hevdu derneketibû.

Jineke çavşîn î poz bi xizêmî ku porê xwe reş boyax kirîbû, li ser derenceka duyem li ser piyan sekinîbû. Kufe kufa çixareya jinika ku ji her halê wê xuya bû ku çavên wê li rêya hezkiriyê wê bûn. Jinikê geh li saeta xwe dinihêrî û geh li qelebalixa ku ji aliyê îstasyonê dihat dinihêrî.

Li ser derenceka herî bilind, keçek di himbêza xortekî de, bi awayê ku herdu lingên xwe li nava wî pêça bûn, rûniştibû. Wan têkiliyên xwe û civata renga reng a li wê deverê birrîbûn. Dinya dabûn aliyekî û devên wan di devên hevdu de û ew dinyaya xwe ya ku bi tenê ji herduyan pêkhatî de di nav hisên xwe de vedigevizîn.

Xuya bû ku gellek ji wan mirovên li wê derê, ji ber tirsê qula ku di tebeqeya ozonê de hatibû vekirin, dê mezintir bibê, erebeyên xwe li malê hiştibûn û tev li karwanê trafîka kollektîv bûbûn.

Yekî ku ji her halê wî xuya bû ku ne ji Stockholmê ye û çenteyek di dest de bû jî ji kalekî Swêdî navnîşana deverêkê dipirsî. Gellek kesên din jî li ser pêlikên "Konserthuset"ê, bi îştahê mezîn bi qerta diçûn kebabên ku di nava nanên tenik de bûn. Gava ew di ber wan re derbas bû, tev ku dizanîbû ew û Serhat dê bi hevdu re firavîne bixwin jî dilê wî bijiya kebaban. Ji bo biryardayînê çend saniyeyan rawestiya; tu nemabû ji bo xwarina kebaban, paş de vegeriya, lê dû re biryara xwe guhert û li dora heykelê ku bi navê Grûpa Orfeus ku li pêşiya pêlikan hatibû danîn, çû û hat. Geh jê vedikişiya û ji dûranê lê dinihêrî. Geh xwe nêzîkî heykêl dikir û nivîsên li ser hatibû nivîsandin, dixwend. Piştî ku Navê Carl Milles, heykeltiraşê ku li gellek bajarên din ên Swêdê bi berhemên xwe ve dijî, xwend, ji bo kirîna rojnameyê, meşa

xwe ya ber bi cadeyê ve domand.

Wî dikarîbû rojname li cîhekî din jî bistenda, lê wî jî niza-nîbû, bê ji bo çî, bi tenê ji bo kirîna rojnameyê berê xwe dabû "Kungsgatan"ê. Xuya bû hezkirina wî ya li hember vê cadeyê, ew ji bo tiştên ku dikarîbûn li deverên din jî peyda bibin, ber bi wê ve diajot. Li "Konserhuset"ê zîvirî û li ser peyarêyê, li ber lampa ji bo derbasbûna peyayan rawestiya û pê li bişkoka lampê kir. Serê wî di ber wî de bû û difikirî. Bi qarîna ambûlansekê serê xwe rakir. Ambûlans, ereba doktor, polîs û îtfaiye li dû hevdu, bi lez dihatin. Dengên wan sawek dixistin dilê mirovan. Bi dengên wan re, hemû erebeyên li ser rê bûn, xwe ji nişka ve dan kêlekê û ji bo derbasbûna wan rê vekirin.

Li nûçeya do ku ji televîzyonê guhdarî kiribû, fikirî. Li bajarekî Tirkiyeyê ku navê bajêr baş nedihat bîra wî, agir bi xaniyekî ketibû û ji bo vê erebeya îtfaiyeyê, berê xwe dabû wê taxa ku xanî lê bû. Îtfaiyeyê ji bo rê xwestinê, sîrena xwe bi dilşewatî lê dixist, lê tu erebeyên ku di trafikê de bûn, qet guh nedidan dengê sîrenê. Dîreksiyon vir de û wir de, zîvirandina şofêr jî kar nekiribû. Îtfaiye piştî çend saetan, xwe bi zorê gîhandibû taxê, lê heta îtfaiye gîhaştibû cîhê veinirandinê, tu tiştêkî ku bişewitiya nemabû. Ava wan di kîsê wan de mabû. Xuya bû ku ew av ji gellek deverên din jî bi vî awayî bi şûn de vejeriyabû.

Serê xwe kil kir û li ferqa ku di navbera herdu welatan de hebû, fikirî. Dû re li welatekî weha, hinek tiştên din hebûn ku qet ber bi serê wî ve nedîçûn. Çar salên wî di apartmana ku tê de dijiya, qediyabû, lê hîn ji pirraniya cîranên xwe, silav wernegirtibû. Carekê bi tesadufî, ew û cîraneke xwe, di asansorê de pêrgî hevdu hatibûn, lê jinikê heta ku asansor li

qatê wê sekinîbû, ziq li ber xwe nihêribû.

Tew hedîseya ku li metroyê çêbûbû, ev welat bêtir li ber çavan reş dikir. Li metroyê, li pêş çavên gellek mirovan, yekî jinikek bi zorê zevt kiribû û ber bi quncikekê ve ajotibû. War wara jinikê bû. Jinikê bi çavên bêhêvî, li mirovên ku li wan temaşe kiribûn, nihêribû. Mirovên bêreaksiyon... Mêrik li pêş çavên hemûyan tecawuzî jinikê kiribû û tu kesî dengê xwe dernexistibû. Dû re referiya mirovên ku bûbûn şahidê wê bûyerê û laqaytmayina wan, ji aliyê gellek pisporan ve di medyayê de jî hatibû munaqesekirin. Xuya bû ku civat jî ji vê rewşê ne razî bû û ji bo sedeman serê xwe pirr diêşand.

– Gelo sedem çi bû?

Firseta ku ew bikaribe li bersivê bifikire, bi dest neket. Wî dixwest, van herdu dinyayên cuda, bi gellek awayên din bigerde ber hevdu, lê lampeya kesk pêketibû û peyayên dora wî ji bo derbasbûnê lezandibûn. Wî jî muqayesekirin hişt rojeke din û da pê wan.

Gava derbasî aliyê din î cadeyê bû, çavên wî bi polîsekî ket. Ew ji dervayî îrada xwe li huwiyeta xwe fikirî û destê wî ji nişka ve çû ser bêrika wî ya ku huwiyeta wî tê de bû. Dû re hat bîra wî ku ew li welatekî din e. Dema nuh hatibû, ev tesîr xurttir bû. Wê gavê hîn tesîra girtin û lêdanên li girtîgehê, ji ser xwe neavêtibû. Ev tesîr hîn jî dom dike, lê ne bi wê xurtiya xwe ya berê. Piştî ku pasaport wergirtibû jî di xewna xwe de, li bajarê xwe, ji aliyê polîsan ve çend caran hatibû girtin. Gava polîsan huwiyeta wî jê xwestibûn, destê xwe avêtibû bêrika xwe, lê hercar pasaporta wî ya penaberiyê derketibû. Ew li vêya pirr şaş mabû û wî ji xwe re weha gotibû:

– Ma qey ez dîn im? Ma mirov bi vê pasaportê tê vê derê? Ma ez ji bo çî hatim vê derê?

Her ku pêvajoya xewnê dirêj dibû, pirsên wî jî dirêj dibûn. Lê gava ji xew şiyar dibû, didît ku li Swêdê ye û ne li ba polîsan e, hilma wî dihat ber wî, rengê rûyê wî vedigeriya, lêdana dilê wî normal dibû û xwe li ser piştê, li ser nivînê xwe bi kêfxweşî dirêj dikir.

Pêvajoya ku ew jiyabû, zû bi zû nedihat jibîrkerin. Bêşik, tesîra vê pêvajoyê, dê li ser pêşeroja wî û reftarên wî yên li civateke normal, her berdewam be. Ma ew ê çawa sirûdên leşkeriyê; cop û şûşeradanê; di pîsiyê de dakirinê, mûm xwarinê; di kel kela germa havînê de bi lingên xwas, li ser çîmentoya ku wek êgir bi saetan rawestandî; bi laşê tazî li ser wî agirî, bi zikkişkê çûyin û hatinê; çar çixare bi hevdu re kişandinê; çixare bi qûnê kişandinê; cezayê hucreyê; lêdana piştî ziyaretan û li gel îşkenceyên psîkolojîk, gellek awayên din ên îşkenceyê ji bîr bike? Ew ê çawa bikaribe wan mêrxasên ku di nav destên dijmin de, bi qasî misqalekî hesabê mirinê nedikirin, ji bîr bike?

Di her rewşê de, ji bo li ser lingan mayinê, hêviya xwe parastin, şert bû. Wî hem di girtîgehê de û hem jî piştî cezaxwarinê, di hefsê de, qelsbûna wan kesên ku li hêviyê baş miqate nebûbûn û rehê dawî yê hêviyê jî di dilê wan de zuha bûbû, bi çavên xwe dîtibûn. Di wê pêvajoyê de, hêvî û reftarên ku awa û karakterên wan ji aliyê bihêvîbûnê ve dihatin tayinkirin, li hember dijmin sitûna herî xurt a ku mirovî dikarîbû piştî xwe bidayê û neketa xwarê, bû.

Piştî cezaxwarinê, ew ji girtîgehê biribûn hefsê. Hefs li gor girtîgehê, rehetir bû. Cezayên wan hindik mabû. Di hefsê de jî hêvî ji destê xwe bernedabûn. Gotinên hevaleyê xwe yê

hefsê ku di eynî wextî de pismamê wî bû, qet ji bîr nedikirin. Tev li ku pismamên hevdu bûn jî wan ji aliyê naverokê, hevalbûn bêtir tercîh dikirin.

Rojek ji rojên cejna Ramazanê bû. Ji bo xatirê cejnê, destûra girtî û kesên ku ji bo ziyaretê hatibûn, dikarîbû li ba hevdu rûnin û li gor rojên din ên ziyaretê, xwedêgiravî hîn azadtir bipeyivin, hatibû dayin. Ji ber ku halê malbatê yê aborî ne baş bû, bavê wî wê carê nehatibû ziyareta wî. Jina hevalê wî hatibû ziyareta wan. Ji ber wekhevbûna paşnavên wan, yê dihatin ziyaretê, dikarîbûn ew herdu bi hevdu re ziyaret bikirana. Hersê bi hevdu re rûniştibûn. Hevalê wî ji jina xwe re weha gotibû:

– Êdî esasê me ne li ser kayê ye. Me hêvî çandiye, delala min, hêvî. Bifikire delala min, ger rojekê li vî welatî jî roj hilê... ger rojekê dilên mêrxasên ku di rêya mayinkirî re, bê tirs bi hevdu re lê bixin... Ax bifikire, delala min, bifikire! Ger tu nikarîbî bifikirî jî xeyal bikî. Ger hêviyên me şîn bên, delala min, em ê wê gavê ewrên herî talî yên ku ji ber tarîtiyê mane jî biqewirînin û çirûsk bi çirûsk li her deverên welêt belav bibin. Em ê xwe bera deşta Haranê, wê mahzûbana comerd a rojê bidin. Em ê ji wir berê xwe bidin hênkayiya Dêrika Çiyayê Mazî, em ê xwe li darên zeytûnan bigrin. Em ê li ser bircên Amedê bîhna dîrokê bikşînin pişikên xwe. Em ê bi şopa berxwedana Koçgiriye, ber bi bilindahiya Araratê ve bifirin. Û ji wira, delala min, em ê xwe li çiyayên dost, çiyayên bi xwîne avdayî, çiyayên Dersimê bigrin. Delala min, em ê...

Hevalê wî dawî neanîbû. Çavên hersiyan jî hêsir barandibûn. Hêsiyan hêvî av dabûn. Hêvî ji nuha ve di dilê wan de zîl dabû. Hêvî girêdana wan î herî mezin a bi jiyane ve bû.

Hersiyan bi ewrên reş î tarî, êş û kul û bi çavên şil yê di deryaya hesretê de dakirî ve, tabloyek pêk anîbûn.

Tablo hat ber çavên wî, çavên wî hingî tije bûbû, tablo jî di nav xumamê de mabû.

Dikira li bin guhê yekî biketa. Mêrik mîna ku bibêje, “ma tê xêr e?” weha bi çavên ecêbmayî lê nihêrî. Ew jî şaş ma. Ji fediya û şaşbûnê rê ne bir ser gotina “bibuhure”. Mêrik heta çend metreyan jê bi dûr ket jî bi hêrs li dû xwe nihêrî. Ancax gava pira li ser cadeyê li pê xwe hişt û êdî bi temamî ji tesîra hem bûyera ku ew xemgîn kir û hem jî ya mêrikê ku ji ber wî veciniqî û xwe da alî, rizgar bû. Li dora xwe nihêrî. Berê weha fikirî ku hewa vî beşê Kungsgatanê yê ku ber bi Östermalmê dirêj dibe, ji ya ku xwe dirêjî ser Vasagatanê dike, xwestir e. Lê dû re fikra xwe guhert û kêfa xwe ji herdu beşan re jî anî.

Wî ji hemû cadeyên Stockholmê, bêtir ji Kungsgatanê hez dikir. Ji asfalta wê ya reş î qîr, ji ronahiya wê, ji qelebalixiya wê ya ku qelabalixiya Drottningsgatan a ku muzeya August Strindberg jî dide ber xwe û heta Kungstengsgatanê dirêj dibe bi ser de tê û ji sînemayên wê yê ku mirov li ber afîşên wan ên daliqandî bi heyecan rêz dibûn, hez dikir. Gellek ji bo vê xeta ku ji aliyekî ve hilma navenda trêne ji Vasagatanê werdigre û dighîne Hötorgetê û ji aliyê din ve jî Kungsholmen û Normalmê bi hevdu girê dide dibêjin, bêhna Berlîn, Şîkago û Manhatanê jê té. Gava di Mijdara 1911an de cara yekem ji bo trafikê hat vekirin, kêfa rûniştvanên bajêr pîrr hatibû û ji wê rojê û heta nuha jî bi vê kêfa xwe hîn jî şad dibin.

Li ber vîtrînên dikanekê rawestiya. Li hinek tiştan bi meraq temaşe kir. Dilê wî xwest têkeve hundur, gava xwe di derî re avêt hundur, lê dû re ji nişka ve biryara xwe guhert û

bêyî ku xwediyê dikanê pê re bigihêje, devê xwe veke û jê re bibêje “kerem bike”, di derî re derket. Rojnamefiroş li aliyê din î cadeyê bû. Bi hêsanî derbasî aliyê din bû. Rojnameyên gellek welatan li wira dihatin firotin. Piştî Hurriyet, Polîtîka û Cumhuriyeta hefteyî tev kovarên ku îlaweyên wê bûn, kirrîn, berê xwe da East Noodlesê, cîhê civanê.

Bi rê ve de, li rubrîkên rojnameyekê nihêrî: Sê cînayetên qesasnediyar...

Ber çavên wî reş bûn û kulên wî dîsa hatibûn tevrakirin.

Ji mala wî jî herdu birayên wî û xwarziyekî wî bi ser hevdu de hatibûn qetilkirin.

Jiyana sirgûnê dest û lingên wî girêdabûn. Xwe di rewşeke xerab de didît. Xwe di hundurê xwe de dixwar. Diheliya, carinan dibû wek lepekî. Bûyerê ew bi temamî xistibû atmosfera xwe.

Serê sibehekê bû.

Birayê wî ji birayê xwe yê din û xwarziyê xwe re gotibû:

– Bilezînin, em ê dereng bimînin, ha!

Mirinê feqa xwe vedabû.

Hovîtî ji bo daqurtandina sê canên teze ku jiyana jê difûriya, di kozikê de bû. Nefesa mirinê taxa wan dagirtibû. Hersê hêviyên pêşerojê, ji feqa vedayî ya îxanetê bêxeber, taştê bi lez xwaribûn, destê diya xwe û bavê xwe maçî kiribûn û ji bo diyariyan soz dabûn zarokên malê û sînga xwe raste rast ji mirinê re vekiribûn.

Hewa vekiribû.

Tîrêjên tavê di ser serê hersiyana re, mîna ku bixwazin tiştêkî bibêjin, sînyalên ezmên didan dinyayê. Lê ew jî di warê xerakirina feqa îxanetê û şiyarkirina hersê dilên bi kêf û hêviyê ve hilmiştî de bi ser neketibûn.



Teqînên bêhejmar dinya bi derbeke reş û tarî kiribûn. Sê dilên bi hevdu re lê dixistin, bi sê cotên çavan ve cara taliyê li dinyayê temaşe kiribûn. Li dû wan sê jinên sitûxwar û heft zarokên sêwî... û dê û bavên ku dê vê kulê heta gorê bi xwe re hilînin...

Heta jinekê got “kesk e, divê tu derbas bî”, hîn nuh li xwe hay bû. Derbasî aliyê din bû. Germahî nema dihat îdarekirin. Serê xwe ber bi tavê ve bilind kir, ji şewqê çavên wî hatin girtin. Li ser peyarêyê hebekî rawestiya. Li mirovên bi lez diçûn û dihatin, temaşe kir. Dest bi meşê kir. Xwe dîsa ji bîr kiribû û bi qasî du sed gavan jî ji Kungshallenê derbas bûbû. Ferq kir ku zêde çûye. Rawestiya. Jê hebekî wê de bankomatekê bi rengê xwe yê şîn ve ew ber bi xwe kişand. Wî berê li cuzdanê xwe nihêrî. Pereyên ku tê de bûn, bêyî ku ji cuzdên derxîne, jimart. Hebekî fikirî û bi fikra ku “çi dibe, çi nabe, divê hin pereyên din bi min re hebe” karta xwe ya bankomatê ji cuzdên kişand û li ber wê ket dorê. Di dorê de ji bo pêşlêgirtina şaşiye, li koda xwe ya bankomatê du caran nihêrî. Ancax wê wextê ewle bû ku êdî dê şaşiye neke. Piştî ku pereyên xwe û meqbûza ku rewşa hesabê wî yê bankê rê dide, ji bankomatê stend, li saeta xwe nihêrî, dît ku bi qasî panzdeh deqîqeyan dereng maye. Wî jî nizanîbû bê wext çawa derbas bûye. Xeyalên rojên berê, pêwîstiya wî ya bi hevalên wî, ji her demên din bêtir, derdixist pêş. Ji ber vê yekê, daxwazeke xurt ew ber bi Serhêt ve ajot.

Gava ket hundurê Kungshallenê, dît ku Robert's Coffee li aliyê rastê bi muşteriyên ve dagirtibû. Lê bi du maseyên xwe yên ku muşteriyên nuh vala kiribûn, hîn jî çavên xwe digelandin.

Yên ku dixwestin kebab û pîzzayê bixwin, bi pêlikên ku

bi xwe digeriyan, dadiketin qatê binî. Li aliyê çepê, tam li hember Robert's Coffee, maseyên East Noodlesê rêz kiribûn. Du xort û sê keçên ku qutikên di rengê porteqalî li xwe kiribûn, li gor daxwazên muşteriyên vir de û wê de baz didan.

Wî çavên xwe li cîhê hertim, li maseya herî dawiyê ku li kêleka camê bû, gerand. Serhat li cîhê wan î hertim rûniştibû. Gava çavên wî li Serhêt ket, ji kêfa dikira bifiriya. Hiseke ku nedihat zevtê, ew da ber xwe. Devê wî ji kêfa nedîçû ser hevdu. Ruyê wî wek gulekê vebû. Qutikekî sipî yê mil-kurt li Serhêt bû. Ji aliyekî ve bi çavên xwe yên ku di rengê kestaneyan de bûn ve ziq li derî dinihêrî û ji aliyê din ve jî bi paçikê ku hertim di hundurê berçavkdankê de bû, berçavka xwe paqij dikir. Serhat jî li kêfa wî ecêbmayî ma. Serhat tam di wexta xwe de hatibû. Serhat di warê wextê jivanê de, tu carî peyv nedianî ser xwe.

Serhat beriya wî bi çar salan hatibû vî welatî. Li Unîversîteya Stockholmê li Fakulteya Komputur û zanista Sîstemê, beşa Sîstema Enformasyonê xwendibû û nuha jî li şirketa Ericssonê kar dike.

Piştî ku sala wî li vira qediya bû, wî û keçeke Swêdî ji hevdu hez kiribûn. Berê bi qasî sal û nîvekê bêyî ku tu muameleyên fermî yên zewacê çêbikin, bi hevdu re jiyabûn. Lê piştî ku herduyan jî hevdu baş nas kiribûn, biryara xwe ya zewacê dabûn. Binefşa dehsalî û Rogerê heftsalî jî berhema vê zewacê bûn. Herdu zarok dikarîbûn hem bi Kurdî û hem jî bi Swêdî bipeyivin. Li malê, Serhat bi wan re bi Kurdî û diya wan jî bi wan re bi Swêdî dipeyivî. Li dibistanê jî her ji hefteyê du saetan, mamosteyekî Kurd dersên Kurdî didan wan. Diya wan ji bo fêrbûna Kurdî çûbû çend kursan û piştî

ku du havînan li ser hevdu çûbu Kurdistanê û her havînekê bi qasî çar hefteyan mabû, êdî tam bi Kurdî dipeyivî. Di pêvajoya sêzdehsalan de, ew jî di destpêkê de, ji derveyî hin pirsên biçûk ên ku ji ber kulturên cîhê derketibûn ortê, heta nuha problemên ku bikarîbûna zewaca wan tehdîd bikirana, derneketibûn. Ji xwe, problemên biçûk jî bi saya sewiye-ya têgihîştina herduyan, bêyî ku wan zêde biêşîne, dihatin çareserkirin. Serhat di dawet û nîşanên Kurdan de û çî pîrozkirin, çî jî proteskorina rojên ku di dîroka Kurdan girîng bûn de, hertim tev jina xwe û zarokên xwe amade dibû. Ev jî bo rojên girîng ên civata Swêdê jî her weha bû. Bi herdu civatan û bi herdu kulturên re pêwendiyêke pîrr baş danîbûn. Vêya jî jiyana wan hîn bi ahengtir û ji aliyê kulturê jî hîn dewlemendtir dikir. Herduyan jî hem li hember herdu kulturên cuda û hem jî li hember mirovên ji herdu civatên cuda, tolerans û hurmeteke ku mirov jê têr nedibû, nîşan didan.

Gava Serhêt jî ew dît, bi kêf ji cîhê xwe rabû û ew ji herdu aliyên ruyê wî maçî kir. Maçîkirina wan, ji çavên jinika Swêdî ya ku bi hevalê xwe re ji wan wê de rûniştibû, nereviyabû. Jinikê bi çavên ecêbmayî li wan nihêrîbû.

Serhêt kursiya li hember xwe, bi destê xwe kişand û got:

– Hela rûne, em ê dû re fahm bikin bê sedema vê kêfa te çî ye. Maşallê, xeberên xêrê bin.

Wî cîhê xwe li ser kursiyê xweş kir û piştî pakêta xwe û hesteyê li ber dilê wî delalî bû derxist danî ser maseyê, ji Serhêt re got:

– Na, lo! Min tu dîtî, kêfa min hat.

Herduyan jî rahiştin listeyên xwarinê û ji bo sînga werdekan û ava wê ya goşt, xwarina ku careke din li wira xwarinê

bûn biryar dan. Serhêt bi îşaretekê bangî xortê ku riya xwe ya zerik ji çengê dirêj kiribû, kir.

– Ji kerema xwe re, ji me re sînga werdekan û ava wê ya goşt bînî. Ger zehmet nebe, heta ku tu xwarinê bînî, ji ber ku ez ê erebeyê biajom, ji min re ava porteqalan û ji hevalê min re jî bîrayekê bîne.

Her çi qas wî got:

– Bi qedeheke bîrayê tu tişt nabe, lo!

Serhêt ji ya xwe daneket û bi ken, lê bi biryar got:

– Na welleh! Gava mirov erebeyê biajo, divê qet venexwe.

Xortê bi çavên xwe yên şîn ên dibiriqandin, bi awakî pirr sempatîk li wan dinihêrî, piştî daxwaza wan, ji bêrîka berdilka xwe komputureke bêrîkan derxist û xwarina ku hati-bû xwestin, lê nivîsand û çû. Piştî sê deqîqeyan, ava porteqalan hat. Serhêt ji wî re got:

– Tu dixwazî, ava porteqalan vexwî, dû re dest bi bîrayê bikî.

– Na welleh! Dereke te pê neêşe, tu vexwe. Ez ê li benda bîraya xwe bimînim.

Hîn peyva xwe neqandibûn, qedeha bîrayê li ser maseyê hat danîn.

Sê kesên din ketin hundur û ber bi maseyek e ku ji wan maseyên li ortê bûn, çûn û bi du kesên ku ji ber wan rabûn re dest bi seansa maçîkirinê kirin. Hevdu sê caran maçî dikirin. Swêdiyên ku li zilamên hevdu maçî dikirin, dinihêrîn, kî dizane bê çi difikirîn. Wan jî hebekî bi meraq hem li çûyin û hatinan û hem jî li yên ku li maseyên din bûn, nihêrî. Pê re jî her yekî ji wan çend qurt ji qedehê vexwarin. Hîn qedehên wan negîhaştibû nêvî, xwarina wan li ser maseyê hat rêzkirin. Hem xwarin û hem peyivîn.

Serhêt jê pirsî:

– Ê, ka bibêje, bê tu nuha çi dikî?

Wî wek hertim dest bi planên xwe kirin û ew tiştên ku Serhêt gellek caran guhdarî kiribûn, rêz kirin. Serhat di ber xwe de kenîya û got:

– Welleh tu ferqa te û ya Oblomov tune ye. Bi tenê Zaharek ji te kêma e. Xwedê mala te ava bike, ma hemû temenê te dê bi plankirinê derbas bibe? Ma tu ê kengî ji vê tiralîyê xelas bibî? Dest bi tetbîqatê bike, tetbîqatê!

– Oblomov? Tu bi serê xwe bikî, guhê xwe bidî min. Te behsa Oblomov kir hat bîra min. Min ew pirtûk du caran xwend jî lê serê min, di warê tîpên ku demên cuda temsîl dikin de, hîn jî ne zelal e. Mîrov dizane bê Oblomov temsîla çi dike. Lê tîpa ku li gor wê çaxê, dema nuh temsîl dike, kî ye? Min di pêvajoya xwendinê de digot, belkî Olga be. Lê gava ez hebekî din pê de hatim, min dît ku ji bo vê yekê, xusîsîyetên Şoltz bêtir mûsaîd in. Ma tu çi dibêjî?

Serhat ji derveyî mesleka xwe, ji edebiyatê hem hez dikir û hem jî baş fahm dikir. Ne edebiyatnas bû, lê di vî warî de, bi qasî ku bi yekî edebiyatnas re bikaribe sohbetên edebî bike jî bi sewîye bû.

Serhat bi serê lêvan kenîya û got:

– Xuya ye, nîyeta te ya ku tu dev ji vê pirtûkê berde, tune ye û tu dixwazî paraleliyê di navbera hin xusîsîyetên jiyanê me ya siyasî û vê pirtûkê de deyne. Ji Oblomov bêtir, oblomoviyê bala te kişandiye. Ma ne em berê jî çend caran li ser wê peyivîbûn. Xuya ye, bi xwendina vê pirtûkê re taswasên te bêtir bûne.

Ji nişka ve xwe avêt ortê û got:

– Erê, bi Xwedê. Tew gava min pirtûka Dobrulyubov a ku

navê Oblomovî çî ye, xwend, ez bêtir ketim nav taswasan. Mêrik dibêje, “ Ji Oblomovan yek jî tu carî negîhaştiye xeta ku peyvê dike pratîk, prensîpê jî bi pêwîstiyên hundurîn ên ruhê mirovî re dike yek û di nav van pêwîstiyên de dihelîne û bi vî awayî dibe hêza bêhempa ya ku mirovî dixê he-reketê”.

Serhêt berê jî li sedemên taswasên wî guhdarî kiribû, ji ber vê yekê xwest meseleyê biguhere. Rahişt çenteyê xwe û zerfeke mezin jê derxist. Sûretek derxist û rê wî da û got:

– Ka dev ji vê pirsê ku em hertim munaqêşe dikin, berde û bala xwe bide vê tabloya xweşik. Hela bê tu wê nas dikî?

Tablo berê weha nêzîkî xwe kir, ji xwe bi dûr xist, hebekî ji kêlekê lê nihêrî, dîsa ber bi xwe ve anî û dû re got:

– Na, welleh! Min nas nekir.

Lê piştî li Serhêt nihêrî, got:

– Dişibe tişteki xweşik. Ji xwe, ger ne tişteki xweşik û bi mahne bûya, te ne dikirî.

Kêfa Serhêt bi vê baweriyaya wî hat. Serhêt kêfa xwe ya ku ji ber baweriyaya hevalê wî pê re peyda bûbû, veneşart. Ji ber vê yekê, bi nerînên dostane û bi hezkirineke hevaltî ve hilmiştî, berê xwe da wî. Rewşa Serhêt ji çavên wî jî nereviyabû. Vêya ew bi hiseke ku herdu hîn bêtir nêzîkî hevdu kirin, dagirt. Serhêt piştî ku tablo ji destê wî girt û carekê lê nihêrî, weha got:

– Bi Xwedê ez bi xwe jî nizamim, bê çî ye. Lê gava min ev tablo li dikanekê dît, min şiband sembolekê. Min di kovarekê de xwendibû. Ez ne şaş bim, navê wê Eîrene bû. Ez çawa çav li vê tabloyê ketim, ew hat bîra min. Min bi wê niyetê kirriye. Ez ê çarçoveyeke xweşik jî jê re peyda bikim û wê li dîwarê odeya xwe ya rûniştinê daliqînim. Eîrene li Yûnanîs-

tana kevin tev zarokê ku di himbêzê de sembola aşitîyê bû.

Serhêt hîn peyva xwe temam ne kiribû, wî xwe ne girt û bi xemgînî got:

– Lê di Hîroşîma duyem de, bi hezaran Eireneyên me tev zarokên xwe yên di himbêzê de, bûn hedefa xezeba hovîtîyê.

Piştî ku weha got, ruyê Serhêt jî hat guhertin. Herdu bîstîkekê bêdeng man. Çend caran bi xemgînî li hevdu nihêrin û dû re jî ziq li zikê xênî nihêrin. Ger Serhêt ji bo belavkirina vê hewayê mudaxele nekira û negota; “Li kêleka vê avahiya ku hersal dinya hemû li ser dipeyivin, ez û tu rûniştinî û bi ser hevdu de diponijin” dê wê hewayê xemgîn giraniya xwe ji ser danûstendinên wan ranekira. Serhêt xwest wê hewayê bi yekcarî belav bike. Ji ber vê yekê, mijara ku bikaribe bala wî jî bikşîne, anî rojevê.

– Bi saya wesiyetnameya Nobêl hem ev avahî û hem jî navê vî welatî ji her alî ve baş belav bû. Ya din jî her dehê Çileyê Pêşîn reklameke baş tê kirin. Mesela, hem dana xelatan a li Konserthusetê û hem jî şahîya di êvara eynî rojê de li Blåhallena ku li Qesra Belediyeya Stockholmê ye, pîrr bi şatafatê amadekirin û ev bi rêya televîzyonê çî bi weşanên raste rast û çî jî di nava programên xeberan de, ji terefê bi milyaran mirov tîrî temaşekirin.

Kêfa wî jî ji guhertina meseleyê re hatibû. Xelatên ku hem jî aliyê maddî û hem jî ji aliyê kariyerê îmkânên pîrr mezin didan xelatwergiran, ji bo çî ne di rojê de, lê bi tenê di dehê Çileyê Pêşîn de tîrî belavkirin? Ev pîrr ji Serhat pîrrî.

Serhêt jî weha bersiv da:

– Nobel di dehê Çileyê Pêşîn a sala 1896an de wefat kiriyê. Sedema ku xelat wê rojê tîrî belavkirin, ev e.

Meraqa wî ew li bûyerê bêtir sor kir. Pirsên ji meraqê dizan, yek bi yek ji Serhêt hatin pirsîn. Li min bibuhure, hey te mesele vekir, çend tiştên di vî warî de hene ku ez wan bi rastî meraq dikim.

– Min di rojnameyekê de xwend, ez ne şaş bim, Dagens Nyheter bû, ku ew çar hezar û du sed qerenfîl û heyşt kîlo şermînokên ku di roja xelatdayînê de Konserthusetê dixemilînin, ji bajarê San Remoyê tên. Gava min xwend, ez ecêbmayî mam. Ji bo çi San Remo û ne bajarekî din?

Serhat bişirî û got:

– Xuya ye, tu dibêjî, hey mesele vebû, em hila wê derxînin.

Wî gotinên Serhêt bi serêxwekilkirinê ve tesdîq kir û qut birrî.

– Bi Xwedê, ne hewce ye ku ez vir de û wir de bibim, he ma eyn wek te fahm kiriye.

– Ma tu dizanî, Nobelê ku li Swêdê hatiye veşartin, li devereke din wefat kiriye? Nobel di taliya emrê xwe de, li bajarê San Remoyê dijiya û li wira jî wefat kir. Ji ber vê yekê jî hersal di roja dayina xelatan de, Belediyeya San Remoyê van qerenfîl û şermînokan dişîne Stockholme.

Îcar pirsê welatên ku li ser navê Nobel xelatan didin, serî wî mijûl dikir.

– Ma Nobel ji bo çi dana pîrraniya xelatên xwe ji Swêdê û ya aşitîyê bi tenê jî ji Norweçê re hişt? Ger mesele meseleya Skandînavyayê be, ji bo çi tu fonksiyona Danîmarkayê di dana xelatan de tune ye? Na, ger meseleya welatên bakur be, ka rola Fînlendiya û Îzlandayê?

Serhêt hem dîroka Swêdê û ya Skandînavyayê baş dizanîbû û hem jî li ser pirsê Nobel serê xwe baş êşandibû. Ji ber



vê yekê di bersivdayinê de zêde zehmetî nekişand û wek mirov ta bi derziyê de veke, yek bi yek jê re îzah kir.

– Nobel di wesiyetnameya xwe de, dana xelatan ji welatê xwe re hiştiye, ne ji Skandînavyayê re. Xelata ku ji Norweçê re maye jî ji ber rewşa wê demê tê. Gava Nobel wefat kir, hîn Norweç ji Swêdê neqetiyabû û mîna perçeyekî Swêdê bû. Ji ber vê yekê di wesiyetnameyê de cîh girtiye. Dana xelatan ji Swêdê re maye, lê ger tu bala xwe bidî wesiyetnameya ku di 26ê Mijdara 1895an de, li Parîsê hat nivîsandin, tu ê bibînî ku Nobel xelatên xwe di çarçoveya Skandînavyayê de hefs ne kiriye û ji bo xelatwergirtinê jî pirr eşkere diyar kiriye ku ya girîng ên ku herî heq kirine xelatê werbigrin. Ew ji Skandînavyayê nin, an ji devereke din in, qet ne girîng e.

– Lê ma li gor baweriya te, yên herî ku heq kirine xelatan werdigrin? Ma di biryaran de rola helwestên siyasî qet tune ye?

Serhêt ferq kir ku bê ew dixwaze munaqeseyê ber bi kî derê ve bikişîne. Ji ber vê yekê, berê çend saniyeyan li çavên wî nihêrî û mîna ku bibêje, ez derdê te dizanim, bişirî û dû re jê re got:

– Min got qey tu bi tenê hin agahdariyên di vî warî de meraq dikî. Lê xuya ye ku tu dixwazî derbasî beşa nixandîne bibî.

– Rast e. Ez meraq dikim, mesela di 1953an de, Churchill ji bo çi xelata edebiyatê wergirt? Tu dikarî vêya îzah bikî? Ma di wê sala ku Akademiya Swêdê biryar da ku divê xelata edebiyatê bide Churchill, ma di cîhana edebiyatê de, tu kesê an kesa ku bêtir layiqî vê xelatê bû, tune bû?

Serhat ecêbmayî ma. Meseleya Churchill qet nebihîstibû.

– Kuro, nuha tu bi rastî dibêjî ku Churchill xelata edebiyatê wergirtiye, ma ne ya aşitiyê be? Baş bifikire.

– Erê, lo! Ez di pirtûka ku li ser xelatên edebiyatê hatiye nivîsandim li navê wî rast hatim. Min cara pêşîn ji çavên xwe bawer nekir, lê piştî ku min motîvasyona dana xelatê ya ji bo wî xwend, êdî min tam bawer kir. Wî gellek pirtûk nivîsandine, lê ne yên edebiyatê. Ger ya edebiyatê bêhesibandin, ew jî pirtûka wî ya bi navê Xortaniya min e. Ew jî bi qasî bîst û sê salan beriya xelatdayinê hatibû weşandin. Ma ev ne siyaset e, le çi ye?

Serhat hebekî fikirî û dû re ji bo munaqêşe hîn objektîvtir bête meşandin, got:

– Erê kuro, tu hêlekê bi tenê dibînî. Yên li hember wan jî siyasetê dikin. Ma Sartre ji bo çi gava di 1964an de, biryar hat dayin ku xelatê bidin wî, xelat red kir. Di dîroka xelatên Nobel de cara yekem û bi tenê wî weha kir. Sedem jî siyaset bû.

Wî wek tişteke ku Serhat pê nizanibe keşif kiribe, hema bi derbekê re got:

– Di sala 1958an de, Pasternak jî xelat qebûl nekir.

Pirqînî bi Serhêt ket. Xuya ye, tu di hin waran de, hîn jî nîkarî xwe ji koraniyê xelas bikî. Rast e, Pasternak jî nestend. Lê sedemên newergirtina herduyan, ji hevdu pîrr cuda ne. Yekî ji wan, di hevpeyvînekê de, bi qasî ku peyvên wî tînin bîra min weha digot: “Gava mirov xelatê dide yekî, mirov dest datîne ser wî. Ew ê bi vê xelatê bibêjin, tev ku ew `ekstremîst` e jî yekî ji me ye. Min nîkarîbû ev qebûl bikira. Ez nabêjim, bila nivîskar xwe îzole bikin, lê divê ew nekevin feqan jî”. Yê din jî tev ku dixwest, nehiştin ew werbigre. Û dû re ew mecbûrî redkirina xelatê kirin. Nehiştin ku mêrik

bê Stockholme û xelata xwe werbigre.

Ew di derheqê pirsên weha yên ku bêhna siyasetê ji wan dihat de, xwediyê agahdariyê bû. Lê kêmaniya agahdariyên wî, ji xwendina pirtûkên ku ev pirs bi awayê xwe dabûn, dihat.

– Bi qasî ku ez dizanim, destûr danê, lê wî nexwest.

Serhêt serê xwe vir de û wir de kil kir û got:

– Kuro, tu terka agahdariyên resmî nake. Rast e, destûra hatina Stockholme danê. Lê jê re gotin “ Tu dikarî biçî, lê divê tu paş de venegerî û li wê bihuşta kapîtalîzmê jiyana xwe bidomîne”. Tu ji vêya re dibêjî, destûr? Ya din jî Yekîtiya Nivîskarên Sovyetê ew ji endametiye avêt û ji bo ji hev-welatiyê bê avêtin jî pêşniyar kir. Pasternak nikarîbû ev bar hemû rakira. Ew taqet di xwe de nedît. Na na, kêfa wî pîrr ji vê xelatê re hatibû. Bi hesreta vê xelatê çû. Navê helbesta wî ya herî taliyê jî Xelata Nobêl bû. Ew jî piştî ku di 1959an de bi dizî derxistin derveyî welêt û di “Daily Mail”ê çap bû, hat bihîstin. Divê tu bifikirî, bê mêrik ji bo çi mec-bûrî berhema xwe bi dizî derxîne û li welatekî din çap bike, bû? Ji bo çi nehiştin ev berhem li wî welatî çap bibe? Ma qedexeyê fikra cîhê ji ortê rakir?

Li hember gotinên Serhêt, hebekî bêdeng mabû. Bîstikekê li ser wan fikirîbû û li gor xwe, hin tiştên rast tesbît kiribûn.

– Tu rast dibêjî. Divê mirov mîna berê, ji aliyê hin deveran hema çî hatin nivîsandin, pêşînên qebûl neke. Ya rastî divê mirov destûrê nede tu kesî ku bikaribe ji berdêla mirovî bifikire. Gava tu dipeyivî, min jî xwe sax kir. Min meraq kir, bê gelo dubelstandardî ji kê derê tê. Gotinên te, ji bo mirov nekeve dubelstandardiyê, pîrr bi feyde ne. Ez bi xwe jî bi kêmanî, ji aliyê metodê ve mîna berê nafikirim. Lê ji bo objek-

tîvbûnê, divê mirov aliyê din jî bibine. Tu bala xwe bidê, Pasternak di 1960î de, yanî piştî xelatê bi du salan, wefat dike. Wexta wefat kir, heftêsalî bû. Ez jî bo tiştên ku di Doktor Jivago de hatibûn nivîsandin, naxwazim tiştêkî bibêjim. Nivîskarek e, xwestiye şahîdê dema xwe be. Ji ber vê yekê jî 1905an heta dawiya dema Stalîn kiriye mijarê pirtûka xwe. Pirsê esasî ne ev e. Di jiyana wî de, heta wê çaxê gellek berhemên wî yên din jî hebûn. Ji xwe ew berê jî bi wan berhemên xwe, dihat naskirin û di edebiyata welatê xwe de, xwediyê cîhekî pirr baş bû. Ji bo çi ancax piştî ku di 1957an de, pirtûka wî bi dizî birin Mîlanoyê û li wê derê, berê bi Îtalyanî hat çapkirin, navê Pasternak ewqas derket pêş? Biryara xelatê jî bi lez û bi yekdengî tê wergirtin. Gelo divê ev hemû mîna tiştên tebîî bîr xandin?

Serhat êdî jî çarçoveya munaqeseyê memnûn xuya dikir. Kêmbûna tesîra mantiqê ku munaqese mîna şerê dîkan dît, di danûstendinên wan de eşkere bû. Serhat li ser pirsên wî baş fikirî û dû re bi dengekî hîn nizmtir got:

– Ez bi xwe jî di dana xelatê de, bêhna siyasetê his dikim. Ji xwe, di dana xelatan de tesîra siyasetê, di medyayê de jî gellek caran hat munaqesekirin. Ez bawer im, ev munaqese hertim dikare bê rojevê. Ma tu....

Yekî li camê xist û nehişt Serhat peyva xwe biqedîne. Herduyan bi hevdu re li aliyê camê nihêrîn. Yê li restorantê kar dikir, dest bi sêniyên xwarinê jî ber wan bide alî kiribû. Serhêt mêrik nas nekir. Li porê wî yê dirêj î reş î qîr ku li paşiyê hatibû girêdan, serçavê wî yê dirêj ku çavên wî yên qahweyî bi zorê tê de xuya dibûn û qutikê wî yê cîns î milvemaltî nihêrî, tu mahne neda îşaretên vî mirovê ku ji her halê wî diyar bû ku ji welatekî Amerîkaya Latîn e. Lê piştî ku dît wî jî

destê xwe ji mêrik re kil kir û heta ew dawetî hundur kir, fahm kir ku nasekî wî ye. Wî û vî mêrikê ku ji Santiyagoyê, gava ji bo fêrbûna Swêdî diçûn dibistanê hevdu nas kiribûn. Mêrik derbasî hundur bû. Herdu ji ber wî rabûn ser xwe û bi destê wî girtin. Wî piştî ku mêrik û Serhat bi hevdu da naskirin, mêrik ji bo xwarinekê dawetî rûniştinê kir. Lê mêrikê ku ji her alî ve diyar bû ku yek ji nifşê nuha yê Îndîyanan bû, ji bo dawetkirinê sipasiyên xwe pêşkêşî wan kir û ji ber beşdariya civînekê, destûra wan xwest û çû. Piştî karkirê ku ser maseyê baş paqij kir jî çû, Serhêt xwe bi destê meraqa ve berda û di dawiyê de jî pirsî:

– Ev kî bû, lo?

Wî berê keserek kişand û dû re got:

– Mesela wî dût û dirêj e. Lê ez ji te re bi kurtî bibêjim da ku tu bizanibî bê ji ku hatiye. Ev kurê yekî ku gava Pînoşet dest danî ser îqtîdarê, hatibû girtin û qetilkirin e. Ew wê çaxê, neh–dehsalî bû. Ew û diya xwe, xwe demekê vedişêrin. Lê piştî cih li wan teng dibe, ji welêt baz didin. Heta xwe gîhandine Swêdê, bi qasî deh salan li çend welatên cuda yên Amerîkaya Latîn jiyane. Min û wî bi hevdu re Swêdî dixwend. Her ji çendakî carekê, gava em li deverên weha li hevdu rast tîn, bê silav di ser mirovî re derbas nabe. Piştî rewş li welatê wan hat guhertin, ew diya xwe berê ji bo ziyaretê çûn welêt. Gava ku vegeriyan Swêdê, diya wî dest bi haziriya vegeerê kir û xwest lawê xwe jî bi xwe re bibe. Lê lawik hem bi yeka Swêdî re zewicîye û hem jî gava welatê xwe ziyaret kiribû, xwe li wira pirr xerîb his kiribû. Ji ber vê yekê, piştî gellek munaqeseyên wî û diya wî, diya wî ji Swêdê bar kiribû û çûbû welatê xwe, lê lawik li vira mabû. Ew.....

Wî hey dewam kir, lê deng qet nediçû Serhêt. Serhat bi xwe, bi xeyalin din hatibû mijûlkirin. Piştî ku wî lê nihêrî ku hişê Serhêt li devereke din e, peyva xwe birrî û bi çavên meraq ve lê nihêrî. Bi qasî bîstikekê deng ji Serhêt nehat. Lê piştî kesereke kûr, Serhêt serê xwe bilind kir, bi hiseke nostalgîk li wî nihêrî û got:

– Tê bîra te, gava kuştina Allende hat bihîstin, me ji qehra dikira xwe bixwara? Hey gidî dinya, hey!

Ew jî ket bin vê atmosferê. Lê wî ji hisên nostalgîk bêtir, giraniya xwe da pirsên ku bibin alîkariya şikilwergirtina helwesta di vî warê de.

– Gelo hemû daxwazên me xeyal bûn? Gelo ya rast çî ye? Ma divê em ji hertiştî re bibêjin, bi xatirê we? Ma kulîlkên ku diviyabûn di biharê de xweza bixemilandana, xeyal in? Ma kulîlkên ku di dilan de bişkivî bûn, dê biçilmisin?

Serhat ji ber cidiyeta pirsê, hebekî fikirî, cîhê xwe li ser kursiyê xweş kir û dû re jê re qutbirrî got:

– Na na! Ne divê mirov teslîmî nîhîlîzmê bibe û ne jî bê hêvî bibe.

Lê wî pirsên xwe domand.

– Kuro, dikarî ji min re bibêjî, bê ev çî bela bû? Çewtîti ji ku tê? Divê mirov çawa bike?

– Kurt kurmancî! Divê mirov ji bo wê bihuşta ku dê bi rastî ji dogehê qat bi qat xweştir be, bixebite. Em tiştêkî ava dikin. Navê wê dikin, bihuşt. Lê mirov xwe ji bihuştê diavêjin dojeha ku em naecibînin. Heta ku bihuşta me ji dojeha wan ne xweştir be, tu şensa me tune ye.

Sohbeta wî û ya Serhêt têra xwe dirêj bûbû. Her ji çendakî carekê gava hevdu dibînin, heta hevdu ne betilînin, dev ji hevdu bernadin. Serhêt li qedeha wî nihêrî, dît ku vala bûye.

– Tu bîrayeke din venaxwî?

– Na lo, bes e. Qey em heta êvarî li vira rûnanin. Divê ez biçim komeleyê, bê hela li wira çi xeber hene. Ez ê dû re jî berê xwe bidim taxa xwe.

Serhêt ji bo dana hesêb, li xortê rîhzer nihêrî. Gava xort ber bi wan ve hat, ew ji nişka ve rabû ser xwe û got:

– Li min binihêre! Divê tu dengê xwe nekî, vê carê ez ê bîdim.

Û ji bo ku heqê xwarinê bide, xwe rakişand.

– Welleh, nabe!

Serhat keniya û got:

– Bavo li cîhê xwe rûne! Ji xwe re lê binihêre, lo! Dibêje, nabe! Ma qey caîz e ku tu pera bidî?

Wî dîsa xwe rakişand.

– Yaho, çi ferq dike, ha ez, ha tu!

Hevdu vir de û wê de birin. Ji dil li ber hevdu geriyan. Xortê ku ji bo hesêb ber bi maseya wan ve hatibû jî bi çavên bi meraq li wan temaşe dikir. Serhêt lê nihêrî ku bala keçîka ku li ber kasayê ye û ya hin muşteriyên din jî li wan e, got:

– Kuro, li cîhê xwe rûne! Ev ên ku li me dinihêrin wê bê qey pev diçinin.

Pişti vê gotina Serhêt, wî êdî di ber xwe de neda. Bi tenê hebekî li çavên ku bi meraq dageriyabûn ser wan temaşe kir û rûnişt. Mîna ku di bin darê zorê de rûniştibe, kir ufe uf û dû re ji Sehat re got:

– Welleh nebû... lê bila wek te be!

Wextê Serhêt jî teng bûbû. Herdu ji Kungshallenê derketin. Li derve xatir ji hevdu xwestin û her yekî ji wan berê xwe da deverekê. Serhêt berê xwe da Vasagatanê û çû ba erebeya xwe. Wî jî li welatên komeleyan berê xwe da kome-

leya xwe ya li Stockholma rengîn. Stockholma ku mozaîka ji mirovên ji heftê welatên cuda yên dinyayê pêkhatî. Bajarê ku di navbera kulturên cuda de, pireke medeniyetê. Devera ku erd û ezman lê digihêjin hevdu û perçeyek ji bihuşta xwezayê pêk tîne... Stockholm, bajarê giravan... Stockholm, bi xemla xwe ya bîst û çar hezar giravan ve girav girav li ber çavan...



Li Komeleyê herdu komputer jî meşgûl bûn. Yekî ku wî ew cara yekem li komeleyê didît jî komputura xwe ya biçûk a ku ji mal anîbû, danîbû ser çongên xwe û bi konsantreyeke mezin dixebitî. Rojname û kovar li kêleka derî hatibûn danîn. Betalî li faksê tunebû. Dîwarên salonê bi kaxizên sipî ku pitikên kremî bi awakî firk lê hatibû belavkirin, hatibûn xemilandin. Li ber dîwarê ku li herdu maseyan dinihêrî, taximeke qenepeyên çerm ê di rengê qahweyî de bû, hatibû rêzkirin. Li kêleka wan jî dudu li aliyê çepê û dudu jî li aliyê rastê, çar kursî hatibûn danîn. Texteyê agahdariyê yê ku gava mirov ji derî dikeve hundur beriya hertiştî dibîne, li dîwarê hember daliqandîbû. Rojên kursên zimên û yên grûpa govendê hîn jî nehatibû xerakirin. Nexşeya Kurdistanê ya ku Enstîtuya Kurd li Parîsê dabû çêkirin li aliyê rastî texteyî û dolabeke pirtûkan a ku bi pirtûkên Kurdî û yên ku li ser Kurdan hatine nivîsandin dagirtî bû jî li aliyê çepê hatibû danîn.

Makîneya fotokopiyê ya bi kevnî hatibû kîrîn, mîna aşê xerabe, bi dengê xwe ve dîsa civat ji guha dikir.

Salona komeleyê bi qasî ku du caran li odeya rûniştinê ya daîreyeke normal be, fireh bû. Ji ber şewqa tavê, jalûzîyên hersê pencereyên wê jî daxistî bûn. Li ser maseya ku li ber pencereya ku li texma derî û li ser ya ku tam li hember wê, li dawîya salonê herdu komputer hatibûn danîn. Vê jî rêya ku mirov xwe bi hêsanî nêzîkî pencereyan bike, pirr teng kiribû. Li orteya herdu maseyan jî pîrîntera ku bi herdu komputeran ve hatibû girêdan, li ser maseyeke ku ji wan nizmtir û biçûktir, li gor emrê ku Ardayî bi rêya bişkoka dabûyê, her di deqîqeyekê de heyşt rûpelên nivîsandî derdixist derve. Li ortê xalîçeyeke bi qasî çar metreyan dirêj û berê wê ji

metreyekê hebekî kêmîtir hatibû raxistin. Bi saya vê xalîçeyê raxistina hundur, bi rêkûpêktir xuya dibû.

Li hundur komeleyê munaqeseyek li dar bû. Gellek hevalên wî yên ku hevdu baş nas dikirin, li komeleyê rûniştibûn. Ji derveyî Bêrîvanê û yê ku bi komputura biçûk dixebitî, Arda, Mehemed, Şêxo, Sîno, Nasir û Dewrêş bi salan bi hevdu re hevaltî kiribûn. Hemû endamên eynî tevgerê bûn û di pêvajoya têkoşîna ji bo eynî îdealan de, bi hevdu re hem rojên baş û hem jî yên xerab jiyabûn. Lê nuha jiyanê ew anîbûn niqteyekê ku her yek bi awakî pirr cuda li dinyayê dinihêrin. Lê fêrî hevdu bûbûn. Her yek ji wan pirr cuda bifikiriya jî di danûstendinên civakî de dîsa hevalên hevdu yên herî nêzîk bûn. Yên ku bi rewşa wan dizanîbûn û ew li qahwexaneyan, li komeleyan dîsa bi hevdu re didîtin, ecêbmayî diman. Mîna berê dar di devê hevdu ranedikirin.

Ardayî hem karê xwe dikir û hem jî gava dora wî dihat, ew jî cîhê xwe beşdarî munaqeseyê dibû. Tîşortekî zer ê ku beskura wî reş bû, li xwe kiribû. Porê wî ne weşiyabû, lê bi hesreta tayê reş mabû. Yekî kinik î esmer bû. Gava rûniştî ba, mirovî tam hesab jê dikir. Lê gava radibû ser xwe, bejna wî ew dida dest. Bêvila wî qut bû. Ji ber vê yekê, di orta lêv û bêvilê de, ji bo simbêla sehayeke fireh hebû. Gava simbêl berdida, bejna wî ya kinik di bin simbêlê bi qasî ku orta bêvilê û lêvê dadigirt, heta gellek caran jî xwe bera ser lêva jêrîn dida, bi temamî wenda dibû. Gava bêhna wî teng dibû, dibû wek barûdê. Wê gavê tu kes newêrîbû têteta xulkê wî. Lê herkes di warê durustbûn û saxlembûna wî de hemfikir bûn. Carinan gava mirov dixwest behsa pêbaweriya hinekan bike, digot “mirovekî wek Ardayî saxlem”. Tu carî he-

valên xwe bi tenê nehiştibûn. Hevalê rojên teng bû. Çavên wî li paş berçavka ku camên wê sal bi sal qalindtir dibûn, pîrr ecêb xuya dikirin. Her ji bîstikekê carekê, ji komputerê vedikişiya, berçavka xwe derdixist û bi destê xwe çavê xwe hebekî difirkand. Dû re dîsa diket ser komputerê. Arda rojê heyşt saetan li komeleyê dixebitî. Di salên heftêyî de, di şerê navbera grûpan de birîndar bûbû. Nuha hîn jî dikuliyê. Ji ber vê seqetiyê, ji sedî nodê meaşê wî ji aliyê Komîsyona Kar a Wîlayetê ve dihat dayin û ji sedî deh jî divê komeleyê li ser temam bikira. Lê Ardayî para komeleyê hertim lê vedigerand. Ji aliyê fikrî jî piştî pratîka welatên rojhilat, serê wî tev lî hevdu bûbû. Dev ji îdealên xwe bernedabû, lê taqeta ku bikaribe wan biparêze jî di xwe de nedidît.

Li ser qenepeya ku piştî wê li dîwêr û berê wê li pencereyan bû, Sînoyê Cizîrî rûniştibû. Sîno piştî hefsê pîrr hatibû guhertin. Tew piştî perçebûnê, hêviyên xwe yên li devera berê, bi temamî wenda kiribûn. Porê wî yê ku wî di hefsê de kiribû hirî, firk bûbû, lê awayê şehkirinê, deverên rût vedîşart. Tizbiya wî qet jê nediqetiya. Êdî yên dora wî bi navê wî bangî wî nedikirin. Jê re digotin, Seyda. Ev nav bi wî jî xweş bû. Qet dengê xwe nedikir û heta, memnûniyeta xwe dida der. Gava diçû mala hevalên xwe yên kevin, zehmetiya wî ya herî mezin, tunebûna secadeyeke wek adetê bû. Li gor gotinên wî, wî pîrsa xwe ya neteweyî û secade kiribûn yek. Simbêlê wî yê ku lêva jorîn derbas nedikirin, gellek caran bûbû sedem ku hevalên wî yên ku ew ji berê de nas dikirin, pîrr bikenin. Sînoyê ku di salên heftêyî de, ji bo araqvexwarinê ji terefê rêxistina xwe du caran hatibû cezakirin, nuha berra dû ceneta baqî dabû. Hefsê ew êşandibû. Piştî hefsê bi

çend salan jî ji ber jana zirav pirr kişandibû. Bi îmkanên wî welatî jê xelas bûbû. Îcar bawesîra wî zora wî biribû. Gava ji bo wê ameliyat bûbû, nexwestibû kes biçe ziyareta wî. Lê tiştên weha zû tên bihîstin. Hevalên xêrxwaz bi telefonan agahdarî belav kiribûn û odeya Sînoyî bi dostan ve hatibûn dagirtin. Yên ji tevliheviyê hez dikirin, xwe ne girtibûn û pirsibûn:

– Ameliyat çawa derbas bû? Ma kîjan devera laşê te ameliyat kirine?

Sîno ji fediya sor bûbû û nema dizanîbû bê wê çi gotiba. Hema bi tenê weha gotibû:

– Xwedê hevalên wek we ji ser serê mirovî kêma neke!

Mezinbûna guhên wî bala mirovî dikişandin. Ji ber vê, gava hevalên wî gellek caran henek pê dikirin û digotin “ Tu ne hewce ye ku tu parabolên bikirî. Ji ber ku ya te ji malê temîn dibe”, pirr diqehêrî û tu nedima ku bela xwe di hinekan de bida. Lê bejna wî ya dirêj û çavên wî yên zerî ku mirovî digot qey hertim kilkirî ne, bi qatê kincên ku bi îtîna hatibûn kîrî, hemû kêmasî di bin siya xwe de dihiştin û tev vê jî ew hîn wek fêrîsekî nîşan didan.

Şêxmûsê Dêrikî, çakêtê wî dîsa li ser milan û li ser kursiyê li kêleka Sînoyî rûniştibû. Vê carê jî li ser qoltixan rûneniştibû. Gava hinekan digot “Va cîh heye, were li vira rûne”, bi qerf digot:

– Ez ji rûniştina li ser qoltixan hez nakim. Ew cîhê mezinan e. Mirov gava li wira rûnişt, divê heqê wê bidê.

Ji ber vê yekê, yek ji wan kursiyên ku li kêlekê hatibûn danîn, hertim aîdî wî bû. Ji berê de ketibû nav refên welathezan. Piştî darbê, wî jî da tengala hevalên xwe û berê li Sû-

riye û Libnanê û dû re jî li başûrê welêt, li ser hevdu heft sa-  
lan li wê sehayê çû û hat. Ji nîşanê re, hevalê wî tunebû.  
Berra çî bida, lê dixist. Di leyiztika pinîkêr de jî kafirek bû.  
Ji xwe wî digot:

– Bila ji Dêrikîyan pê ve tu kes nebêjin ku em bi pinîkêr  
dizanin.

Bejna wî sed û heftê û heşt santîmetre bû. Gava li welêt  
bû, yekî tenik î zirav bû. Çavên wî gir û bi qasî ku hisa ku  
di qulikên xwe de hilnayên, bi mirovî re çêdikir, li pêş bûn.  
Gava dikeniya dilê xwe li ken rehet dikir. Bi pixe pixekê bi  
tenê, qîma xwe nedianî. Carinan yên li dora wî bûn, xwezi-  
ya xwe bi wî dianîn û ji Xwedê dixwestin ku ew jî weke wî  
bikaribin ji dil bikenin. Lê nuha laşê wî têra xwe hatibû da-  
girtin. Her ku kîloyên wî zêde dibûn, bejna wî kintir xuya  
dikir. Gepên wî hingî weha tije bûbûn, çavên wî yên qahwe-  
yîyê tarî ku berê mezin xuya dikirin, tu nemabû bihatana  
girtin. Destê wî hertim li ser simbêlên wî yên ku orta wan jî  
dûyê çixaran zer xuya dikirin, bû. Her ji çend deqîqeyan ca-  
rekê ew ba didan. Ev bûbû xusûsiyeteke wî. Temberiya xwe  
weha şeh dikir ku eniya wî ya pahn tam xuya dibû. Porê wî  
yê şayik hertim dibiriqand. Ev jî gellek caran bûbû sedem  
ku yên li dorê jê re bibêjin “ Va, yê ku çêlekê serê wî alastiye  
hat”. Tayekî sipî jî neketibû porê wî. Carinan gava hevalên  
wî yên jê biçûktir, jê dipirsîn:

– Lawo, Şêxo tu porê xwe çawa dikî? Tayekî sipî jî neketi-  
yê.

Wî jî bi devokê xwe yê Dêrikê henek bi wan dikir û digot:

– Ey, qey em li ber xwe nakevin.

Şêxmûsê Derikî, bi eslê xwe ne ji nava Derikê bû, ji gun-  
dekî Dêrikê bû. Ji ber vê yekê, gava yên ku jî nava Derikê

bûn, jê re digotin; “Ger tu dixwazî bibî Dêrikî, ne problem e, lê divê tu muracaetî me bikî. Ma Dêrikîbûn ewqas rehet e?” pirr diqehêrî. Şêxmûs dibistana destpêkî qedandibû. Dîploma dibistana navîn jî gava dibistan di destê hevalên wî de bû, bi îmtîhanên ji derve yên ku bersivên pirsan li texteyê hatibû nivîsandin, stendibû. Ev şeş meh in ku ji karê xwe yê posteyê hatibû derxistin û nuha ji kasaya bêkariyê meaşê xwe werdigirt. Heta salekê dê weha dewam bikira. Dû re ji bo ji nû ve bikaribe ji kasa bêkariyê alîkariyê werbigre, divê bi qasî şeş mehan xwe bi projeyeke ku di çarçoveya pêşdebirina jiyana kar de bihata hesibandin, mijûl bikira.

Nasirî ji bo rûniştinê, qenepeya li hember Sînoyî hilbijartibû. Ji ber ku bi pinîkêr nizanîbû, dikir û nedikir nikarîbû xwe têxista çavên Şêxoyî. Zanebûna Nasirî a ternîp jî rewş nediguhert. Ji ber ku Şêxoyî destûra ku leyiztika pinîkêr bi ya ternîpê bê muqayesekirin jî nedida, Nasir mîna ku bibêje, “Emrê min ji Xwedê re” li benda rehim û sebra Şêxoyî mabû. Mirovekî pirr mulahîm bû. Tu kes jê ne diêşiya. Li hember hevalê xwe pirr bi hurmet bû. Di salên hefteyî de jî weha bû. Jê dihat hezkirin, lê di qada siyasî de, tesîreke wî ya weha mezin tune bû. Lê xwedî prensîp bû û ji bo jiyaneke bi prensîpên xwe re lihevkerî bijî, hewil dida.

Nasir Mamosteyekî baş bû. Têkiliyeke pirr xweş di navbera wî û xwendekarên wî de hebû. Ev têkilî li derve jî her berdewam bû. Di dibistanê de Kurdî, bi saya metodên ku ew di dersan de bi kar tîne, bi zarokan hîn şêrîntir dibû. Gava li bajarê xwe Pîranê bû, di nav zaravayên Kurdî de, bi tenê bi Zazakî dipeyivî. Nuha zaravayê Kurmancî bi qasî Kurmancekî, xweş dipeyive. Ji ber vê yekê, bi herdu zarava-

yên Kurdî jî ders dida zarokan. Serçavê wî wek lepekî bû. Ji ber bêvila wî ya dirêj a di wî serçavê biçûk de, çavên wî bi yekcarî wenda bûbûn. Ji derveyî çend tayên bi minnet, serê wî riq û rût bûbû. Lepên wî, bi qasî ku bala mirovî bikişînin ser xwe, biçûk xuya dikirin. Çenga wî ya ku li gor serçavê wî dirêj bû, hiseke weha bi mirovî re çêdikir ku mirov dixwest hertim pê bigre. Devê wî li gor yê Kurdan biçûktir û lêvên wî jî ziravtir xuya dikirin. Gellek caran hevalên wî he nek pê dikirin û digotin:

– Welleh, dilê bavê te qet ji te re nexwestiye.

Cama berçavka wî jî her diçû qalindtir dibû. Lê bi danûstendinên xwe yê civakî û bi toleransa xwe, weha dikir ku tu kesî rê nedibir ser hêla wî ya fîzîkî.

Tev li ku ew û Mehemedê Maraşî du tîpên ji hevdu pîr cuda bûn jî nuha li kêleka hevdu rûniştibûn û mîna ku tişte-kî bi hevdu dişêwirin, xwe bi ser hevdu de xwar kiribûn. Mehemed yekî weha bû ku di salên hefteyî de agir ji devê wî diçû. Ewqas tûj bû ku gellek caran serê hevalên xwe jî xistibû belayê. Nuha tûjîtiya wî ya wek berê nemabû. Yekî heta ku mirov bixwaze li ser xwe bû. Bi zend û bend bû. Bi hêza milan kê mî kesî dikarîbû zora wî bibira. Ji bo pazuyên xwe rê xelkê bide, hertim qutikên milkurt li xwe dikirin û ji bo pazuyên wî baştir xuya bibin, milên ku ji xwe berê kurt bûn, qateke din jî lê dihat wergerandin. Gava li dibistana mamostetiyê xwendibû, ji mamosteyekî xwe yê sporê dersên boksê jî stendibû û di çar salan de bûbû boksorekî yeman. Di hin musabeqeyên mehallê de, medalya jî wergirtibû. Ji ber ku hîn jî diçû salona sporê û li wira bi aletên ku masulkan xurt dikin dixebitî, sînga wî bi qasî ku mirov bê qey

ew xwe dibuxudîne, bilind bûbû. Bi laşê xwe mîna atletekî bû. Ji ber vê yekê, gellekan xweziya xwe bi wî dianîn.

Lê tu kesî xweziya xwe bi serçavên Mehemedî nedianî. Hinarikên ruyê wî weha pêşde bûn ku mirovî digot, qey xwe li çavan radikişînin. Çavên wî yên kort çûbûn ku ji xwe berê hûrik bûn, ji ber hinarikên ruyê wî jî bi temamî hûr xuya dikirin. Ji ber vê yekê, ne li ber wî, lê li paş wî, tu kesî navê wî hilnedida û jê re digotin “çavnûtik”. Ji ber ku dersên zimanê zikmakî hatine kêmkirin û bi gellek mamosteyan re ew jî ji ber kêmbûna kar, ji mamostetiyê hatibû derxistin. Salekê ji kasaya bêkariyê alîkarî wergirtibû û beriya ku rojên wî yên alîkariyê biqedin, bi alîkariya hevalekî xwe yê şifertiya trêne dikir, muracaetî kar kiribû. Nuha ev sê sal in ku di îstasyona trêne de karê bilêtfiroşiyê dike.

Dewrêşê Sêrtî û Bêrîvana Batmanî ku sê sal berê bi daweteke mezin, bi hevdu re zewicîbûn jî li ser qoltixa ku pala xwe dabû dîwarê ku texteyê agahdariyê lê daliqandibû, li kêleka hevdu rûniştibûn. Tev li ku sê sal di ser zewaca wan re derbas bûbûn jî bi çavên melûl ên evîndarên bi hesreta hevdu bûn li hevdu dinihêrîn.

Îro keça xwe Zîne jî bi xwe re anîbûn komeleyê. Bêrîvanê bi çavên reş î gir î wek tasan û bi ruyê gewr î boz î girover û bi porê xwe yê dirêj î rengê genimî ku xwe bera ser piştê wê dabû, çavên Dewrêşî hefs kiribûn. Dewrêş û Bêrîvan hem beşdarî munaqeseyê dibûn û hem jî di nav re bêyî ku tu kesî pê bihisînin, bi çavên bi hezkirin li hevdu dinihêrîn.

Bêrîvanê li welêt lîse qedandibû û li vira jî li dibistana bilind beşa mamostetiyê pêşdibistanê xwendibû. Piştî ku xwendina xwe qedandibû, li belediyeyê li hêlîna zarokan



dest bi kar kiribû û îsal jî bûbû şêfê wê hêlînê. Wê çend roj berê semestreya xwe wergirtibû û di hefteya pêşiya me de jî ji bo çûna Rodosê bilêtên xwe veqetandibûn.

Li komeleyê jî bo zarokan odeya biçûk gellek musaît bû. Ger hinek pêlîstok jî bi xwe re anîbin, dikarin heta êvarî sebra xwe bînin.

Dewrêşê ku heta nuha tu karek nemabû ku nekiribû, tam dema ku karê taksîyên nav bajêr pîrr daketibû, takiyek kiribû û dest bi vî karî kiribû. Ji bo çûyina xwe ya Rodosê taksiya xwe bi bazara ku karê li hevdu nêvî bikin, dabû nasekî xwe. Heta nuha, bi Tirkî pirtûkeke helbestan û bi Kurdî jî du pirtûkên çîrokan jî aliyê Dewrêşî ve hatibûn weşandin.

Dewrêş demeke dirêj bi tenê jiyabû. Piştî ku emrê wî gîhaştibû sî û pêncan, hîn nuh zewicîbû û ji vê zewacê zarokeke wan bi tenê hebû. Piştî zewacê jî karê nivîskariya wî îdare dibû, lê ji gava zarok çêbû û pê ve, tu berhemên wî nehatibûn xuya kirin. Berçavka wî hertim di qewlikekî de û di bêrîkê de bû. Heta ku lazim nebûya nedida ber çavên xwe. Ruyê wî hertim kurkirî bû. Çavên wî yên şînê vekirî, bi ruyê wî yê esmer re, ew pîrr şêrîn nîşan dida. Têkiliya wî û sporê qet qut ne bûbû. Ji ber vê yekê, mîna hevalên xwe yên din, kîloyên zêde yên ku tesîrên negatîv li bejna wî bikin jî çênebûbûn. Ji muzîkê pîrr hez dikir. Wî bi xwe jî li gellek enstrumanan dixist. Di pêvajoya sirgûna li Rojhilata Navîn, ne bi xêra tembûra wî ba, roj derbas nedibûn.

Gava ew ket hundur, wan jî navbirrek da munaqeseya xwe û herkesî ew dawetî cîhê li kêleka xwe kir. Berê li sûretên li jor bi rêz daliqandî yên gellek ruyên nas ku bê wext xatir ji wan xwestibûn nihêrî û piştî ku bi awakî resmî silav

li yê ku bi komputura biçûk dixebitî kir, daweta yê ku herî nêzîkî derî bû, qebûl kir û xwe li ba wî bera xwarê da. Bi hatina wî re, bêdengiyeke ji xweber çêbû. Piştî silav li hemûyan vegerand, serê xwe rakir û berê xwe da Ardayê ku hem bi komputura mezin dinivîsand û hem jî di ber re hilm li ser hilmê li çixareyê dixist.

– Arda, dixan ji kozika te nayê! Ma çi bi te hatiye? Berê sitara me ji destê te tune bû. Qeb qeba te bû. Heta ku te em ji guh nekirana, te em ber nedidan.

Ardayî hilmêke din li çixareyê xist. Bi hilmê re, di nava dixanê de ma. Kursiya xwe rast kir, hebekî ji ber komputurê vekîşiya, berê xwe da wî û got:

– Berê berê bû. Berê gellek tişt zelal xuya dikirin, lê nuha hertişt di nav xumamê de wenda bûye.

Ew ji nişka ve li xwe hay bû û ji civatê re got:

– Li qusûrê nenihêrin, belkî we li ser tişteki sohbet dikir. Ez hêvî dikim ku min sohbeta we ne birrî be. Ez tika dikim, bê hûn li ku mabûn, ji wira dewam bikin.

Civatê xwe ji bo domandina sohbetê amade kir. Gava ew ketibû hundur, Mehemed dipeyivî. Mehemedî îtiraza ku peyva wî nivco mabû kir û bi vî awayî sohbet ji cîhê ku mabû, dewam kir.

Mehemed:

– Keko, divê ez peyva xwe biqedînim. Ji xwe, hindik mabû.

Civatê bi hevdu re rê dabû Mehemedî. Gava ew ketibû hundur, axavtina Mehemedî ya li ser pirsra 'Gelo partiyeke sosyalîst pêwîst e, an na?' li ber qedandinê bû. Mehemedî nuha jî netîceyên ku divê ji axavtinê bînin derxistin, rêz dikirin.

– Sosyalîzm dîktatorî ye. Burokratîzm e. Birçîbûn e, herb e. Belengazî ye. Hem Feqîrî û hem jî fuqurî ye. Talankirina îmkanan e. Me hemuyan digot, paşdevegerandin ne mumkun e. Em çî qas rast bûn, derket ortê. Mulkîyeta şexsî tune be, pêşketin jî xeyal e. Ez ê kurt bibêjim, pêwîstiya me bi partiyeke weha tune ye. Ma sosyalîzm bi serê me Kurdan bi tenê ketiye?

Mehemedî tev ku gotibû, ez ê kurt bibêjim jî lîsteya argumentên xwe dirêj kir. Hemû tiştên ku herroj li dijî sosyalîzmê digotin, di vê munaqeseyê de jî dubare kirin. Dewrêş li benda qedandina peyva wî bû û gava peyva wî qediya, got:

– Ger destûra we hebe, ez jî dixwazim di vî warî de hin tiştan bibêjim.

Tev li ku yên sebra wan nemabû jî hebûn, civatê bi hevdu re gotibû:

– Kerem bike!

Dewrêşî xwe baş konsantre kiribû. Gava Mehemed dîpeyivî jî bi zorê xwe girtibû. Piştî destûra civatê, bi hemû cidiyeta xwe ve dest bi peyvê kir.

– Hevalno, em qebûl bikin nekin, sosyalîzm jî lênerînek e. Di civata Kurd de jî mîna hemû civatên din ên dinyayê, menfaetên cuda hene û grûpên ku temsîa van menfaetan dikin, hene. Ev gellek tebîî ye ku herkes dê li gor lênerînên xwe, di qada siyasî de xuya bibin. Sosyalîzm jî ji bo çareserkirina pirsan û birêvebirina civatê alternatîveke cuda ye. Ger tu pirrdengiyê, mîna dewlemendiya civatê dibînî, gelo tu ji bo çî dixwazî bi tenê sosyalîzmê ji nava vê pirrdengiyê derxînî? Ma te encamên qedexekirina lênerînan bi çavên serê xwe nedîtin? Ma qey te tu ders jê dernexistine? Û wekî din jî sosyalîzm ji Kurdan bi tenê re nemaye. Rast e, krîzek

tê jiyandin û bayekî em hemû dane ber xwe. Hela bê ka kî dê bikaribe di ber xwe de bide.

Gava Dewrêş dipeyvî, wî jî xwest ku hin tiştan bibêje, lê dû re di hundurê xwe de fikirî ku ji destpêkê de ne di nav munaqeseyê de ye, dev jê berda. Lê Ardayî berê li wî nihêrî û mîna ku bibêje, 'Binihêre, te digot, dixan ji kozika te nayê, ava dixan!' û dû re berê xwe da civatê û peyvî.

– Welleh, îdealên sosyalîzmê baş bûn. Ez di vî warî de, hîn jî ne poşman im. Lê pratîka welatên rojhilat û ev îdeal qet li hevdu nakin. Mirov nema dizane, bê çi biparêze û çi neparêze.

Dewrêşî ji nişka ve xwe avêt ortê û got:

– Ji xwe, tiştê ku nayê fahmkirin, ev e. Gellek kes îdealên sosyalîzmê û tetbîqatên ku li gellek deverên dinyayê li ser navê sosyalîzmê hatin kirin, ji hevdu veneqatîne. Li gor baweriya min, çewtîtiya herî mezin ev e. Rast e, gellek dersên ku divê ji van pratîkan bînin wergirtin hene û divê em gavên ji bo pêşerojê di bin ronahiya dersên ku ji van pratîkan hatine derxistin, biavêjin. Em bi xwe jî....

Lê Şêxoyê ku tu carî li benda dora xwe nedisekinî, nehişt Dewrêş peyva xwe bidomîne. Şêxoyî bi kerbekê û bi dengê bilind peyva Dewrêşî birrî û tiştên ku di dilê wî de zîl dabûn, derketin ortê.

– De hûn bi serê xwe bikin, dev ji van meseleyên pûç berdin, lo! Me heta nuha da dû we, lê binihêrin bê we em di ku re derxistin. Welat wêran bûye. Hertişt li bin guhê hevdu ketine, zaro hîn jî munaqeseya felsefeyên cuda dikin. Ev bîst sal in, eynî çîrok e! Hasil gîhaşt Mûsil, lo! Hûn li kî derê nin? Ji xwe, we berê jî weha kir. We hem mala xwe û hem jî

ya me xera kir. Ma hûn ê bi vî aqilî bigihêjin kî derê? Ma ne bes e? Di heftê salî de we tîpin afirandin ku nuha kapîtalîst jî nema dizanin bê wê wan çawa îslah bikin.

Hemûyan bi teb'ê Şêxoyî dizanîbûn. Ji ber vê yekê, dilê kesî jê nedima. Lê tev vê jî Beriya ku hin ji wan peyvin ne li rê, ji Şêxoyî re bikin ku dû re tesîreke negatîv li munaqêşeyê jî bike, Nasirî bi dengêkî ku tansiyona munaqêşeyê hebekî daxîne, hêdî hêdî dest bi peyvê kir.

– Li gor baweriya min, tev ku ez ne sosyalîst im û lênerî-nên min, ji yên wan gellek cuda ne jî ez bi xwe, xweorganî-zekirina sosyalîstan ji bo Kurdan, mîna xeterekê nanirxî-nim. Divê her hêla civata me bikaribe xwe bi rêxistin bike. Em nikarin ji bo hin lênerînan demokrasîyê bixwazin û ji bo hinin din jî qedexekirinê biparêzin. Ev paradoksek e. Gotina Voltaire bînin bîra xwe. Bi qasî ku tê bîra min, weha bû ' Ez wek te nafikirim, lê ji bo azadiya fikrên te, ger pêwîst be, ez amade me ku canê xwe feda bikim'.

Sînoyî lê nihêrî ku îdealên rojavayî reng didin munaqêşeyê, debar nekir. Hin hereketên wî yên lê bûbûn adet ku bêyî zanebûn dihatin kirin, dîsa derketin ortê. Bi tilîka xwe ya îşaretê herdu biruyên xwe rast kirin. Eniya xwe hebekî fir-kand. Ji bo dengê xwe veke, berê di ber xwe de kuxiya. Serê xwe rakir û hîn beriya ku Nasir bigihêje ku gotina xwe ya taliyê bi temamî biqedîne, dest pê kir.

– Heta nuha tu kesî ji we tiştêkî cuda negot. Hûn hemû ne fikrên xwe, lê fikrên xelkên din tekrar dikin. Birano, divê hûn êdî bi awayekî din li meseleyê binihêrin. Ev awayên ku we heta nuha ceribandin, nemeşyan. Ji bo çi? Teqlîd bûn, teqlîd! Teqlîda rojavayê! Ev lênerîn ji derve ketine nav civata me. Civata me civateke musulman e. Dînê îslamê jî dînê

heq e. Ancax îslam dikare pirsên me ji binî de çareser bike. Kurd ancax di nava biratiya musulmanan de dikarin bibin xwediyê fonksiyonekê. Min jî berê wek we digot. Lê ez zû li xwe hay bûm. Ez we jî dawetî ser rêya heq dikim.

Sînoyî bi devokê xwe yê Cizîrê zor dida sînorê zanebûna xwe ya di warê dînî de û argumentên xwe pêşkêş dikirin. Lê Bêrîvanê dikir û nedikir, nikarîbû li benda sebra xwe rawestiya. Û asoxî jî xwe negirt û bi dengê bilind ku nêzikî sînorê qêrînê, ji Sînoyê ku tizbiya xwe dikişand û behsa feyda îslamê dikir re got:

– Le Yezîdî? Tu ê Yezîdiyan çawa bikî, Sînoyê musulman? Ma ew jî ne Kurd in? Tu ê wan ya bi zorê bikî musulman, ya jî qetil bikî? Tu dibêjî dînê Îslamê dînê heq e. Ji bo her zilamekî çar jin, tiştêkî heq e? Ji bo çi tersê wê bi we zor tê?

Gava ev gotin ji devê wê derketin, ji qahra sor bû. Perçeyeke porê wê yê ku bi xêra toqeyê hatibû zevtkirin, filitî û xwe bera ser eniya wê da. Piştî bi destê xwe porê ku ketibû ser eniyê da alî, bêyî ku firseta peyvê bide hinin din, peyva xwe domand.

– Tu dibêjî ku lênerînên we teqlîd in û ji derve hatine. Baş e, ma Îslam di nava Kurdan de derketiye? Ma ne bi zora şûrê Ereban û talankirineke mezin ketiye welatê me? Ger rojekê îqtîdar têkeve destên ên wek te, hûn ê tu kesî ji me sax nehêlin. Ma divê mirov ên wek we...

Bêrîvanê çavên xwe girtin û çî hat ber devê wê, bi dengê hêl got. Sîno li cîhê xwe sar ma. Bi derbekê zer bû. Lêvên wî lerizîn. Ew ne li benda reaksiyoneke weha bû. Dîsa biruyên xwe rast kirin. Eniya xwe jî bi dû wan re firmand. Bêrê mîna ku bibêje “ma ne dibû ku tu li benda qedandina peyva min bima” bi çavên bi meraq û ecêbmayî li Bêrîvanê nihêrî. Lê

dû re di hundurê xwe de got “Nalet li çavên şeytên bê!” û hêrs û ecêbmayina xwe bi gotinan ve neanî zimên. Qîma xwe bi awireke ku hêrs û ecêbmayina wî jê dihat xwendin, anî. Mîna ku bibêje “Ma we dît, bê vêya çi kir?” li civatê nihêrî. Çavên wî bi yên Dewrêşî ketin. Çavên wan bi qasî çend saniyeyan li ser hevdu man. Sînoyî ji çavên Dewrêşî sînyalên ku wî jî ev reaksiyon zêde ditiye û mîna ku bibêje, “Qet nebe, tu hebekî îdare bike” xwend. Dewrêş dû re li kêleka xwe zivirî û mîna ku bibêje, “ Fikrên xwe bibêje. Lê ma tu mecbûr î ku bi vê uslûbê xwe îfade bikî?” li çavên Bêrîvanê nihêrî. Bêrîvanê di dilê xwe de, ji ber dozaja reaksiyona xwe poşmaniyek his kir. Lê carekê qewimîbû û ya din jî ji aliyê naveroka helwesta xwe jî qet ne poşman bû.

Dewrêş hîn difikirî bê ew ê vê rewşê çawa serrast bike, Şêxoyê ku zêde guh nedida tu kesî wek xwêya ku tu têxe êgir, bi metodên xwe ve li ser Sînoyî girê da.

– Ji xwe musulman ji me kêm bûn. Ma em li her perçeyî ne li ser navê musulmantiyê tên qetilkirin, lo! Musulmantîiyê wek ku xwuşka Bêrîvanê jî got, bi zorê em teslîm stendine. Madem bi zorê hatiye, welleh divê bi zorê jî bê qewirandin. Careke din jî van fikrên rizyayî û beredayî nîne vê derê!

Sînoyê ku xwêdan bi eniyê ketibû di nava wan de, xwe bi tenê his kir. Sor bûbû û tizbiya xwe hîn bi leztir dikişand. Hêrsa wî ya ku ji ber gotinên Bêrîvanê dest pê kiribû, lê bi nihêrînên Dewrêşî re dikira meyla daketînê pê re çêbûbûya, bi axavtina Şêxoyî re dîsa bilind bûbû û nuha xwe di hemû tevgerên wî de dida der. Çavên wî ji hêrsa dikira ji serê w bazbidana. Ew salona ku heta nuha gazin jê nehatibû kirin, nuha pîrr germ hatibû hiskirin. Sînoyî mîna ku bibêje “Gelo

mirov nikare pencereyeke din jî veke” li Ardayî nihêrîbû. Dewrêş êdî nema dikarîbû rawestiya. Mîna ku bibêje, “Lawo Şêxo, me hîn uslûba Bêrîvanê serrast nekiribû, îcar te ji bo çî weha kir” çavên xwe li çavên Şêxoyî gerandin. Lê Şêxoyê ku dizanîbû bê agir çawa gûr kiriye, çavên xwe bera erdê dabûn. Dewrêşî beriya ku hinin din bi awayekî din, agir gûrtir bikin, mudaxeleiyî munaqeseyê kir û gotinên ku weke bayekî hênîk bi ser Sînoyî de bê, ji devê wî herikîn.

– Hevalno, em bi vî awayî nikarin hevdu baş fahm bikin. Vê uslûbê heta nuha, em bi santîmekê pêş de ne birine û dê ji nuha û pê ve jî tu feydeya wê li me tune be. Sînoyî lênerînên xwe anîn zimên. Me jî guhdarî kir. Niqteyên ku em li dij in, ji xwe dê bibin mijarê rexneyên me. Ez bi xwe jî musulmantiyê mîna tendenseke demokratîk nanirxînim. Gava Şêxo dibêje, ‘Em li her perçeyî li ser navê musulmantiyê tên qetilkirin’, ez pê re mim. Lê tev vê jî ne musulmantî û ne jî tu baweriyên din, bi zorê ji ortê ranabein.

Piştî nermbûna hewayê, Nasirî jî di warê toleransa li hember lênerînên cuda de, lênerînên xwe anîn zimên.

– Min berê jî gotibû, li vê civatê wek her lênerînê, heqê musulmanan jî heye ku xwe organîze bikin û li gor baweriyên xwe bixebitin. Divê ev îmkan ji bo wan jî bê naskirin. Lê divê ew jî li hember ên ji derveyî xwe, bi tolerans bin.

Peyva Nasirî bi dengê Ardayê ku ji nişka ve rabû ser xwe û got; ‘Wey, bi Xwedê em ji xebera man!’, hat birrîn

Gotina Ardayî bala hemuyan ji munaqeseyê ber bi radyoyê ve biribû. Arda ber bi radyoyê ve çû û pê li bişkoka wê kir. Çend deqîqe di ser xeberan re derbas bûbû. Munaqeseya civatê tev xeberan jî bi hemû germahiya xwe dewam dikir. Behsa başûr hat kirin. Ardayî xar bir bişkoka dengbi-



lindkirinê. Munaqêşeya civatê jî bi derbekê rawestiya.

Guh bel bûn.

Bayekî xemgîn salona komeleyê dagirt. Êdî tu kes nedipeyivî. Bi tenê li ber xwe dinihêrîn. Texrîbat bê sînor bû. Serê xwe bilind kirin û li çavên hevdu nihêrîn. Dilên hemûyan bi hevdu re lê dixist. Pêwîstiya wan a bi hevdu û niqteyên wan ên muşterek, hemû cudabûnên wan, dabûn aliyekî.

Xuya bû ku dê hejmara dayikên ku dilên wan bişewitin, kezeba wan biperitin û qêrîna wan di ezmanan re derkevin, her biçê bêtir bibe.

Bêrîvanê dikira ji qehra xwe bixwara. Çiya bi hemû heybeta xwe, ezman bi hêmu şînahiya xwe û berrî bi hemû bereketa xwe ve li ber çavên wê wenda bûn. Xwe di tarîtiyeke bê ser ber de, bi tikî tenê his kir. Piçêke sirra bê jî nemabû. Hiseke weha hatê ku dikira bifetisiya. Nal nala yên ku di bin axê de tehamul nedikirin, di guhên wê de kir zîngînî.

Bêrîvanê di pêvajoya hîlbijartinan de li wira, di bin ezmanên şîn de, ji çiyayên bilind li berriya bê serr û ber temaşe kiribû. Wê dil dîtibûn bi hevdu re lê dixistin. Wê zarok dîtibûn, li warê wêrankirî, bê bav û di himbêza jinên bî yên çav li rê de. Wê gund dîtibûn kevir li ser kevir nemayî. Ew li Hîroşîma duyem li sûcê mirovatiyê rast hatibû. Wê li cîhê ku bi erdê re bûbû yek, mirov dîtibûn bi hêviyê ve hilmîştî.

Bêrîvanê êdî îdare nekir û got:

– Haho, ji bo Xwedê! Ma dîsa? Ma hûn gurên hevdu ne?

Deng hew jê derket. Li cîhê xwe mat ma. Dinya li ber çavan tarî bû. Hêviyên wê qels bûn, daket sewiyeyeke gellekî nizm. Li Helebçeyê fikirî... Li zarokên ku di himbêza dayikan de bê can, fikirî. Li koça milyonên ku berê xwe dabûn çiyayan û gellek canên teze kiribûn gorî, fikirî. Kelogirî bû.

Li dora xwe nihêrî. Bi nefreteke bê hed û hidûd tije bûbû. Baş bû ku tu kes neket xulqê wê. Na na, dikarîbû bi wan de biteqiya û kerba hertiştî di serê wan re derxista.

Halê Bêrîvanê yê ku civat bêtir xistibû nav bêdengiyê, tesîreke mezin li wî jî kiribû. Nexwest bêdengiya civatê xera bike. Li erdê nihêrî, bîstikekê weha ma. Dû re daket kûrahiya dîrokê. Li şerê ku li Troiayê çêbûbû fikirî. Xwest paraleliya wê ya bi îro re, ya ku li bejna me jî dike, peyda bike. Serê xwe bi xemgînî kil kir û di hundurê xwe de got:

– Li gor mîtolojiyê, di şerê Akhayî û Troiayîyan de, şer bi çî mahneyê dest pê kiribe jî şerê esîl, ne di navbera wan de bû. Şerr di navbera Xwedayên cuda de bû. Munaqeseya şer li çiyayê Olymposê di nava xwedayên cuda de hatibû kirin. Xwedayê herî mezin, bavê Xwedêyan Zeus ji bo birêvebirina şerî derbasî çiyayê Îdayê bûbû û ji bo alîgiriyê, hemû Xwedê azad hiştibûn. Athene, Apollon, Here, Poseidon, Hermes, Hephaistos, Ares, Aphrodite herkesî aliyê xwe zevt kiribû û şer gûr kiribûn. Herdu gel li gor daxwazên Xwedayên cuda, ji derveyî pîyonên şerî, ne tu tiştêkî din bûn.

Hebekî rawestiya. Li ser vê mîtolojiyê dîsa fikirî. Lê di dawiyê de dev ji kûrdaketinê berda û di ber xwe de kir niçe niç û got:

– Ez hêvî dikim ku em jî ji berdêla Xwedayên cuda bi hevdu re şer nakin.

Xuya bû, tu kesî nedixwest vê bêdengiyê xera bike. Herkesî haziriya xwe ya çûyina malê dikir. Piştî çend deqîqeyan Dewrêş rabû ser xwe û dîsketek ji bêrîka xwe derxist û jî Ardayî pirsî:

– Karê te bi komputerê heye?

Ardayî jî karê xwe yê îro qedandibû û ji ber vê yekê, difi-

kirî ku ji bo çûyinê xwe amade bike.

– Karê min qediya, lê ez ê biçim malê. Divê ez derî kilît bikim. Ma te ji bo çi pirsî?

– Min ê ji bo kontrola nivîsek e ku di vê dîsketê de hatiye qeydkirin, ew ji laserê derxista.

Arda hema ji cîhê xwe rabû û got:

– Ev bi tenê be, tu dikarî derxîne. Ez ancax heta panzdeh deqîqeyan xwe hazir bikim.

Herkes heta ku Ardayî xwe hazir kir, li benda wî man û dû re jî hemû bi hevdu re ji komeleyê derketin. Yên dê bi erebeyên xwe biçûna û yên ku dê biçûna îstasyona trêne, xatir ji hevdu xwestin û bi hesreta welatekî şewitî ve her yekê ji wan berê xwe da taxeke cuda ya Stockholma ava.

Wî jî berê xwe da îstasyona trêne. Herdu destên xwe xistin bêrikên pantalonê xwe û xwe pê re civand ser hevdu. Piştî wî hebeke xûz bû. Milên wî ber bi jor ve bilind bûn û situyê wî jî wek kîsoyê ku serê xwe heta nêvî kişandibe qalîkê xwe, di navbera herdu milên wî de melisî. Çend caran li vî halê xwe hay bûbû û destên xwe ji nişka ve ji bêrikên xwe derxistibûn, piştî xwe rast kiribû û sînga xwe derxistibû pêş. Dû re serê xwe bilind kiribû, li dora xwe nihêribû û meşiyabû. Lê gava ji bîra wî diçû û xwe serbest ber dida, dîsa diket eynî halî. Vî halê wî demeke dirêj mîna problemeke mezin, serê wî êşandibû. Lê gava ferq kir ku nikare tişteke li hember vê problemê bike, wî jî ev problem bê dilî xwe, lê wek ku hebû, qebûl kiribû.

Heta gîhaşt malê, ji hal de ketibû. Di xwe re nedît ku li televîzyonê jî binihêre. Piştî xwarin û hin karên rûtîn, xwe bi zorê gîhand nivînê xwe. Pirtûka Nelson Mandela ya ku na-

vê wê “Ew rêya dirêj a ber bi Azadiyê ve” bû, ji ser maseya ber qeryoleyê rakir û ji beşa şeşan, ji “ Ew qurnefila reş” û pê ve du rûpel bi zorê xwendin. Lê xewê zora wî bir û ji ber vê yekê, wî jî ji mecbûrî ji bo îşaretkirinê, kaxizek xist nav pirtûkê û ew dîsa danî cîhê wê yê berê. Xwendinê ew ji wê piça taqeta ku li hember xewê mabû jî mahrûm kir. Hîn şev tam kerr nebûbû. Dengê zarokên ku li bexçeyê taxê dileyiztin, mîna ku pirr dûr bûn, bi awakî lawaz dihat. Piştî ku fahm kir ku êdî nikare ji destê xewê bifilite, serê xwe li ser bahlîfa perîkî xweş kir û xwe sipart xewê. Wî firseta ku xwe biqelibîne vî alî û wî alî jî peyda nekir. Hema çavên xwe çawa girtin, di xew re çû.

Li daîreyeke qata heyştan a ku berê balkonâ wê bi daristanê ve bû, dengê alarmeke çavnebar hat bihîstin. Alarma be-xîl a ku tehamulî dostaniya lihêfa germ û laşekî bi tikî tenê nedikir, biryara xwe dabû. Divê ev dostaniya li odeya germ û tarî, lê ji aliyê oksîjenê ve hatiye feqîrkirin, bihata qedandin û dijminan miradê xwe bikirana.

Dengê alarmê asoxî, bi ya xwe kir û ew bi hêrs ji xew rakir.

Çavên wî, bi zorê vebûn.

Di xwe re nedît rabe ser xwe. Hîn piçek xew pê re mabû. Lê wî dizanîbû ku gava mîrata alarma yekem lêxist, êdî hemû hewildanên ji bo razanê bê feyde nin. Destê mirovî ji nivînan nabe. Mîrov xwe di kozikekê de, li benda dengê alarma duyem his dike û bi dengê alarma duyem re, tiştê ku wê biqewimiya, diqewime. Xewa mirovî diherime. Ji tirsaxezeba alarmê, nivîn jî dikevin tayê û nema sitarê li mirovî di-kin. Gava xewa şêrîn ji ser çavên mirovî diçe, ji rabûnê pê ve tu çare namîne.

Xezeba alarma duyem dûrî van deveran be, bi ser wî de hat û ew bi yekcarî ji desthilanî de xist. Lihêfa ku ruyê wê kulîlk kulîlkî bû, bi hêrs ji ser xwe avêt, çavên xwe firmand û herdu lingên xwe ji qeryoleyê bera xwarê dan. Şimikên li binya qeryoleyê xistin lingên xwe û çû ba pencereyê. Berê jalûziya ku nedihîşt tîrêjên tavê bidin odeyê, da alî. Tîrêjan bi derbekê re êrîşî odeyê kirin. Çavên wî ji ber şewqa tîrêjan, bi tamamî hatin girtin, lê tîna tîrêjan xwe da laşê wî û ew bi hemû dostaniya xwe ve himbêz kir. Piştî wê bela saeta ku ew ji xew şiyar kiribû, germahiya tîrêjên ku ode dagirtibûn, kêfxweşiyek pê re peyda kir.

Dû re ji bo guhertina hewa odeyê, pencere piçekî vekir.

Xwe li ser piyan vezeland. Bi vezelandinê re bawîşkek hatê. Bi bawîşkê re, bêvila wî qermîçî û ber bi jor ve hat kişandin. Lêva wî ya jêrîn weha daket ku diranên wî yên jêrîn, derketin pêş û jora piduyên wî yên jêrîn, xuyabû. Bawîşka wî hingî weha wextekî dirêj ajot, mirovî digot qey devê wî dê nema bê girtin.

Devê wî asoxî, bi saxî û selametî hat girtin. Bêî ku çongên xwe bişkîne, du caran daqûl bû û ji bo destên xwe bighîne erdê hewil da. Bi ser neket û cara sêyem jî neceriband.

Ev mehek e ku birayara bazdanê dabû. Xwedêgiravî, wê li daristanê baz bida. Biryar hêsan hatibû dayin, lê bicîhanîna wê pirr pê zehmet dihat. Ji ber vê, ancax pêr, dest bi bazdanê kiribû. Gava do serê sibehê rabûbû ser xwe, hemû laşê wî wek êzingan hişk bûbû. Her deverên wî diêşiya. Do, êşa laşê xwe kiribû mahne û baz nedabû û gotibû:

– Ez ê serê sibehê baz bidim. Ma mirov xwe ji ser rojekê çeng bike, dinya xera nabe.

Gava bazdan hat bîra wî, canê wî girantir bû û weha got:

– Ooof! Hema welleh, ez îro jî baz nadim.

Bazdan, xweşuştin û dû re şuştina cilên di nav xwêdanê de mayî... Canê wî girantir dikirin.

– Ez dikarim rojêke din baz bidim. Tu divê qey rojên xwedê qediyandin.

Firkandina çavên xwe domand. Gava ji bo rahiştina rojnameya ku di qulika derî ya ku ji bo posteyê hatibû vekirin re hatibû avêtin, ber bi derî ve çû, çavên wî li enfîyeya ku cîranê wî dîsa di qulika derî re avêtibû hundur ketin Bêhna wî teng bû. Ji bo dilê xwe rehet bike, çend xeber dan. Aqileke hatê ku biçe li deriyê cîrên bixe û bibêje 'êdî bes e!'. Lê dûre

ji bo bi benda wî nekeve, vê carê jî ev neheqî daqurtand.

Lê di dilê xwe de got:

– Ev cara dawiyê ye. Ger te careke din weha kir, bila tu di kefa destên min ne, kero!

Hema perçeyê rojnameyê yê ku enfîye ketibû ser jê kir û avêt sepeta kaxizan û bi vî awayî xwe ji enfîyeya ku hatibû bikaranîn, xelas kir. Dû re berê xwe da korîdorê. Li ber devê deriyê tûwaletê rawestiya. Çend saniyeyan fikirî, gelo hem biçûya tûwaletê û hem jî rojnameya xwe li wira bixwenda? Lê ji nişka ve biryara xwe guhert, rojname danî odeya rûniştinê û berê xwe da metbexê. Mekîneya qahwekelandinê li ser maseyê bû. Rahîşt qahwedanka cam û da ber kaniyê. Dû re ew av bera mekîneyê da. Li parzûnê qahweyê geriya. Dolaba ser firneyê vekir, ne di wir jî de bû.

– Ev mîratê pêrzûn ketiye kî derê? Na'let li çavên....

Hîn peyva xwe tamam nekiribû, çavên wî li ba pencereyê, bi paketa parzûnên kaxizî ketin. Parzûnek jê derxist, du keçî qahwe bera hundurê pêrzûn da û xist parzûndankê û danî ser qahwedanka cam. Fîşa mekîneyê ji xwe di prîzê de bû. Wî bi tenê pê li bişkokê kir. Piştî bîstikekê, ava kelandî hêdî hêdî bi ser qahweya di pêrzûn de bû, hat û bêhna qahweya kelandî hundur dagirt. Wî qahwe di vî halî de hişt û ji bo serçavşuştinê, berê xwe da serşokê. Hîn ruyê xwe bi peşkirê baş zuha nekiribû, berê xwe da pakêta xwe û çixareyek pêxist. Xar bir qahweyê û fîncanek heta ber dev dagirt. Qurtik ji qahweyê vexwar û bi ser de jî hilmek li çixareyê xist. Herduyan bi hevdu re ta'mek pîrr xweş da zimanê wî. Di wê esnayê de tiştê ku ji qahweyê û tûtinê pêkhatî xeyal kir. Di ber xwede fikirî:

– Gelo di pêşde dê mumkun be? Ji xêra Xwedê re tiştêkî

weha bihata peydakirin...

Dû re di ber xwe de got:

– Maşallê, dengê min neçûbe tu kesî. Ez ditirsim, hinek van tiştên ku ji ber esareta min a li hember çixareyê ji devê min derdikevin, mîna şîretan fahm bikin.

Pê re çixareyeke din pêxist. Xweliya çixareyê bi çend hilman bi qasî ku nema bikaribe xwe ragire, dirêj bû û asoxî ket ser xalîçeya ku li ber dilê wî pîrr delal bû. Ji bo piçikeke xwelî çû tozkêşa xwe ya ku bi kevnî kiribû, anî û dengê wê yê mîna aşê xerabe cîranê di xew de mabû jî ji xew rakir. Tozkêşê xwelî bi derbekê dabelihand. Wî dengê aşê xerabe birrî û tozkêş danî cîhê wê. Gava vegeriya çavên wî li tabloya ku li dîwêr daliqandibû ket. Hebekî lê nihêrî, her carê mahneyeke din jê derdixist. Vê carê ji bo derxistina tu mahneyên nuh hewil neda. Lê fikra bi lavlavkekê xemilandina wê, serê wî mijûl kir. Hevalekî wî ji bo ku tablo baştir û xweşiktir xuya bibe, pêşniyara kirrîna lavlavkekê kiribû. Gava pêşniyara hevalê xwe bi bîr anî, tabloya ku ji lavlavka li dorê pêçayî, bê par mabû, hiseke mîna ku ji xweşikbûna xwe tişteke wenda kiriye, pê re peyda kir. Lavlavka ku dixwest tabloyê bixemilîne, ne ji ber tu tiştî, lê bi tenê ji ber tirraliya di vî warî de, hîn jî nehatibû kirrîn. Di kovarekê de ji nivîskareke jin a ku li surgûnê jiyabû, weha xwendibû:

– Dema min dest bi jiyana surgûnê kir, min weha hêvî dikir ku lavlavka min a li odeya rûniştinê, du caran li dora odeyê bizîviriya, ez ê vegeyiyama welêt. Lê wê dora xwe ya çaran jî temam kir, hîn ez û ew li warekî nenas li çavên hevdu dinihêrin.

Gelo lavlavka wî hebûya, heta nuha dê xwe çend caran li dora odeyê ggrandiba? Lê ma ji bo wî, li her welatekî lav-



lavkek diviyabû. Surgûna wî jî nedişîbiya ya xelkên din. Ji bo lavlavkê biryara xwe da û êdî ev mesele bi yekcarî girt.

Rahişt fîncana xwe û çû li ber televîzyonê rûnişt. Wî cîhê xwe li ser qoltixên çerm ê rengê wan reş ku ji IKEA'yê hati-bû kurrîn, xweş kir. Xalîçeya malê Çînê ya ku dora wê sipî û orta wê reş, bi steryoya Pioner a reş re qenepe tamam dikirin.

Ji ber ku beriya du hefteyan motora parabolê jî kurrîbû, êdî ji bo berê parabola xwe bi satelîtên cuda veke, ne hewce bû ku ji cîhê xwe rabûya. Piştî ku bahlîfeke biçûk a li ser qenepeyê bû, da ber piştta xwe, bi komandoyê li teksta televîzyonê geriya. Beşa nûçeyan vekir; nûçeyên hundur welêt û yên derveyî welêt xwendin. Dû re derbasî beşa futbolê bû, encamên maçan li wir hatibûn nivîsandin.

Dengê telefonê nehişt ew xwendina tekstê biqedîne. Telefon ji Daîreya Kar hatibû kirin. Navberka ku dosya wî li ba wê bû, ji bo hevdudîtîne wextek jê re veqetandibû. Li gor nameya ku di vî warî de hatibû şandin, diviyabû du rojên din saet di yekê de hevdu bidîtana. Lê navberka li Daîreya Kar dixebitî ji ber konferanseke xwe, dixwest wextê vê hevdudîtîne biguherîne. Ji wî re qet ferq nedikir. Ev du meh in ku ew bê kar bû. Ji ber vê yekê, kengî ba, qet ferq nedikir. Jinikê ew temî kir ku heta hevdudîtîne, divê ew jî ji bo karpeydakirinê telefonî çend deveran bike. Û gava kar nehat peydakirin, divê xwe ji bo xwendineke meslekî ya ku pereyên wê ji aliyê Komîsyona Kar a Wîlayetê ve bi rêya kasaya sîgortayê tê dayin, amade bike. Beşa xwendina meslekî ne aîdî wê bû. Ji bo muracaeta di warê xwendina meslekî de, ne hewce bû ku mirovî ji berê de wext veqetandibe. Hema mirov gava çû Daîreya Kar pê li bişkoka makîneya ku kaxi-

zên dorê dide, dike û bi vî awayî dikeve dorê. Piştî hevdudî-tina navberkê an navberka ku bi vî beşî re elaqadar e, dikarîbû kurseke li gor armancên wî yên pêşerojê bihata tesbîtkirin. Ev çend car in ku diçe kursên weha.

Li gor wî, di rewşa îro de çend kursên cur be cur bixwîne jî dê nikarîba kar peyda bikira. Di vê demê de karpeydakirin, pîrr zehmet bû.

Telefonê kulên wî dîsa tev rakiribûn. Beriya Duwanzdehê Îlonê, du salan di Fakulteya huqûqê de xwendibû. Lê hîn dest bi sinifa sîsiyan nekiribû, leşkeran welat li yên wek wî kiribû zîndan. Wî jî ji ber vê yekê, xwendina xwe nîvco hiştibû. Wî dizanîbû ger huqûq qedandiba jî wî dê li vê bazarê dîsa tu kar peyda nekiriba.

Gava rewşa bazara kar a vê demê, anî ber çavên xwe, serê xwe kil kir û di ber xwe de got:

– Xwediyên kar dest pê kirine û yên xwedî meslek ku nûha kar dikin jî ji kar derdixin. Îcar em ê hîn bixwînin, bibin xwedî meslek û di bazara kar de bi yên din re têkeve reqabetê. Kero nemire bihar hat!

Vegeriya ser tekstê û ji cîhê ku mabû, dewam kir. Piştî programên herdu kanalên televîzyonên dewletê yên îro xwendin, televîzyon girt û komando danî ser maseyê. Wî jî televîzyonên din, ji ber pîrrbûna reklamman hez nedikir. Gava di nava filmekî de an programekê de, reklam tam di dema herî girîng de, ji nişka ve dihatin weşandin, îmana wî dihat serê bêvila wî.

Piştî danîna kûmandayê, dilê wî çû qahweyeke din, lê hîn ranebûbû, bi dengê ambulansê veciniqî. Wê gavê ji nişka ve, çeng bû ser xwe. Lê çend saniyeyan, li ser piyan, sar sekinî. Nema dizanîbû bê çi qewimiye. Bi heyecan baz da bal-

konê. Bi ambulansê re, erebeya doktor û ya polîsan jî dora xênî girtibûn. Zarokên ku li ser qûmê dileyiztin jî dev ji leyiztika xwe berdabûn û bi meraqeke mezin li dora xwe dinihêrîn. Meraqeke mezin ew bi temamî xistibû bin tesîra xwe. Bîstikekê bi taswas li çûyin û hatinan mêze kir. Lê tişt fahm nekir.

Meraqa wî her diçû zêdetir dibû û dû re xwe bi temamî bi destê meraqa ve berda. Ji bo fahmkirina buyêrê, bi lez eşofmanê xwe yê adîdas li xwe kir û tişortekî ku stadiumî li sîngê hatibû nivîsandin bi ser de berda û berê xwe da asansorê. Asansor meşgûl bû. Ji ber vê yekê, berê xwe da derencekan. Her du pêlik kirin gavek û bi lez daket xwarê. Gava daket jêr, li cîranê xwe yê sermezin î porxelek rast hât. Cîranê wî di civateke weha de jî li usûlan pirr miqate bû. Arîstokratbûna cîrên ji axaftin, rabûn û rûniştin û danûstendina wî, pirr eşkere xuya dibû. Gava jê pirsî, cîranê wî berê li darbesta ku ber bi ambulansê ve diçû nihêrî, kesereke kûr kişand û dû re bi Swêdiya xwe ya bi telafuza Farisî û bi dengêkî liberketî agahdariya ku wergirtibû, gîhand wî.

Gava rewş fahm kir û kalê cîranê xwe yê heftê û du salî ku di daîreyeke qata yekem de dima, li ser darbestê dît, devê wî ji hev ma. Kalo ber bi ambulansê dibirin.

Nema dizanîbû bê wê çi bigota. Hema bi tenê di ber xwe de weha got:

– Çar meh... Çar meh...

Her wî kir niçe niç, cîranê wî jî keserek kişand. Demekê weha bêdeng man û bi tenê bi çavên xemgîn li hevdu nihêrîn. Li yên ku termê kaloyî ber bi ambulansê dibirin nihêrî. Hewil da ku hisên wan fahm bike. Lê di ruyê wan de, ji derveyî cidîyet û berpirsiyariya karê wan, tu tişt ne xuya bû.

Dû re di ber xwe de got:

– Ev çar meh in ku termê kalo di vê apartmanê de ye û kes ji me pê nehisiyaye.

Piştî ku kaloyî kirêya xwe çar mehan li ser hevdu nedabû û nameyên şîrketa xênî û dû re nameyên buroya tahsîlkirinê yên di vî warî de bê bersiv mabûn, dawê hewaleyî daîreya îcrayê bûbû. Daîreya îcrayê dest bi prosesa resmî kiribû, lê kalo xwedê bide. Le tev vê jî heta ku cîrana kaloyî ya ku deriyên wan li hevdu dinihêrîn, ji ber acizbûna xwe ya bêhna ku ji daîreya kaloyî dihat, li ba şîrketa xênî gilî nekiribû, tu kes pê nehisiyabû. Saxtkirinan jî tu feyde nedabûn. Şuphe mezin bûbûn. Piştî danûstendinên bi merciyên elaqadar re û wergirtina destûra pêwîst, deriyê kaloyî hatibû vekirin. Termê kaloyî li korîdorê, nêzî maseya ku telefon li ser bû, hatibû dîtin.

Ecêbmayî ma. Ev tişt çawa dikaribû rast ba? Ger wî bi çavên xwe nedîtiba, dê qet bawer nekiriba.

Dû re di ber xwe de got:

– Welleh, min digot kalo vê demê nexuya ye... Gunehko... Çi ji xerîban jî hez dikir.

Rewşa kaloyê ku piştî jiyaneke dirêj di rêya mezêl de bûbû tabûtek, ji nişka ve pirsê pêşeroja wî anî bîrê.

– Gelo em ê bi çi awayî biçin?

Gava li vêya fikirî, tirsek ket dilê wî û wek pelên çilo ricifî. Xwe di newaleke kûr î bê binê de, têwerbûyî his kir. Hisa ku rehên ew bi jiyaneke ve girêdida, li ber birrîne ne, pê re peyda bû. Bi vê re hiseke bêçaretîyê jî li dora wî çû û hat. Ket taswasa ruhê xwe. Mirovî digot qey, mirin li dora wî diçû û dihat.

Hîn çembera hisa mirinê lê teng nebûbû, xwe ji nişka ve jê

derxist. Hilma xwe bi lez stend û berda. Li dora xwe neni-  
hêrî. Çavên xwe hişk girtin. Dû re hema xwe bi lez ji vê fik-  
rê xelas kir û nema wêrîbû careke din lê bifikiriya.

## WEŞANÊN NÛDEMÊ

- ◆ BINGEHÊN GRAMERA KURDMANCI Celadet Ali Bedir-Xan / Gramer
- ◆ DÊ Û DÊMARÎ Egîdê Xudo / Roman
- ◆ KESKESOR Nûredîn Zaza / Çîrok
- ◆ DI FOLKLORA KURDÎ DE SERDESTIYEKE JINAN Rohat / Lêkolîn
- ◆ HÊZ Û BEDEWIYA PÊNÛSÊ Mehmed Uzun / Ceribandin
- ◆ MÎRZA MEHEMED Medenî Ferho / Roman
- ◆ MILKÊ EVÎNÊ Rojen Barnas / Şiir
- ◆ ZAROKA ŞEVÊ Jack London Werger: Mustafa Aydogan / Çîrok
- ◆ BIYANÎ Albert Camus Werger: Fawaz Husên / Roman
- ◆ MÎRZAYÊ BIÇÛK A. de Saint-Eksupéry Werger: Fawaz Husên / Çîrok
- ◆ GOTIN Yaşar Kaya / Ceribandin
- ◆ ANTOLOJIYA ÇÎROKA NÛ YA KURMANCÊN BAŞÛR Xelîl Duhokî
- ◆ ŞEVÊN SPÎ Dostoyevskî Werger: Fîrat Cewerî / Roman
- ◆ MIŞK Û MIROV John Steinbeck Werger: Fîrat Cewerî / Roman
- ◆ BEXÇEYÊ VÎŞNE Çexov Werger Fîrat Cewerî / Piyes
- ◆ LI BENDA GODOT Samuel Becket Werger: Fîrat Cewerî / Piyes


## WEŞANÊN NÛDEMÊ

- ◆ BINGEHÊN GRAMERA KURDMANCI **Celadet Ali Bedir-Xan** / Gramer
- ◆ DÊ Û DÊMARÎ **Egîdê Xudo** / Roman
- ◆ KESKESOR **Nûredîn Zaza** / Çîrok
- ◆ DI FOLKLORA KURDÎ DE SERDESTIYEKE JINAN **Rohat** / Lêkolîn
- ◆ HÊZ Û BEDEWIYA PÊNÛSÊ **Mehmed Uzun** / Ceribandin
- ◆ MÎRZA MEHEMED **Medenî Ferho** / Roman
- ◆ MILKÊ EVÎNÊ **Rojen Barnas** / Şiir
- ◆ ZAROKA ŞEVÊ **Jack London** Werger: **Mustafa Aydogan** / Çîrok
- ◆ BIYANÎ **Albert Camus** Werger: **Fawaz Husên** / Roman
- ◆ MÎRZAYÊ BIÇÛK **A. de Saint-Eksupéry** Werger: **Fawaz Husên** / Çîrok
- ◆ GOTIN **Yaşar Kaya** / Ceribandin
- ◆ ANTOLOJIYA ÇÎROKA NÛ YA KURMANCEÊN BAŞÛR **Xelîl Duhokî**
- ◆ ŞEVÊN SPÎ **Dostoyevskî** Werger: **Firat Cewerî** / Roman
- ◆ MIŞK Û MIROV **John Steinbeck** Werger: **Firat Cewerî** / Roman
- ◆ BEXÇEYÊ VÎŞNE **Çexov** Werger: **Firat Cewerî** / Piyes
- ◆ LI BENDA GODOT **Samuel Becket** Werger: **Firat Cewerî** / Piyes

- ◆ GOTINÊN NAVDARAN Amadekar: **Firat Cewerî** / Aforîsma
- ◆ GIRTÎ **Firat Cewerî** / Çirok
- ◆ KEVOKA SPÎ **Firat Cewerî** / Çirok
- ◆ KULTUR, HUNER Û EDEBIYAT **Firat Cewerî** / Ceribandin, hevpeyvîn
- ◆ XEZAL **Sîma Semend** / Çirok
- ◆ EVÎNA REBEN **Derwêş M. Ferho** / Şiir
- ◆ BANGA HAWARÊ **Medenî Ferho** / Şiir
- ◆ KULTUR Û RAMAN **Şerefxan Cizîrî** / Ceribandin
- ◆ KURÊ ZINARÊ SERBILIND **Sidqî Hîrorî** / Roman
- ◆ ŞÎRÊN BIJARTE **Mayakovskî** Werger: **Süleyman Demir** Şiir
- ◆ PÊLÊN BÊRÎKIRINÊ **Mustafa Aydoğan**







**M**ustafa Aydoğan di sala 1957'an de li Qiziltepeyê hatiye dinyayê. Ew di sala 1980'ê de xwe ji ber cûntayê dide alî û derbasî bînxetê dibe. Piştî mayîna çend salan li rojhilata navîn, di dawiya 85'an de xwe digihîne Swêdê. Ew li Swêdê tevî jiyana kulturî û demokratîk dibe û demekê serokatiya Federasyonê dike. Ji bilî birêvebirina beşa kurmancî ya kovara *Berbangê*, em wî bi werger û nivîsên cûda di kovara *Nûdemê* de dibînin.

Aydoğan di sala 1995'an de jî navê xwe bi wergerandina pirtûka Jack London *Zaroka Şevê* (Weşanên Nûdem) dide bihîstin.

Pêlên Bêrikirinê, mîna pirtûk berhema Aydoğan ya pêşî ye.

Weşanxaneya me bawer e hûn ê vê berhema ku bi saya rojek ji rojên rûniştvanekî bajarê Stockholmê, jiyana surgûnê tevî êş û elemên wê; kêf û xweşiyên wê bi hesreke berlênayê-girtin ve û bi zîmanekî bi îhtîmam û bi şîyaneke edebî ya konsantrekirî radixe ber çavan, bi kêf bixwînin.

**Weşanên NÛDEM**

